



BARZAN TAHER AHMED

BEŞA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

EYLÛL - 2019



K.T.  
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ



TEZA  
LÎSANS  
BİLİND

DI HELBESTÊN KANÎ DE MUZÎK

BARZAN TAHER AHMED

BEŞA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

EYLÛL - 2019



**K.T.**  
**ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ**  
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**  
**MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**



**DI HELBESTÊN KANÎ DE MUZÎK**

**LÎSANS A BİLİND**

**AMADEKAR**

**BARZAN TAHER AHMED**

**ŞÊWIRMEND**

**Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ**

**VAN – 2019**

**T.C.**  
**VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**KANI'NİN ŞİİRLERİNDE MÜZİK**  
**YÜKSEK LİSANS**

**HAZIRLAYAN**  
**BARZAN TAHER AHMED**

**DANIŞMAN**  
**Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ**

**VAN – 2019**



T.C.  
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Barzan Taher Ahmed AHMED tarafından hazırlanan “**Di Helbestên Kanî De Muzik**” adlı bu çalışma, 02/09/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

**Başkan(Danışman)** : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İmza: .....

**ÜYE** : Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR

İmza: .....

**ÜYE** : Dr. Öğr.Üyesi Ahmet BARDAK

İmza: .....

**ÜYE** : .....

İmza: .....

**ÜYE** : .....

İmza: .....

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

02.09/2019  
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ  
Enstitü Müdür Vekili  
450 450

## NAVEROK

KURTE .....	III
ÖZET.....	IV
ABSTRACT .....	V
KURTEBÊJE .....	VI
PÊŞGOTIN .....	VI
DESTPÊK .....	1
1. MÛZÎKAHELBESTÊ .....	24
1.1. Muzîk, Têgeh û Pênase .....	25
1.2. Helbest, Têgeh û Pênase.....	27
1.3. Pêwendiya Di Navbera Muzîk û Helbestê Da .....	29
1.4. Muzîka Helbestê Di Edebiyata Kurdî Da.....	34
1.5. Muzîka Helbestê Di Boçûnên Cuda Da .....	42
1.6. Muzîka Helbestê Di Rêbazên Edebî Da.....	46
1.6.1. Muzîka Helbestê Di Rêbaza Kilaşîzmê Da .....	47
1.6.2. Muzîka Helbestê Di Rêbaza Romansîzmê Da .....	51
1.6.3. Muzîka Helbestê Di Rêbaza Riyalîzmê Da .....	54
1.6.4. Muzîka Helbestê Di Rêbaza Sîmbolîzmê Da .....	56
2. MÛZÎKA HELBESTÊ, PIRAKTÎZEKÎRDÎN DI HELBESTÊN KANÎ DA	59
2.1. Mûzîka Derve.....	59
2.1.1. Kêş .....	60
2.1.1.1. Bingehên “Kêş”ê.....	61
2.1.1.2. Cureyên “Kêş”ê Di Zimanên Cîhanê Da .....	62
2.1.1.3. Cureyên Kêşê Di Edebiyata Kurdî Da .....	63
2.1.2. Serwa.....	83
2.1.2.1. Astên Sînorê Serwa .....	85
2.1.2.2. Cureyên Serwa .....	88
2.2. Muzîka Navxwe .....	95
2.2.1. Dubarekirin .....	97
2.2.1.1. Dubarekirina Dengê.....	98
2.2.1.3. Dubarekirina Hevokê.....	103
2.2.2. Muzîka “Bêyt”ên Helbestê .....	103
2.2.3. Mûzîka Regezdozî .....	104
2.2.3.1. Regezdoziya Tewaw .....	104
2.2.3.2. Regezdoziya Netewaw .....	105
2.2.4. Dijhevî.....	105
2.2.4.1. Dijheviya Ferhengî.....	105

2. 2. 4. 2. Dijheviyeke Naferhengî .....	106
2. 2. 5. Mûzika Beramberî .....	106
2. 2. 6. Dupatkirin .....	107
2. 2. 7. Tîlnîşan .....	107
2. 2. 8. Parkît (kertkirdin) .....	108
ENCAM .....	109
ÇAVKANÎ .....	111



(Lîsansa Bilind)

**Barzan Taher Ahmed**

**ZANÎNGEHA WAN YÛZÛNCÛ YILÊ**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

**2019**

**DI HELBESTÊN KANÎ DE MUZÎK**

**KURTE**

Muzîka helbestê di edebiyata cîhanî de herweha di edebiyata Kurdî de jî cihê baldanê ya edîban û helbestvanan bûye û bi ser du cure muzîkan de parve dibin: ew jî yek ji wan pêk tê ji, muzîka derve ku kêş û serwayê bi xwe ve digre, û ya duyem jî pêk tê ji muzîka navxwe ku hejmarek ji hunera muzîka cuda bi xwe ve digre, Kanî Doxremeçî yek bû ji wan helbestvanên xwedîşiyar li bajarê hewlêrê û helbestên wî teji ne ji peyvên ciwan û muzîkawatedar û balkêş. Lê em dibînin ku kêmtirîn bas li ser hatiye kirin, hemû ew basên ku li serê jî hatine kirin neketine nava lêkolîneke akademîk.

Kanî destpêka helbestên wî bi zimanekî sade û şêweya Hewlêrî bûye, lê piştî rêbaza edebî a xwe berfireh kiriye. Zêdetir girîngî daye ziman û muzîkahelbestên xwe. Berhemên helbestê ên Kanî wekî helbestvanên mezin û navdar ên wê demê ne. Wî jî di vê qadê de helbestên Kîlasîkî û xomalî nivîsandine, Kanî piraniya helbestên xwe li ser kêşa erûz a Ereba kirine. Lê di hindek Xezelan de, kêşa penceyî a xomalî jî bi kar anîye. Bêguman wê demê ew cure kêş di edebiyata Kurdî de wekî nûxwazî hatine hesibandin. Di biyavê serwayê de jî, helbestvan yekbûna serwa û cotserwa jî bi kar anîye. Bi giştî helbestvan komeke Xezel û hindek Çarîn û helbestên tak tak û bikaranîna pêncxişteki.. Herwsa di naweroka berhemên wî de, daşorîn, medh, tesewof, ayînî, helbestên dildarî, û nîştimanî hebûne.

**Peyvên Sereke:** Kanî, Muzîk, Helbest, Kêş, Serwa.

**Hejmara Rûpelan:** 115

**Şêwirmend:** Doç. Dr. Nesim Sönmez

(Yüksek Lisans)

**Barzan Taher Ahmed**

**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
2019  
KANI'NİN ŞİİRLERİNDEMÜZİK**

**ÖZET**

Şiir müziği, Dünya Edebiyatı'nda ve Kürt Edebiyatı'nda şairlerin ve aydınların odak noktası olmuştur. Şiir müziği iki kategoriye ayrılır; Dış müzik ve iç müzik. Dış müzik aruz ve kafiye içerir, iç müzik de çeşitli müzikal enstürümanlar içerir. Kani, Erbil şehrinin olağanüstü bir şairiydi. Şiirleri güzel sözler ve çekici müzik ritmiyle doludur ancak ne yazık ki bu şiirleri üzerinde çok az akademik çalışmalar yapılmıştır.

Kani başlangıçta eserlerinde basit bir dil kullanmıştır. Bununla birlikte daha sonra şiir dilini geliştirip genişlettirdi ve temel olarak şiirin müziğine odaklandı. Şairin şiirleri zamanın diğer ünlü şairlerinin şiirleri kadar başarılıdır. Klasik edebiyat ve hece ölçüsü tarzında şiirler yazdı. Kani şiirlerinin çoğunu Arap edebiyatının aruz vezniyle yazmıştır. Ancak bazı şiirlerinde beşli (muhammes) hece ölçüsünü de kullanmıştır. Şüphesiz o devirde hece ölçüsü Kürt Edebiyatı için yenilikçi bir hareketti. Kafiye konusunda da şair, tekli ve çiftli kafiyeyi de kullanmıştır. Şairimiz birkaç gazel, birkaç rubai, tek beyitli ve 5li hece ölçüsünü (muhammes) de kullanmıştır. Yine aynı şekilde şair şiirlerinde; hiciv, medhiye, tasavvuf, din, aşk ve vatan konusunu da sıkça işlediği konular arasında yer almıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Kani, Müzik, Şiir, Ağırlık, Kafiye.

**Sayfa Sayısı:** 115.

**Tez Danışmanı:** Doç. Dr. Nesim Sönmez



(M.Sc. Thesis)

**Barzan Taher Ahmed**

**YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY  
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES  
2019**

**MUSIK IN KANI POETRY**

**ABSTRACT**

The Music of Poetry, in the World literature and Kurdish literature, has been the focal point of poets and intellectuals. Music of poetry is divided into two categories: External music and internal music. External music includes meter and rhyme and internal music includes a number of different musical devices. Kani was an outstanding poet of Hawler city. His poems are filled with lovely words and attractive musical rhythm; however, the least academic research has been conducted on his works. At the beginning, Kani utilized a simple language in his works. Nonetheless, later on, he developed and broadened his poetic language and mainly focused on the music of his poetry. His collections of poetry are as important as the works of other eminent poets of his time; he wrote classical and local poems. Kani wrote most of his poetry utilizing Arabic Arooz rhyme scheme, However, in some of his lyrics, he also employed iambic rhyme scheme, which at that time was considered as an innovation. In terms of rhyme, he employed rhyme unity and double-rhyme unity. Overall, the poet employed some lyrics, quatrains, monostich and quintuples. Moreover, he wrote satire, sarcasm, praise, Sufism, love as well as patriotic poems.

**KeyWords:** Kani, Music, Poetry, Meter, Rhyme.

**Quantity of Page:** 115

**Supervisor:** Doç. Dr. Nesim Sönmez

## **KURTEBÊJE**

Her weki din: hwd.

Çap : ç.

Jimare : j.

Wergêr : wer.

Giştî : g.

Rêja sedî : r. s.

Rupel : r.

Birge : b.

## **PÊŞGOTIN**

Bi qasî ku tê dîtin di nav Kurdan de ji aliyê hunerê ve herî zêde hunera edebiyatê û di nav wê de jî herî zêde hunera helbestê pêş ketiye. Berhemên tarîxa

edebiyata Kurdî bi helbestvanan dagirtî ne. Bêguman di nav van helbestvanên Kurd de, di qada Kurdiya Soranî de, yê ku her zêde nehatîye naskirin helbestvan Kanî ye. Ji ber girîngiya Kanî ya di tarîxa edebiyata Kurdî de, Me xwest ku em li ser mîrateya Kanî bisekinin. Navê xebata me "Di Helbestên Kanî De Muzîk".

Muzîka helbestê xwe di qalibê helbestê de dibîne ku ji kêrhatiya dilê helbestvan ve çavkanî digre û hildikele, di helbestê de xwe nîşan dide, û her hundirê vî helbestvanî ye ku ast û radeya muzîka helbestê di biyavê bihêzbûn û bêhêzbûnê de nîşan dide. Muzîk û helbest her du pêkve aliyê ciwanî û nazikiya hest û hundirê mirov nîşan didin, û her dîsan pêkve dibin sedem ji bo bexşîna xûreka ruhî ji bo mirovan, em di vê xebatê de di çarçoveya muzîk a helbestên Kanî de li ser şewaza wî ya aheng û muzîkê analîze bikin. Muzîk û helbest bi tevahî dîrokê ve girêdayî ye, û ew eşkere ye ku hûn tu stranek stranên bixwînin, ew di forma helbestê de têne nivîsandin, helbestên Kanî jî teji aheng û muzîkin.

Xebata me ji pêşgotin, destpêk, du beş û encamê pêk tê. Di destpêkê de behsa jîyan û berhemên Kanî, Naznavê Doxremeçî, hatiye kirin, herwsa me behsa Karîgeriya helbestvanan li ser Kanî, Kanî li cem helbestvanên kurd û bizava helbestê li serdemê Kanî de kir ye. Di beşa duyem de ji aliyên tîyurî behsa muzîka helbestê hatiye kirin, me behsa têgeh û pênase a muzîk û helbestê û Pêwendiya di navbera muzîk û helbestê da kiriye. Herwsa muzîka helbestê di edebiyata kurdî de, Muzîka helbestê di boçûnê cuda de, û muzîka helbestê di rêbazên edebî demijara vê beşê de. Di beşa Sêyem de me behsa mûzîka helbestê, piraktîzekirîndihelbestênkanî de. muzîka helbestê bi pîranî li ser du beşan hatine dabeşkirin: muzîki ya derekî û muzîki ya navekî. Muzîka derekî beramberî kêş, serwa û paşserwayê, Muzîka navekî jî beramberî hunerêndin wek: Dubarekirin, Regezdozî, Dijhevî, Beramberî, Parkît (kertkirdin), u Tîlnîşan hatine bikaranîn.

Di vêxebatê de ku ez li ser muzîka helbestê Kanî nivîsandiye, Ez bawer im ev xebat tevî kêmasiyên xwe ji bo wêjeya Kurdî bibe gavekî piçûk. Bêguman di nav van helbestvanên Kurd, di qada Kurdiya Soranî de, yê ku her zêde nehatîye naskirin helbestvan Kanî ye. Ji ber girîngiya Kanî ya di tarîxa edebiyata Kurdî de, em di vê xebatê de di çarçoveya bersivên van pîrsan de li ser şewaza wî ya aheng û muzîkê xebat kirin., Hêviya me eve ku helbest û helbestvan ên Kurdî ji vir şûn de bi hişmendiyek rûmetdar bîn behskirin.

Di dawî yê dixwazim spasiyên xwe ji bo şêwirmendê xwe ya tezê serokê Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî Doç. Dr. Nesim Sönmez re bikim ku di amadekirina tezê de piştgirî da min. Ji bo ku tez xwendin û kêmasiyên wê jimin re vegotin, gelekî minetdar û spasdar im ji hemî heval ên xwe spasdar im, di serî de Prof. Dr. Senger, Kek Selîm Zencîrî û Kek Faruq rêvebirê Pertukxana Şeqlawê û hevjîna min Kurdistanxan.

Barzan Taher Ahmed

2019



## DESTPÊK

### Jiyana Kanî

Kanî yek ji helbestvanên bajarê Hewlêrê ye, naznavê şê`irî ê helbestvanê kilasîk ê Kurd e, û navê wî yê tewaw Ebdulcebaraxayê kurê Hacî Mela Ebdulrehmanê kurê Hacî Tehayê kurê Hacî Ebdullahê kurê Ebdulqadiraxayê kurê Mihemedaxayê kurê Qereniyê Doxremeçî ye.

Derheq sala jidayîkbûna Kanî çendîn boçûnên cur bi cur hene ku me jî koma wan boçûnan xwendiyê û şiroveyên hûr jê re kirine, bo mînak hindêk ji çavkaniyên çapkirî hene ku pêştir derheq sala jidayîkbûna Kanî hatine nivîsandin, ev hemû îşare ne bo sala jidayîkbûna Kaniyê helbestvan, ew jî wek: *KovaraHetaw* di hejmara 97 a r.21, ku di 20-ê meha Gulana sala 1975-an hatiye belavkirin, di pêşgotina wê de (Leyla û Mecnûn) ku Kanî ew yek wergerandiye ser zimanê şîrîn ê Kurdî, û di sala 1969-an de, li Hewlêrê hatiye çapkirin. Herwsa *Dîrokaedebiyata* Kurdî ku ji aliyê `Elaedînê Secadî ve hatiye nivîsandin, gellek bi berfirehî bas ji dîroka edebiyata Kurdî û helbestvanên Kurd kiriye. Di çapa duyem rûpela 602 de bas ji Kaniyê helbestvan jî kiriye. Ew hemû wisa nîşan didin ku Kanî di sala 1902-an de ji dayîk bibe, lê ev sal li çav sala jidayîkbûn û temenê Kaniyê yek nagre. Xeynî vê yekê jî çend belgeyên din hene ku îşareyê bi vê yekê dikin ku Kanî di sala 1897-an de, ji dayîk bûye. Ev rastiya jî di dîwana wî ya destnivîs de zêdetir xistine rû. Herweha nivîskarek bi navê (B-Kawe) li rojnameya *El-te`ixî* li hejmara 1907-an de di rêkevt 12.05.1957-an de gotarek pêşkêş kiriye li jêr navê Bîranînek ji helbestvanê *Kurd Kanî*, helbestvanê hezkirin ûnîştimanî. Di vê gotarê de nivîskar ew rastiya ducarî kiriye ku dibêje (Di wê demê de Kanî ji dayîk dibe, û Ebdulrezaqaxayê Uzêrî helbestvan û serokê şaredariya wê demê ya Hewlêrê bûye, ku dostekî gellek nêzîk ê bavê Kaniyê bûye, lewra wan dispêre ku navê wî danên Ebdulcebaraxa), (B. Kawe, 1975). Ew serdem bi şiroveya dîrokî dibe sala 1315-an a hîcrî, ku hevdem e digel sala jidayîkbûna Kanî, dema ku vê sala hîcrî dikin sala Mîladî, wê demê dike sala 1897-an a Mîladî.

Herwsa Goran Soran Feyzî di pirtûka *Bizavê edebiyata Kurdî li bajarê Hewlêrê* dema ku bas ji Kaniyê helbestvan dike, ew jî her îşare bi vê dike ku Kanî di sala 1897-an de ji dayîk bûye” (Goran Soran, 2006: 155). Li gora piraniya

çavkaniyan sala jidayîkbûna wî, heman ew sal e. Gellek caran hatiye gotin û bi taybetî ewên ku berî mirina Kanî ew dîtine, dibêjin ku temenê wî gihîştibû 60 salî.

Ku wisa bû ew boçûna gellek rast e ku dibêje, Kanî di sala (1897-1957)an de jiyayî kiriyê. Ew heyama jî bo temenê Kanî rast dike 60 sal temen. Malbata Kanî heman têgihîştin bo sala jidayîkbûn û mirina wî hene, wate ew jî heman wê heyamê (1897 heya sala 1957) bo temenê Kanî piştrast dikin.

Bavê Kanî, Hacî melaEbdulrehmanmelayekî navdar û zanayekî mezin ê vê serdemê bûye, û di hemû mijarên ayînî de şarezaiyekî baş hebûye, herwsa di nava bajarê Hewlêrê de jî paye û rêzeke taybetî hebûye û xwedî asteke bilind ya rewşenbîrî bûye, bavê Kanî di serdema Osmaniyan de bi sedema vê ku xwediye kesayetiyekî diyar û xûya bûye, rêz jê hatiye girtin, û ji aliyê deshîlata Osmaniyan deshîlat pê hatiye dan, û kirine (Mustentîq) li bajarê Hewlêr, û herwsa dayîka Kanî navê wî (Fatimexan) bûye, ew jî ji malbateke navdar a şêxên Neqşbendî bûye.

Di sala 1903-an de Kanî wê demê temen şeş salî bûye, ku bavê wî diçe ber dilovaniya Xwedê û dimire, lewra her ji temenê zarokatiyê ve nekariye here ber xwendinê, lê piştî vê kutemenê wî dibe deh salî, bi hewla birayê xwe ê mezin ku navê wî Hacî Mela Tofîq bûye herweha mamê wî ku navê wî Mela Îbrahîm Doxremeçî bûye, diçe xwendingeha mizgefta kelha wê demê a Hewlêrê, her zû jî xwe fêrî xwendin û nivîsandinê dike, wê demê ew yek bû ji xwendekarên jîr ên wê xwendingehê, xeynî vê yekê qazanceke baş ji mamostayan dîtiye û bixwe jî hewleke zaf daye bona vê ku zûtir di xwendin û fêrbûnê de pêş bikeve.

Kanî di dema xwendina dersên xwe di mizgefta kelhê de, xeynî vê yekê ku di biyavê ayînî de dixwend, hewl daye ku çend pirtûkên taybet bi mijarên edebî û zanistî jî bixwîne. Herweha hindêk pirtûkên wekî zanista felek û fiqhê jî xwendiyê û şarezaiyê baş jî tê de bi dest xistiye (Kerîm Şareza, 1980: 10). Piştî vê ku Kanî têgihîştina wî bo piraniya herî zêde ya mijaran zêdetir dibe, û hewl dide ku xwe fêrî xwendina bi zimanên Farsî, Erebi û Tirkî bike, di vê derheqê de jî heya asteke baş serkevtin bi dest xistiye.

Di sala 1914-an de piştî vê ku Kanî xwendewariya wî zêde dibe, û hewl dide ku dest bi nivîsandinê jî bike, wê demê ew bixwe radibe û dest dike bi danîna

naznavê ji xwe re, û naznavê "Kanî" wekî navbang li ser xwe dadinê, hîlbijartina vî navî jî, zêdetir vedigere ser ciwaniya xwezaya Kurdistanê, digel vê yekê jî wek destpêkekêdest kiriye bi nivîsandina kople helbestekê, û helbestên biçûk, destpêkê bi zimanê sade ê xelkê, û zimanê wê demê ê rûniştîyên kelha Hewlêrê dest pê kiriye, û piştî berew asteke bilindtir çûye.

Kanî piştî vê ku babê wî miriye, destpêka perwerdehî û pêgihîştinê li cem birayê xwe hacî Tofîq bûye, lê digel vê yekê jî malbata wan li ser hev malbateke edebdost û zanistperwer bûne, her vê yekê jî Kanî han daye ku ewjî li ser heman perwerdehiya malbata wan rû li cîhana huner û edebiyatê bike, ew jî wek yek ji sedemên sereke tê danîn, bo vegeşandin û berdeambûna Kanî bo gihîştina bi asteke zanistî ya hunerî a bilind, serbarê vê yekê jî ku Xwedayê mezin ew behre di derûna wê de çê kiriye, û wî jî ew yek vegeşandiye, û di encamê de kariye ku xwe wek helbestvanekî xûya û naskirî ê herêma nîşan bide. Hekî ne, Kanî ti xwendengeheke zanistî û fikrî tewaw nekiriye, xeynî vê ku serdema destpêka xwendina xwe ji mizgeftê ve dest pê kiriye, lê berdeyam nebibû da ku bibe mamosta (mela)yê ayînî. Ya ku Kanî gehandiye vê asta bilind, ew bixwe bûye. Wate ew bixwe ji riya xwendina taybet û xwe hînkirinê ve, gihîştîye asteke bilind.

Kanî di sala 1928-an de bo yekem car fermana mîrî pê tê spartin, destpêkê li bajarê Hewlêrê û piştî jî li bajarên wekî (Şeqlawe, Giwêr, Qoştepe, Rewandiz...) heyameke zaf fermanber bûye, û jiyan û derbazkirina xelkê hemû wan bajar û bajarokan bi tewahî dîtiye, û dîsan xwezaya ciwaniya van bajarokan ku cihê xweş û dilrevîn bi taybetî bajarê Şeqlawe û Rewandizê bandora xwe li ser ciwanî û nazikiya helbestên Kanî hebûye.

Di sala 1929-an de Kanî dibe (me`imûnê) nifûsa Koyê, ew yek jî bi sedema şarezaiya baş ya wî bûye, jiberku pêştir li bajarê Rewandizê karmendiya serjimartin (nifûsê) kiribû. Piştî vedigere bajarê Hewlêrê û dibe sernivîskarê îdareya (Temwîn), herweha di sala 1953-an de, dikin nivîskar li Zatiyeya Birêveberiya Zanyarî a Hewlêrê. (Kerîm Şareza, 1980: 12).

Kanî bi sedema vê ku li piraniya gund û bajarên Kurdistanê geriyaye, helbestên wî tameke din hene. Hemû ew xwezaya ciwan û dilrevîn a Kurdistanê di helbestên wî de reng vedane. Herwsa têkelawiya Kanî digel xelkê bi taybetî hevaltî û

rabûn û rûniştina digel helbestvanên mezin wek (Safî, Refîq Hîlmî, Husên Huznî Mukiryânî, Cahîd û Dildar...hwd) çendîn helbestvan û zana û edîbên navdar ên wê demê, ku vê yekê jî weha kiriye ku bibe sedemek bona vê ku asta rewşenbîrî a helbestvan berfirehtir be, û ezmûna helbestên Kanî cihê girîngiya zêdetir bin, jiber ku wî hertim qazanc ji gotûbêja hevalên xwe wergiritye, û guherîna boçûnan pêkve kirine, Kanî xeynî zimanê Kurdî, zimanê Erebî, Turkî û Frasî jî zaniye, di helbestên xwe de çendîn peyv û zaravayên her yek ji wan zimanan berçav dikevin.

Kanî di heyama temenê xwe de çar jin anîne, sê kur û şeş keçên wî hebûne, kurên wî bi navên (Edhem, Ekrem, û Faroq) bûn, her sê ji kurên wê , wekî bavê xwe ji helbestê hez dikirin, xeynî helbestên bavê xwe, sedan helbestên helbestvanên Kurdistanê ber xwe de digotin. Dîwana wî a çapkirî jî her ji aliyê mofeq ê kurê Ekrem ku dibe newiyê Kanî, hatibûkomkirin, û ji aliyê Kerîm Şareza ve pêşgotin û şirove jê re hatiye kirin, û piştê di sala 1980-î de hatiye çapkirin. Herwsa keçên wî jî, rast wekî kurên wî, ew jî helbestdost bûn, û helbestên piraniya helbestvanan jî li ber xwe de digotin. Bi taybetî hemû zarokên wî, helbesta (Leyla û Mecnûn) a Fizûlî ê helbestvan ê Tirk li ber xwe de digotin, ku ji aliyê bavê wan ve hatibû wergerandin bo ser zimanê Kurdî.

Behîce yek bû ji keçên wî, di xwendîgehê de gellek jîr bû. Hemû helbestên bavê xwe û herweha xeynî (Leya û Mecnûn), hejmareke zêde ji helbestên helbestvanên Kurdî li ber xwe de digotin, bi xwe jî gellek caran helbest nivîsandine, û yek bû ji helbestvanên jin ên wê demê, û Behîce di cîhana helbest û edebê de, naznavê wî (Kewkebe) bû, lê zirûfa wê demê ya civakî a bajarê Hewlêrê ji bo jinekê bizehmet bû, ku wek helbestvanekî bê nava qada edebiyatê de.

Piştî mirina Kanî xeynî helbestên wî, hezkirina wî di nava malbata wan û edebdostan de her maye, Kanî bûye cihê şanaziya tewahiya malbata xwe, her ew yek jî bûye sedem ku navê wî danên ser çar newiyên wî. Yek ji wan bi navê Ebdulcebar û sê newiyên din jî bi navê Kanî. Ev hemû jî bi sedema vê ye ku malbata wî şanaziyê bi wî dike, û ji vî helbestvanî hez dikin.

Jiber ku Kanî di mizgeftan de nemaye û gellek zû mizgeft bi cih hêlaye, û negihaye asta mamostayekî ayînî, lewra wek helbestvanên mela, helbestên xwe di nav hucre û mizgeftan de negotiye, dersxwanên xwe, ew helbestên ku mane jî, bi



sedema vê yekê ne ku zarokên wî, hemû helbest di ber xwe de digotin û piştî jî di dîwanekê de hatine çapkirin.

Ew helbestvan berî vê ku temenê wî bibe 60 sal, rastî nexweşiya tengenefesiyê tê, û heyamekê di destên vê nesaxiyê de dinalîne, serbarê nexweşiyên xwe, desta ji helbestê jî hilnegirtiye, û berdewam bûye di vehûnandina helbestê, piştî jî tûşî nexweşiya dil dibe, û di nav koma xizm û kesên xwe de, di dema xwendina sûreya (Yasîn) rih dide, û bo cara dawî koç dike, û diçe ber dilovaniya Xwedê. Dibêjin ku dema ew nexweş dikeve, bixwe dizane ku êdî temenê wî berew dawiyê ve diçe, lewra di helbestekê de dibêje:

*Roj le wextêkî xirap awa bû*

*Gozey mindalîm hêştî sawa bû (Kanî:59)*

Piştî mirina wî, di merasimeke mezin de, termê wî ber bi goristana mezin ya bajarê Hewlêrê dibin, û li wir merasimeke mezin jê re saz dikin, di vê merasimê de nûnerê melikê Îraqê û hejmarek ji kesayetiyên mezin ên navçeyê di merasima sersaxiya wî de beşdariyê dikin, û herwsa hejmareke zaf ji helbestvan, zana, edîb û edebdostên bajarê Hewlêrê beşdarî di naştina termê wî de kirin.

Dengvedana nûçeya koça dawiyê a Kanî di nava helbestvan û rojname û kovarên wê demê de, dengvedaneke mezin bû, hejmarek ji helbestvanên hevalê wî, piştî mirina wî, helbest ser wî gotin. Di çend rojname û kovarên wê demê de nûçeya mirina wî hate belavkirin. Di roja 12.05.1971-an de, di hola kitêbxaneyê giştî a Hewlêrê Yekîtiya Nivîskarên Kurd civînek bo helbestvanê navdar Kanî saz kirin. Di civînê de, xeynî malbata Kanî hejmareke zêde ji hezkiriyên Kanî û helbestvan tê de beşdar bûn, Her di sala 1971-an de li radyo û televîzyona Neynewa (Musil) de civîneke ji aliyê (Medhet Bêxew, Kerîm Şareza) ve li ser Kaniyê helbestvan pêşkêş bi bînerên TV yê hatiye kirin.

Bi awayekî giştî piştî vê ku Kanî diçe ber dilovaniya Xwedê, û êdî ji cîhana edebiyatê vediqete, nîgeranî rû li dost û hevalên helbestê dike, eva bû ku piraniya ew helbestvanên ku li serdema Kanî û piştî Kanî di jiyana de bûn, bi mirina Kanî nîgeran bûn, herwsa hejmarek ji wan jî, perîşanbûn û hezkirina li helbestên Kanî, ji riya

helbestê ve nîşan dane. Ew jî wek (Reşad Mofî, Medhet Bêxew, Borhan Cahîd û Hebîb Elî...hwd).

### **Berhemên Kanî**

Derhrq bi berhemên wî herwekî ku pêştir me îşare pê kir, Kanî destpêka helbestên wî bi zimanekî sade û şeweya Hewlêrî bûye, lê piştî rêbaza edebî a xwe berfireh kiriye. Zêdetir girîngî daye ziman û muzîka helbestên xwe. Ziman bi şewekî giştî yek ji kersite ên serekî edebe, lê zimanê dahênanê û afrandna tureyî gelek ji zimanê asayî cudatre. Bêguman zimanê helbestên klasîkî ji yê nu cudaye, çunkî zimanê helbesta nu rojane beref nuyatyê û derkevtina yasayên rêzmanên nu diçît, çunkî mrov neşet bi renekê tewaw bnêrite dur hêlê û jîngeha xwe, bitnê ku hindêk peyvên nu bi afrînit. Zimanê helbestê (ew zimane, ku ramana wî ji raman û wataya zimanê asayî zêdetre. Ev pênamejî bi renekê aşkera berî û bjarîya zimanê hozanê xwe ya diket, ku ew zimane, raman û watayeka mezintir û beriztir ji zimanê asayî yê xelkî li nav xwe dgêrit) (Newzad Ebdula, 2007: 135), Ji ber hendê Kanî zêdetir girîngî daye zimana helbestê, rêbaza edebî a xwe berfireh kiriye.

Berhemên helbestê ên Kanî wekî helbestvanên mezin û navdar ên wê demê ne. Wî jî di vê qadê de helbestên Kilasîkî û xomalî nivîsandine, Kanî piraniya helbestên xwe li ser kêşa erûz a Ereb ava kirine. Lê di hindêk "xezel"an de, "kêş" a penceyî a xomalî jî bi kar aniye. Bêguman wê demê ew cure kêş di edebiyata Kurdî de wekî nûxwazî hatine hesibandin. Di biyavê "serwa"yê de jî, helbestvan yekbûna "serwa" û "cotserwa" jî bi kar aniye. Bi giştî helbestvan komeke "xezel" û hindêk "çarîn" û helbestên tak tak digel bikaranîna "pêncxişteki" li ser helbestên helbestvanê Îranî (Mesîha) daniye. Herwsa di naweroka berhemên wî de tenê, daşorîn, medh, tesewof, ayînî, helbestên dildarî, û nîştimanî hebûne, û yek bûye ji helbestvanên nefesbilind û gellek şanzî jî bi xwe ve kiriye.

Dîwana Kanî yek ji komkiriya hindêk ji helbestên helbestvan e, ku ji aliyê (Mowefeq Ekrem Kanî) ve hatiye komkirin. Piştî ji aliyê Kerîm Şareza di sala 1980-î de wekî (Dîwana Kanî) li bajarê Bexdayê hatiye çapkirin. Di vê dîwana Kanî de xeynî vê ku bas ji jiyan û serpêhatiya wî hatiye kirin, hejmarek ji helbestên wî ku têkel in bi awaz û muzîkekciwan di nava dîwanê de, tene dîtin. Helbestên Kanî xeynî vê ku bi zimanê Kurdî ne, çendîn peyv û zaravayên zimanên cuda tene tene

bikaranîn, û ew jî wekî zimanên Erebî, Tirkî û Frasî. Ew têkeliya zimanî ku di helbestên helbestvanên Kurd û bi taybetî Kanî de jî tê xuyakirin, û bi sedema bandora hemû alî a derdorê serî hildaye, wate welat û neteweyên derdorê bandoreke zaf li ser helbestvanên Kurd hebûye, Gellek caran ew bandor bi sedema ayîni bûye, yan jî bi sedema cîrantî û gellek bi sedema vê bûye ku wan zûtir di warê edebiyat û rewşenbîriya serdem de xwe digel cîhanê rêk xistine û helbestvanên me hewl dane, wekî wan bin.

Berhemeke din a helbestvan (Leyla û Mecnûn) bûye, û pêştir me behsa vê kir, ku kanî şarezaiyeke baş di zimanên Tirkî, Farsî û Erebî de heye. Bi taybetî zimanê Tirkî, her bi vê sedema zimanzanî bû ku (Leyla û Mecnûn) a Fizûlî helbestvanê Tirk ji zimanê Tirkî ve bi destkariyeke ciwan wergerîne ser zimanê Kurdî, ew yek jî ji ber şarezaiyeke baş ya Kanî li ser zimanên Tirkî, çunkî (ew kesê ku helbestek wergerîne ser zimanek dî dibe ku şarezaiyeke baş di herdu zimanan de hebe, herwsa dibe herdu zimanan baş bizane) (Ferhad Şakilî, 2011: 31), Kanî jîşarezaiyeke baş li ser zimanên Tirkî hebe, piştî mirina Kanî ew yek jî sê caranji aliyê (Gîwî Mukiryani) ve hatiye çapkirin.

Hemû berhemên Kanî di dîwana Kanî de nehatine komkiriin, wate xeynî van helbestên ku di dîwanê de hene, helbestên din jî hebûn, lê bi sedema çapnekirin û komnekirina wan winda û bê serûber bûne, jiber ku piştî vê ku di sala 1980-î de dîwana Kanî hate çapkirin, tenê ew helbestên wê demê li ber dest bûn, ketin nav dîwana wî de, lê piştî vê û heya îrorojê jî, çend helbestên helbestvan hatine dîtin û ji aliyê malbatên wan ve hatine parastin, lê derfet tunebûye, ku di nava dîwana wî de cih ji wan re bê vekirin, ew yek jî bi sedema vê ye ku piştî sala 1980-î ku ew dîwan hate çapkirin, heya ku digihîje niha nehatiye nûkirin, herwsa tu lêkolîneke zanistî a xûya û taybet bo helbestên wê nehatiye kirin.

Çend salekê berî niha Wezaretê Rewşenbîrî a Herêma Kurdistanê Îraqê dest kiriye bi komkirina helbestên hindê ji helbestvanan, û lêjneyek jî bo vê mijarê berhev kiriye, bona lêkolîneke hûr li ser van helbestvanan, yek ji wan helbestvanên ku navê wî di listeyê de hebû, helbestvanê bajarê Hewlêrê Kanî bû, lê lêjneyê karên xwe tewaw nekiriye, û vê mijarê jî çend salek e di Wezaretê Rewşenbîrî de her wekî xwe maye.

Bi awayekî giştî Kanî di berhemên xwe de rû li tewahiya mijarên helbestê kiriye, û hewl daye ku ji koma mijaran de helbest hebe, û ji her mijarê çend vehûnandin (hunraweyek) pêşkêş kirine, ji babetên ayînî ve bigre heya stayîş û mehtkirin, dildarî û meynûşî, hezkirina afret, hezkirina nîştiman û neteweyî, şanazî bi xwe kirin, evane û dehan mijarên din ên civakî, ji aliyê Kanî ê helbestvan ve kar li ser hatiye kirin, lê di tu yek ji wan cure mijaran de ew hinda ku mijarên mey û dildarî serkevtî nebûye, di qada helbesta mey û dildariyê de Kanî gihaye lûtkeyê, û kariye di vê rêwê de, mîna keke gellek ciwan pêşkêş bike (Kerîm Şareza, 1980: 20).

Hebûna karîgerîya olî (ayînî) bşewekê giştî û helbest bi şewekê taybetî liser edebyatî ve dizivîrî û li wî demî ku ev karîgerîye mezn dibît edeb dê murk û berjengên ayînî bixove grit, Sebaret bivê babetê profîsor Dr. Îbrahîm Ehmed Şwanî li pertuka *Sofîgerî Şî'ri Aynî û Sofîgerî le Şî're Kurdyekani Mehwi da* wesa nîşan daye

ku taybetmendiyên wî ji di bi karînanana navê xudê û peyvên qur'an û ktêb û furqan û navên hindê suretên quranê, herwesa bikarînanana peyvên (resul, nezîr, beşîr ...) eve , û jiblî wan peyvên ku taybetin bi ferhenga îslamî ve bu nmune (mu`mîn, huda, hîdayet, zelal, kufir, şîrk, cîhad, şehîd ...) (Îbrahîm Ehmed Şwanî, 2001: 195).

Kanî di brhemên xwe de rû li gelek vam mijaran kiriye, Ew wekmrovekê musulman û helbestvanek di çarçovê zimanê helbestê de hindê caran stayîşa xwedê mezin kirye û mnacata di navbera xwe û xwedê de derbirye ev core dibêjnê helbesta (paranewe), zmanê vê helbestê bahra ptir, pêk hatye ji paranewe ji xudê û wesifkirina meznahî û şyanên wî, liber runahya hzir û bîrubawerên musulmanetyê. Ji vê layenê ve, Kanî di helbesta (Xeyallêkî îmandarane) dibêjit:

*Her lebnî pêm heta mûy serm*  
*Xerqî gunah bûm nemdekrid şerm*  
*Mîsalî mecnûn bê seru saman*  
*Degeram ser sam le deşt û kêwan*  
*Tarîk bû rêgam nebû rehberm*  
*Le e'malî bed dill debû nerm*  
*Kesî wam nebû bpirsî hallm*  
*Le çake nebû fikir û xeyallm*

*Temennam dekrîd lebo axekî  
Lem fikre dabûm kewtme baxekî  
Baxekî dillgîr baxî baxdabu  
Lenaw ew baxe gullek peydabu  
Bonî deroyî bo 'errşî felek  
Mest û medhoş bûn lebonî melek  
Pîrî desgîr xoy be şukrulla  
Xefletî nebû qet le zîkrulla  
Dexaletim kird zor be zelîlî  
Pê m gut: bê mewam bo xot delîlî  
Dexîlek şahim qebûllim bkey  
Le dergahî xot qet derm nekey  
Ballay kirdewe xudayî xeffar  
Bûy be cîranî ehmedî muxtar  
Leçaw ewlya durr û ellmasî  
Necatî debê ewey bitnasî!*

Di dumahîyê de dbêjît:

*Turkî 'arebî û kurdî û farisî*

*(Kanî) natwanê senat binûsî*

*(Kanî: 32-33)*

Herwehaher rexnegir û xwînerok çavên wî ketibe berhemên wî helbestvanî, û dîwaneke wî xwendibe, gihaye vî baweriyê ku Kanî di helbesta mey û dildariyê de di asteke bilind de ye, di vê derheqê de helbestvan ji riya hest û soza evîndarane, peyvên bibandor û ciwan, têkel bi awaz û muzîkê kirine, û li wir kariye here nava kûrahiya mijarê û ciwantrîn mînaka helbestê pêşkêş kiriye.

Kanî bi xwe helbestvanekî badenoş û evîndar bûye, lewra hest û hizra helbestê, her tim di nava esmanê pan û berfireh, û jiyana jinê, mesta mey û bade, a hezkirinê bûye, û behreya hunerî jî her ji vê yekê çavkanî girtiye, lewra her helbestek li ser ciwaniya afret, dildarî, mey û bade bûbe, afirandineke baş jê bi dest xistiye. (Kerîm Şareza, 1980: 20). Em dikarin bêjîn helbestên (Cana çiyê emşew, sed sed, saqî were îmşoke perîşanim..) mînakên herî ciwan ên vê mijarê ne.

Kanî hemû helbestên xwe bi zaravayê (Sorani) nivîsandine, û di helbestên xwe de, şeweya helbestên kilasîk ên Kurdî peyrew kiriye, û di hindêk ji helbestên xwe de, hûrdekariyeke gellek baş peyrew kiriye, di hindêk ji helbestên xwe hûrdekariyeke gelek ciwan peyrew kiriye, û zimanêke edebî a bilind bi kar aniye, hewl daye bona avakirina hunera darêtin û peyrewkirina ciwaniya peyvan, û herwsa têkelkirina wan digel mosîqayekî balkêş, û çûn bo nava kûrahiya derûn û derxistina naweroka mijaran di qalibê helbestêke ciwan de. Bo mînak Kanî di helbesta (sed sed) peyvên ciwan û nazik û pirr ji hezkirin, di hevrengekirin û xemilandina peyvan bi darêtineke gelek ciwan a mosîqayê pêşkêşî me kirine. Kanî di helbesta (Sed Sed) dibêjit:

*Sed ahûiy weşî nezer û mehwaş û dildar*  
*Sedxemzeiy cadû û perîefsunkerîh'eyar*  
*Sedsaqîysaxrbekef û nergiz û cwmâr*  
*Heryekêbesedşêwebikahusnîxoyîzhr* (Kanî: 50)

### **Kanî û Naznavê Doxremeçî**

Herwekî ku me berê jî îşare pê kiribû, ku Kanî bixwe navê wî ê tewaw Ebdulcebar bûye, wekî deb û nerîteke carr ê wê demê ku hemû helbestevanan naznawek ji xwe re danîne, ew jî naznavê Kanî ji xwe re hilbijartîye. Lê naznavê Doxremeçî vedigere bo malbata wan, û malbata Kanî niha li bajarê Hewlêrê akncîne, û xwe wekî xelkê vî bajarî dihesibînin, ew çend malbatên din rêjeyêke diyar ya Turkemenên Hewlêrê pêk tînin, pêkhatiya Turkemen wekî pêkhatiya Turkemenî çendîn kesayetiyên wan ên diyar di nava deshilat û part û rêkxirawên civaka medenî de hene. Di vir de ya ku em dixwazin ku zêdetir li ser bisekinin, nav û dîroka malbata Doxremeçî ye. Peyva Doxremeçî peyveke Tirkî ye, û di zimanê Turkî de bi vê hunerê tê gotin, ku bona ciwankirin û hilkolîna nexş li ser darê tê çêkirin. Herwha hemû ew hûrdekariyan digre ku li ser darê tene hilkolîn. Di zimanê Kurdî ya Sorani de û bi taybet li bajarê Hewlêrê, bi vê hunerê tê gotin hunera dartiraşiyê. Ew huner her ji serdemên zû ve, heya ku digihîje îrorojê, bo komeke ciwankariyan pêk hatiye, bi taybetî ciwankariyên nav malê.

Derheq rêkewta wergirtina naznavê Doxremeçî ku çawa û li kuderê bi malbata Kaniyê helbestvan ve zeliqiye, li gora çavkaniyan be, ew malbat (di koka xwe de vedigere ser begzadeyên Caf) (Gîwî Mukiryani, 1966: 3), wate ew malbat di koka xwe de ser bi eşîra Caf bûn, (nêzî çarsed salek berî niha du bira ji vê hozê li ber hindek kêşeyê mîratparvekirinê û milk û mal, kesûkarê xwe cih dihêlin, û rû dikin bajarê Kerkûkê) (Kerîm Şareza, 1980: 8). Li gora van zanyariyan be, ku di dîwana Kanî de hatiye, û herweha li gora wan zaniyariyên ku ji malbata Kanî ve me guhdarî kiriye, ew yek ji me re eşkere dibe, ku ew du bira ku yê mezin navê wî Hesen bû, yê biçûk jî navê wî Ehmed bû, piştî vê ku ew du bira digel xizmên xwe ji eşîra Caf kêşe bo wan dirust dibe, lewra rû dikin bajarê Kerkûkê û li wir li cem hostayekî dartaş dibin şagird (kedkar), heyamekê di vî bajarî de kar dikin, lê bi sedema vê ku ew herêm dikeve ser riya hatûçûna Cafan û ew du bira jî nexwastin ku xizmên wan, wan bibînin, kedkariyê dikin, lewra wî bajarî bi cih dihêlin, û rû dikin bajarê Hewlêrê, û li Hewlêrê jî heman ew huner hilbijartine, û li cem hosteyekî dibin şagird. Piştî heyamekê bi sedema dilsojiya van du birayan bo karê xwe, hosta yek ji wan keçên xwe dide Hesen, û li Hewlêrê akincî dibin, Ehmedê birayê wî ê biçûk jî diçe Stembolê û li wir jî mijûlî hemann pîşeyî dibe, hem Hesen li Hewlêrê û hem jî Ehmed li Stenbolêdu hostayên baş ê dartaşiyê li wan çê dibe, û heya îro rojê jî ew naznaw li ser wan maye. Ku wisa bû em dikarin bêjin ku ew hemû Doxremeçiyên ku li bajarê Hewlêrê ne, vedigerin ser hosta Hesen (Kerîm Şareza, 1980: 8).

Malbata Doxremeçî malbateke kevnar û naskirî ne li Hewlêrê, çendîn kesayetî ên siyasî û helbestvan, rewşendbîr, kesayetiyên îdarî û civakî, di nava wan de hilketine, û xizmeteke zêde bi bajarê Hewlêrê kirine. Kanî ê helbestvan yekek e ji xortên herî zîrek û diyar ên vê malbatê, û xeynî Kanî çendîn helbestvanên din ên xwedîşiyar li vê malbatê de hilketine, bo mînak Cahîd Doxremeçî ku helbestvanekî navdar ê Hewlêrê ye, û sê dîwanên wî ên çapkirî hene, Herweha Ehmed Kanî ku yekek e ji neviyên Kanî ê helbestvan, ew jî xwediyê destrengîniyek e baş e di helbestnivîsandinê de. Wê malbatê di asta bilind di Herêma Kurdistanê de rol û pile û payeyeke bilind hene, bo mînak Ehmed Kanî Doxremeçî endamê serkirdayetiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îraqê û berpîrsê liqa vê partiyê ye, li Hewlêrê, Herweha Îbrahîm Doxremeçî wekî nûnerê Tirkemenan li parlamentoya Kurdistanê de endamê parlamantoyê bûye, û çendî pile û postên din hebûne.

Yekek din ji kesayiyên diyar ên malbata Doxremeçî Îhsan Doxremeçî ye, ew kurê Elî Paşa bû, Elî Paşa di serdema Osmanîyan de serokê şarewaniya Hewlêrê bûye. Ew di sala 1915`an ji dayîk bûye, û di destpêka salên 30-î ên sedsala borî bo xwendinê rû li Tirkîyê dike, û li Stenbolê kolêja pîzîşkî tewaw dike, li wir ji Kurdbûna xwe vedigere, û xwe wekî Tirk dide naskirin, lê pêwendîya dgel kesayetî û siyasethvanên Kurd veneqetand û pêwendiyên xwe kûrtir jî kirin, Îhsan piştî sala 1980-î, sazgehekê ava dike, bi navê sazgeha perwerdehiya bilind (Yûk). Piştî dibe endamê şanaz ê çend zankoyên wekî Arjantîn, Ustiraliya, Fransa, Almaniya, Amerîka, Tirkîye, Îngeltera, Siwîd û çend welatên din. Îhsan Doxremeçî di sala 1995-an de bû yekem serokê encumena rawêjê ya Turkemenî û heya ku mir jî, serokê Weqfa Hewlêrê bû. Avahiya wî li kelha Hewlêrê yekek e ji avahiyên herî kevn ku heya niha jî maye. Doxremeçî di sala 2007-an de, li bajarê Silêmanî liqa zankoya Bîlkentî ya Tirkî vekir, li Hewlêrê zankoya Bîlkentî a taybetî ava kir.

Binkeya sereke ya Bîlkent li Enqerê ya paytexta Tirkîyê, di sala 2009-an de, wek yek ji zankoyên herî girîng ên cîhanê hate nasîn, ew zanko hemû qonaxên xwendinê tê de hene, û xwendina bi zimanê Îngilîzî û Tirkî ye, herweha ew zanko li piraniya bajarên Tirkîyê de binkeyên wê hene, dersxwan û derçûyiyên vê zankoyê piştî tewawbûna xwendina xwe, li kompaniya û kargehên Doxremeçî de kar bi wan tê dayîn\*.

### **Karîgeriya Helbestvanan Li Ser Kanî**

Kanî bi sedema gotinên xweş û civakîbûna xwe, di temenê ciwanîyê de heya dawî roja temenê xwe, gellek diçû nav xelkê de, bi taybetî têkel dibû digel kesên rewşenbîr û edebdost, vê yekê jî weha li Kanî kiribû ku mifahê wergire ji şiyana kesên edebdost û xwedîşiyana, ew bandora jî di jiyana Kanî û di berhemên wî de reng vedane, herwsa Kanî ji riya xwendina zêde ve, têgihîştineke baş bo tewahiya mijaran peyda kiriye, xeynî vê yekê jî di edebiyat û zimanê Kurdî de şarezaiyeye baş peyda kiribû, heya radeyeye baş zimanên Farsî, Erebi û Tirkî jî zaniye, vê yekê jî weha li Kanî kiriye ku xeynî mijarên edebî û helbestên helbestvanên Kurd, helbestên helbestvanên her sê zimanên Farsî, Erebi û Tirkî jî bixwînin, û qazancê

---

\* Zanyariyên taybet bi zankoya Bîlkent ji rêzdar Dr. Nesîm Sonmez hatine wergirtin. (Dîroka hevpeyvînê: 02.05.2019)



bibînin ji şîyan û behreyên wan jî, lewra em diakrin bêjîn ku Kanî wek piraniya helbestvanên berî xwe bandora çend nivîskar û helbestvanên din li ser hebûye.

Kanî ji riya van şopandinên tevalî, hemû aliyane, nasyariyeke baş di edebiyata Kurdî û Farsî û Tirkî de peyda kiriye. Dîwana helbestê a piraniya helbestvanên mezin ên Kurdan xwendiyê, bi taybetî Nalî, Salim, Kurdî, Şêx Rizayê Talibanî, Tahirbegê Caf û Wefayî, hemû dîwanên van helbestvanên Kurd û hindê ji helbestên Tahir Begê Caf, Bêxud, Safî Hîranî û çend helbestvanên din ên Kurd bandor li ser Kanî û ezmûna helbestvaniya Kanî ava kiriye.

Kanî helbestên gellek ji helbestvanên Tirk û Fars xwendiyê, û di nava helbestvanên Tirk de, helbestvanê bi navê (Fizûlî) gellek bi dilê wî bûye, Fizûlî yek bûye ji helbestvanên mezin û navdar ê Tirk, û di serdema Sultanê Osmanî (Sultan Silêmanê Qanûnî) de jiyan kiriye. Bi sedema vê bandoriya Fizûlî, Kanî dest kiriye bi wegerandina (Leyla û Mecnûn) a wî helbestvanê Tirk li ser zimanê Kurdî, û ew wergeran destkariyeke gellek kêmtêde hatiye kirin, û naweroka vê dastana dildarî, wergerandine ser zimanê Kurdî (zaravayê Soranî). Dastana wergerandî ji aliyê (Gîwî Mukiryani) ve ji sala 1961-an ve heya îro sê caran hatiye çapkirin.

Derheq helbestvanên Fars helbestên çend helbestvanên wê demê yê Fars xwendiyê, helbestên (Se`idî, û Hafîzê Şîrazî û Mesîha) a gellek bi dilê wî bûne, her derheq bi bandora helbestvanên Fars, Kanî bi vê sedemê ve dest kiriye bi bikaranîna "pênc xiştekî"an li ser helbesta helbestvanekî Îranî bi navê (Mesîha). Hemû ew xwendin û şopandin ku Kanî bo helbestên helbestvanên berî xwe û serdema xwe kirine, bûne sedemeke baş, bo vê ku Kanî di ezmûna helbestê de berew asteke bilind here (Kerîm Şareza, 1980: 16).

Destpêka qonaxa helbestvaniya Kanî ku hêşta rêbaz û dengê muzîka helbestê peyda nekiribû, hertim li pey xwendin û helbesta helbestvanan bûye, û hewl daye ku ji riya têgihîştina xwe ve qazanc bike, da ku bikare dest bi nivîsandina helbestê bike, yek ji wan helbestvanên ku her di destpêkê de qazanc bo Kanî hebûye (Tahirbegê Caf) bûye. Kanî jî yekem siwarçakê vê meydanê bûye. Wate her ji destpêka helbestvaniyê ve li pey wan cure "sazgar"an de bûye, heya ku alavên hewce ji wan wergire, di nivîsandina helbestên xwe de wan bi awayekî ciwan darêje, û herweha bi

awayekî xomalî pêşkêş bi cîhana edeb a Kurdî bike. Ew yek jî bi awayekî zelal di "xezel"ên helbestvan de reng vedaye (Kerîm Şareza, 1980: 19).

Derheq bi rûçik û şêweya helbestê ji hêlekê ve, û ji aliyekî din ve "kêş" û "serwa" a helbestên Kanî, bi taybet di helbestên pêşîn ên wî de, Şêx Rizayê Talebanî zêdetir bandor li ser wê hebûye. Vê yekê jî dibêje me, ku Kaniyê helbestvan hemû helbestên Şêx Rizayê Talibanî bi dilê wî bûne, jiber ku her ji riya xwendinê ve, û di bin bandora helbestên Şêx Rizayê Talebanî de, wî rû li xwendina helbestên helbestvanê Fars "Mesîha" kiriye, û wek Şêx Riza dest kiriye bi danîna helbestên "pêncxiştekli ser helbestên helbestvanê Fars Mesîha. Ew jî nimunek ji pênc xiştekî ku Kanî li ser helbesta helbestvanekî Îranî bi navê Mesîha:

*Bê mîsle cemalit le hemû muslim û îfrenc  
Bê hoşe dilm cane le îşqî to be bê benc  
Teswîrre xeyalî to le sînem weku şetrenc  
(çeşim û cet û xall û rex û ebruy tu her penc  
Zîba est ber an î'arz nîkwî tu her penc))... (kanî:63 )*

### **Kanî Li Cem Helbestvanên Kurd**

Kanî bi sedema vê ku kesekî civakî bûye, hertim digel hemû çînen cuda ên civakê bi taybetî çîna desteng nerm û niyan bûye, herweha gellek hez ji medreseya edebî û zanistî hebûye, ew her tim cihê balkêşandina aliyê hember bûye, û şîyanên Kanî weha kiriye ku xelk gellek li wî hez bikin. Herweha qisexweşî û gotar şîrînî sedem in bona vê ku xelk zêdetir guhê xwe bidnê. Vê yekê jî Kanî zêdetir pal daye bo berdewambûn û pêşkêşkirina helbestên xwe bi awayekî herî baş, û vegeşandina zêdetir ya karên xwe. Her wekî ku me bas kir, Kanî hertim di nava xelkê de bûye, xeynî vê yekê jî her cihekî civîneke edebî û şîrîhebûya, wî jî xwe digehande wir, û ji riya helbestên ciwan ên xwe ve, xizmeta helbestdostan dikir. Bi sedema wan helbestên ciwan û pîrr muzîka ên xwe, xelkekî zêde di herêmê de ji helbestên wî hez dikirin, xeynî xelkê sade ên navçeyê, Kanî li cem helbestvan û nivîskaran jî kesekî hezkirî û bibandor bû.

Piraniya wan nivîskar û helbestvanên ku digel Kanî jiyan kirine, ragehandine ku Kanî mîna keke bilind ya edeba kilaskîk a Kurdî ye, bi taybetî li bajarê Hewlêrê,

lewra gellek ji helbestvanên me, bi sedema hezkirin û bandora helbestên Kanî li ser wan, li çend ciyan helbest li ser nivîsandine, û di nava xetên helbestên xwe de, hezkirina xwe nîşan dane. Herwsa hinek ji helbestvanan di "pênc xiştekî" ên xwe de helbestên wî têkel bi helbestên xwe kirine. Ew şêweya helbestê (pênc xiştekî) li edebiyata Kurdî de carr bûye û cihê xwe girtiye, û di serdema Kanî de gellek helbestên weha ên pênc xiştî hatine nivîsandin. Eva jêr mînaka van pênc xiştîyan in, ku helbestvanên Kurd ên navçeyê li ser Kanî nivîsandine.

### **Pêncxiştekî a (Mîhrî) Li Ser Helbestên Kanî**

Mihemed Şerîf Mîhrî di serdema Kanî di jiyanê de bûye, yek ji helbestvanên tevgera helbesta Kurdî bûye li bajarê Hewlêrê. Ew di malbateke dîndar a bajarê Hewlêrê ji dayîk bûye, û ji mizgeftê ve dest bi xwendinê kiriye, û piştî bûye mela, û wek yek ji helbestvanên diyar û xûya ên navçeyê peyrewî ji helbesta Kîlasîk a Kurdî kiriye, û xwediyê behre û dariştineke helbestê a resen e, xeynî zimanê dayîkê, û zimanê Erebi, Tirkî, û Farsî jî dizane û helbest jî pê nivîsandine, helbestên Mêhrî jî teji ne ji muzîkahelbestê. (Goran Soran Feyzî, 2006: 165-167). Mîhrî yê helbestvan çendîn pênc xiştekî li ser Kanî nivîsandine, ku eva jêr mînaka ciwanî ya van pênc xiştekî ne, ku li ser yek ji helbestên (xizmîne werin) a Kaniyê helbestvan me nivîsandiye:

*Ta çend le rêy îşq ebê (Mîhrî) to bedhal?*

*Ta çend le rêy îşq ekey serfî zer û mal?*

*Ta çend ekey wesfî kemer bazin û Xelxal?*

*((Ta key edwêy (kanî) le ewsafî xet û xal*

*Wa çake lemewla xezelxwanî weten bîn))*

(Kanî: 65)

### **Pêncxiştekî (Cahîd) Li Ser Helbestên Kanî**

Navê wî ê tewaw Burhan Hacî Mihemedê hacî Ebdulrehmanê Doxremeçî ye, û di sala 1918-an li Hewlêrê ji dayîk bûye. Wî di yek ji xwendingehên bajarê Hewlêrê de xwendiyê, û di sala 1934-an de dest bi nivîsandina helbestê kiriye, helbestên wî di asteke teknîkî û muzîk a bilind de ne, bi taybetî di warê çawaniya hîlbijartina peyvan û avakirina muzîkekbicî bo helbestên wê, Cahid gellek bibandor

bûye bi Kaniyê helbestvan, û gellek caran li gellek ciyan bi şanazî ve helbest li ser Kanî nivîsandine, bo mînak di vê helbesta xwarê de, Kanî şibhandine bi xwezayaciwanî a gul û gulzar. Di vê helbesta Cahîd de, hemû reftarên ciwan ên mirovahiyê di miroveke mezin wekî Kaniyê de xûya dikin, bo mînak:

Di vê helbesta jêr de, Kanî hatiye şubhandin bi xwezaya ciwanî a gul û gulzar, di vê helbesta Cahîd de, hemû reftarên ciwan ên mirovahiyê di mînaka miroveke mezin wekî Kanî de tê nîşan dan:

*Kanî gul û gulzare be elfaz û me`inay*  
*Kanî dil û dilzare be ebiyat û zubanî*  
*Kanî qedemî xistiye bo millet û cahî*  
*Kanî qelemî girtuwe bo hikmet û şanî ...* (Kanî: 82)

Her derheq bandorên Kanî ê helbestvan li ser helbestvanên Kurd û bi taybetî li ser Cahîdê helbestvan. Cahîd di cihekî din jî riya "pênc xiştekî" ve bi sedema bibandoriya helbestên Kanî li ser wî bixwe, dest kiriye bi bikaranîna du nîve xet jî helbestên Kanî, û sê nîve xet jî helbestên xwe, ew jî wek helbestvanên din, pênc xiştekî ava kirin. Di wan pênc xiştekiyan de jî muzîkekahelbestê a ciwan pêşkêşî me dike. Mînaka pênc xiştekî a Cahîd li ser Kanî:

*Birwa demî ecz û elem û hesret û nale*  
*Reng rene le baxane gul û sombol û lale*  
*Zayi`i nebê em wexte ke eyamî wîsale*  
*((saqî were îmşoke le bom têke piyale*  
*Bo mezze le rût kafîye em daneyî xale))...* (Kanî 68-69)

### **Pêncxiştekî a (Mihemed Sayb) Li Ser Helbesta Kanî**

Mihemed Sayb Neqşbendî hem helbestvan û hem jî parêzer bûye, di kovara *Govara Hetaw* û hejmara 49 a sala 1955-an de, li (r. 7 û 8) heft heb "pênc xiştekî" li ser helbesta Kanî (ser firo nakem) wate "serê xwe natewînim" nivîsandine, ku weha ye:

*Min ke şêrî serzemînim naşkênim şewketim*  
*Namewê mulkî cîhan şexsêkî xawen îffetim*

*Min berî karî dexom ta mawe tozî quwetim  
((ser firo nakem bo alem çûnke `alî hîmmetim  
Naçwêm bo hemû dunya le destm rexbetim))...*

(Kanî: 70-72)

### **Bizava Helbestê Li Serdemê Kanî Da**

Her tevgerêke edebî û helbestêhewcehiya wê bi paşxaneke edebî ya helbestêheye bona vê ku edîb û helbestvan hewl bidin ku li gora rêbazeke diyarîkirî edebiyata helbestêya xwe vegeşînin, û bikarin bi awayekî cudatir liv û tevgerêke nû bixin navçeyê de. Pêkanîna liv û tevgerêke nû bo her navçeyekê hewcehiya wê bi lêkolîneke hûr a siyasî, aborî û edebî a navçeyê heye. Guherînkari jî sedem in bona baştirkirin yan xiraptirkirina biyavê aburî a navçeyê. Wate bandorên aburî û siyasî rasterast kar dikin ser bizavê edebî û helbestêên heman navçeyê, û dîroka rabihuriya edebiyata cîhanê û edebiyata Kurdî jî şahidiya vê yekê didin, ku çawa biyavê siyasî û civakî û aburî bandor li edebiyat û helbestêkiriye û çawa ji qonaxekê ve bo qonaxeke din hatiye veguhastin. Em naxwazin di vê lêkolînê de bi awayekî hûr herin nava naweroka vê mijarê, jiber ku ew yek hewcehî heye bi lêkolîneke taybet û berfirehtir, lê em hewl didin ku tenê di çarçoweyêke diyarîkirî de bas jê bikin, di nava basa me de jî, gelek bi kurtî emê bi ser de herin, wate ya ku em dixwazin di vir de basê bikin, tevgera helbestêye, û bo tevgera helbestêjî tenê emê wê serdemê û wî cihî wek diyarîkirî wergirin ku Kaniyê helbestvan tê de jiyan kiriye, Ew jî Bajarê Hewlêrê ye.

Bajarê Hewlêrê Bajarek gelek kevin û navdare di nawande Bajarêde kehla Hewlêrê heye, ev Bajêr “binemayek a zanisti, şaristani bi hêz heye, li ser asta cihanê wek yek ji Bajarek her kevin hatiye nişandan” (Şwan Xosnaw, 2016: 16). Bajarê Hewlêrê di dawiyên deshîlata Osmanîyan de û heya ku digihîje geşkirina şerê yekem ê cîhanî di sala 1914-an de wekî qezayekê ser bi waliyê Bexdayê û hindek caran jî rasterast ji aliyê dewleta Osmanî ve hatiye birêvebirin. Di vê serdemê de wek hewce girîngî bi bajarê Hewlêrê nehatiye dan, wate di asta dîroka kevn a bajar wekî piştguh xistinê ye. Piştî vê ku dewleta Osmanî jî têkel bi şerê yekem ê cîhanî bû, Îngilîziyan bajarê Bexdayê dagîr kirin, piştê berew wilayeta Mûsilê ve çû. Hêjayî basê ye Îngilîzan her cihek li ser berjewendiyên xwe wek metirsî zanîban, ew der dagîr dikirin, heya ku wisa lê hat ku Îngilîzan di 10.11.1918-an bajarê Hewlêrê jî

dagîr kirin, piştî çend mehan kapîtan (Hay) wek yekem hakimê leşkerî ji bo Hewlêrê hate destnîşankirin, û di meha 11-ê a sala 1919-an de Hewlêrê dikin lîwaya Hewlêrê, û her du qezayên Koye û Rewanduzê jî xistin ser. Piştî avabûna dewleta Îraqê jî (Ehmed Fendî) wek yekem muteserîfê vî bajarî tê diyarîkirin.

Îngilîz jî heya radeyekê girîngî dane vî bajarî, û hewl dane ku rêûban, binkeyên tendurustî, sedemên veguhastinê û sedemên fêrkirinê jî vegeşînin, ew hemû sedem bûn bona vê ku vejyandineke siyasî-edebî li bajarê Hewlêrê serî hilde, lê ji aliyekî din ve piştî vê ku dewleta Îraqê ava dibe, bi hevkarîya Îngilîzan her du pêkve hewl dane ku her tevgerê rewşenbîrî-siyasî-edebî a Kurdî di vê navçeyê de serî hilde, wê ji nav bibin. Lê tevgera helbestê û edebiyatê û piştî siyasî jî, rû li vegeşînê kiriye, lê ew vegeşiyar destpêkê gellek bi lawazî hatiye pêş, wate bo ên ku di wê demê de û di vê navçeyê de, dest pê kirine, gellek zehmet bûye. (Goran Soran Feyzî, 2006: 50).

Kanî ê helbestvan jî di nava vê gêjawê de hatiye cîhanê, lê hewla berdewam bûna Kanî û hewşeweyên wê di Hewlêrê de, helbest ber bi pêş ve birine. Tevgera helbesta Kurdî bi taybetî di dawîya sedsala nozdeyan û destpêka sedsala bîstem ber bi pêş ve hatiye û dest bi vegeşînê kiriye, lê destpêka vegeşîna tevgera helbestê di bajarê Hewlêrê û bi taybetî di serdema Kaniyê de bi lawazî hatiye û zêde girîngî pê nehatiye dayîn, bo mînak salekê berî jidayîkbûna Kaniyê helbestvan, di Qahirê de yekem rojnameya Kurdî bi navê *Kurdistan* di sala 1898-an de derketiye, lê dengê destpêkê ê vê rojnameyê gellek bi başî negihîştîye Hewlêrê. Herwesa bajarekî kulturî a kevn wekî Hewlêrê heya sala 1908-an tenê yek xwendîngê li wir hebûye. Ew jî hejmara dersxwanên wê gellek kêr bûn, jiber ku xelk wisa fêr bibûn ku zarokên xwe dişandin mizgeft û hucreyan, û li wir perwerde dikirin. Her di serdema Osmaniyan de piştî bilavbûna destûra Osmaniyan (azadiyeke zêdetir bo helbestvan û edîbên neteweyên din û di nav wan de jî edebiyata Kurdî hatiye pêkanîn) (Îsmahîl Îbrahîm Sehîd, 2010: 73). Lewra di vê serdemê de piştî vê ku rûyê Stenbolê berew rûyê welatên Ewropî û cîhanê vedibe, çend komele û rêkxirawên Kurd ava dibin, ew jî wek (Komeleya Te`alî û Tereqî a Kurdan, Kmeleya Bilavkirina Zanyariyên Kurdî, Komeleya Hêvî û çend rêkxiraw û komeleyên din). Hemû ew komele û rêkxirawane vejyandineke nû bo edebiyat û helbesta Kurdî ava kirine, lê dîsan ew komele û rêkxirawane dengê wan bi başî negihîştîye Hewlêrê.

Herwek ku me berê jî îşare pê kiriye, Kaniyêhelbestvan, destpêka xwendina wî di hucre û mizgeftên Hewlêrê bûye, piştî bi riya xwedina taybetî û xwendina derekî, asta jîrbûna xwe zêdetir vegeşandîye û di tu xwendîngeheke din de nexwedniye. Lê ew qas girîngî daye bi şîyanên xwe, heya ku wisa lê hat, ku bi rûyê edebiyata Kurdî û helbestnivîsînê de biteqe. (Kerîm Şareza, 1980: 14). Xeynî Kanî helbestvanên hevserdem û hevxebatên edeb û helbestê, her ji destpêkê ve, ew jî bi sistî dest pê kirine, û piştî hêdî-hêdî kar û şîyanên xwe vegeşandine.

Di nîva yekem a sedsala 19-an de guhertîneke mezin bi ser helbesta Kurdî de hat, bi taybet bi ser zaravayê Soranî, ew jî li jêr sîbera mîrnişîna Baban û her sê helbestvanên mezin ên navçeyê (Nalî, Salim, Kurdî) bûn, ew sê helbestvan mînakek mezin bo helbestên Kurdî berhem anîne, û bûne xwendîngeheke diyar û xûya ya navçeyê, û bandora wan bi ser helbestên helbestvanên Soran, Erdelan, Germiyan, û Mokiryane jî hebûye (Mistefa Seyîd Mîne, 2008: 20). Herwsa ew xwendîngeh rengvedan bi ser helbestvanên Hewlêrê hebûye, helbestvanên vê navçeyê qazaneke baş ji hêz û behreyên wan wergirtine.

Bi awayekî giştî sedemên ayînî, siyasî, civakî, û rewşenbîrî a navçeyê bi taybetî di hemû serdeman de sedema vegeşîn û ber bi pêşvebirina rêrewa civakê ne, û di nava civakê de jî kesên cuda hene ku mînaka bilind û diyar a serdema xwe ne. Derheq bi mînakên bilind û diyar ên helbestê û edebiyata Kurdî di navçeya Hewlêrê bi taybetî di serdema Kanî de ku çend helbestvanek derketine, û rêrewa helbestê vegeşandine, di vê navçeyê de pêk dihatin, ji yên jêr: Mela Husên (Fanî), Mela Salih Gozepaneyî, Ebdulcebaraxayê Doxremeçî (Kanî), Gîwî Mokiryani, Nasih Heyderî, Mihemed Şerîf (Mîhrî), Şêx Celal Şêx Cemîl Neqşbendî (Nurî), Reşad Mofî, Îbrahîm Hoşiyar, Burhan Cahid, Seyîd Mihyedîn Berzencî (Nejad), Ebdullah Herşemî, Mexdîd Soran, Mela Erîf, Elî Fetah, Mes`ûd Bêbeş, Pîrbal Mehmûd, Medhet Bêxew, Cewher Xemgîn, hemû ew helbestvanane, helbestvanên serdemek diyarîkirî ne, û her yek ji wan xwediyê dîwana taybet bi xwe ne.

Derheq taybetmendiya helbesta helbestvanên Hewlêrê em dikarin bêjin ku helbestvanên kilasîk ên vî bajarî di warê form de bi awayekî giştî hewşeweya tewahiya helbestvanên zaravayê Soranî ne. Herwsa dîsan di warê form û heya astekê di warê nawerokê de jî bandora helbestvanên navçeya Baban di helbesta

helbestvanên Hewlêrê gellek bi zelalî derdikeve, û li ser heman diyalektîka helbestê diçin.

Derheq diyalektîka hindek ji helbestvanên Hewlêrê ku zêdetir zimanên navçeyî bi ser de zal bûye, di helbestên wan de şêweya Hewlêrî pêve xuya ye. Ew yek jî bi sedema bikaranîna çendîn peyv û zaravayên taybet bi navçê ye, ku zêdetir ji aliyê xelkê Hewlêrê ve bi kar tên, ew jî wek (Mizgeft, Lo, Deygo, Xan, Kesk, Dak, wekî...). Hemû ew peyvane di nava helbestên hindek ji helbestvanên Hewlêrê, ji helbestên helbestvanên Baban heya radeyekê, cuda bin. Em dikarin bêjin ku hemû ewkesê ku şarezayîya wan di zimanê Kurdiya Soranî de hebe, bi eşkere hest bi vê yekê dikin ku şêweya eşkerekirina hindek peyv ji navçey Silêmaniyê ve heya navçeya Hewlêrê heya astekê ji hev du cuda ne, cudahî jî tenê di warê derbirîn û formê ve ye, hekî na, di warê nawerokê de, heman watayê didin.

Bi awayekî giştî helbestvanên Hewlêrî jî wekî koma helbestvanên kilasîkî a Kurdî di warê ziman de, çendîn peyv û zarawayên zimanên (Erebî, Tirkî, Farsî) di helbestên xwe de, bi kar anîne. Herwesa di warê bikaranîna "kêş", helbestvanên wê demê ên Hewlêrê du cure kêş bo helbestên xwe bi kar anîne. Ew jî (kêşa xomalî û kêşa Erûz a Erebî) bûn.

Derheq "kêş" a xomalî ku kêşa penceyî, Silab, û jimareyî jî pê tê gotin, wê serdemê, ew cure kêş ji aliyê helbestvanên Hewlêrê ve gelek kêş bi kar hatiye. Tenê çend helbestvanek nebin ku helbestên weha nivîsandine, Kanî yek ji wan helbestvanan bûye, û herwesa Îbrahîm Hoşyar û Mexdîdî Soran ew cure kêş bi kar anîne. Em dikarin bêjin ku di kêşa xomalî de helbestvanan zêdetir ew du cure kêş bi kar anîne, ku ew jî (kêşa saf û kêşa têkelaw e), lê piştî salên pênciyar a sedsala borî komek helbestvanên Kurd rû li wan cure helbestan kirine, û ser ji nû ew cure helbest bi awayekî berfireh bikar anîne.

Herwesa kêşa Erûz a Erebî ku ji aliyê koma helbestvanên kilasîkî ên Kurdî û helbestvanên wê demê ên bajarê Hewlêrê kar hatiye. Piraniya herî zêde ya helbestên xwe bi vê kêşê nivîsandine. Helbestvanên Hewlêrê zêdetir ew kêşên Erozi ên Erebî bi kar anîne, ku baştir digel deng û muzîka helbestên wan yek digre, kêşên wê jî zêdetir pêk tên ji kêşa (Hezec, Recez, Remel). Ya jêr çend mînakên van helbestvanên Hewlêrê ne:



(Fanî) helbestvanekî kilasîk ê Kurdê bajarê Hewlêrê ye, navê wî (Mela Husên Şêx Se`idî) ye, dîwaneke wî heye bi navê *Dîwana Fanî*, ku eva jêr mînaeke ku bi kêşa hezeca heşt a exrebî a mekfûfa mehzûf hatiye vehûnandin (Mef`ûlu, Mefa`îlu, Mefa`îlu, Mef`ûlin).

*Goftarî felek kirdî serî em dem û lehçet*

*Reftarî felek bê be fîday gerdûş û lencet...* (Fanî: 12)

Herwsa helbestvanekî din ê me bi navê Qazî (Reşad Mofî) mewlûdnameya Kurdî nivîsandîye. Di mewlûdnameyê de kêşa remelî şeş a mehzûf bi kar aniye, (Fa`îlatun, Fa`îlatun, Fa`îlun).

*Roj û şew zorim dekird fikr û xeyal*

*Mewlûdî Kurdî binûsim bê mîsal...* (Mewlûdname 16)

Di warê serwaya helbestê, helbestvanên Hewlêrê di vê serdema ku Kanî tê de jiyana kiriye, du cure serwa bo helbestên xwe bi kar anîne, ew jî (Yekîtiya serwa û serwayên hemû cur in). Derheq yekîtiya serwayê ku muzîkekciwan dibexşe helbestê, di dawîya hemû xetekê de, em guhdarê dubarebûna muzîkekxweş dibin. Bo mînak derheq yekîtiya serwayê, emê kopleyekê ji helbesteke (Burhan Cahîd ) wergirîn, ku ew jî yek ji helbestvanên navdar ê bajarê Hewlêrê ye.

*Hênde sermestim çî hoşêkim nema dunya çîye?*

*Min çîme û saqî çîye, hem bade û sehba çîye?*

*Min be sewdayî serim sed muşkilî dil hel dekem*

*Eql û hoşim ger le rêy sewdayî ser birwa çîye?...* (Burhan Cahid: 32)

Herwsa derheq bi serwaya hemûreng a helbestvanên Hewlêrê zêdetir ew cure serwa bi kar anîne, ew jî wek: (Cot serwa, Sêyîne, Çwarîn, pênc xiştekî), ew yek jî, ji helbestvanekî ve bo ên din cuda ye, wate kêma û zêde bikaranîna serwaya hemûreng ji helbestvanekî ve bo ên din cuda ye, lê bi awayekî giştî hemû ew cure serwa di nava helbestên helbestvanên vê heyamê de xûya dikin. Yê jêr jî, mînaka hindek ji wan serwayên têkel ên helbestvanên wê serdemê ên bajarê Hewlêrê ne:

Mînaka "cot serwa" li dîwana (Heyderî) de, helbestvanê bajarê Hewlêrê, di destana Şêx Ehmed Cizîrî û Rabî'e Xatûna Xûşka Bedirxan Paşa, dibêje:

*Dekem basî Şêx Ehmed (Cizîrî)*  
*Bedirxan Paşa ew sake bû (mîrî)*  
*Muderis bû xazî`î medresey (mîr)*  
*Îmam û xetîbî mizgeftî (Cizîr)*  
*Serokî alîmanî dewrî (xoy bû)*  
*Be dayim merce`î esnafî (xoy bû)...(dîwana Heyderî)*

Bo mînak derheq çarxiştekî, emê kopleyekê ji helbesteke (Mexdîd Soran ) wergirîn, ku ew jî yek ji helbestvanên bajarê Hewlêrê ye.

*Min ke xawenî baxî berdar bim*  
*Be dil sermestî dû çawî yar bim*  
*Hergîz naçimewe bolay kiçî rez*  
*Meger wek Ferhad le jîn bezar bim...* (Homa: 27)

Mînaka pêncxiştekî: Nasih Heyderî Helbestvanê Hewlêrê pêncxiştekî li ser helbestek a helbestvan Dildar nivisandi ye:

*Xerqî be'hrî îşqî xunçey (Newbeharêkim)*  
*Esîrî x'emzey celladî yarî (çawxumarêkim)*  
*Zebunî lencew larî çi şoxî (Be qerarêkim)*  
*(Zedey tîrî nîgahî fitne perwazî (Nigarêkim)*  
*Gîrodey dawî zulfî muşkbarî (Gul'uzarêkim)...(Heyderî: 8)*

Helbestvanên Hewlêrê di helbestên xwe de hunerên rewanbêjîyê bi awayekî berfirehbi kar anîne, di hunera rewanbêjîyê de helbestvanên Hewlêrê bona xemilandin û ciwantirkirina helbestên xwe hunera wekhevkirinê (lêkçiwandin, hevrengekirinê) zêde bi kar anîne. Piştî vê jî helbestvanan hunerên Xwaze, Dirke, Regezdozî, danîna naznav û çendîn mijarên din ên hunerên helbestê di helbestên xwe de bi kar anîne. Helbestvanan bi bikaranîna van hunerên helbestê, helbestên xwe xistine qalibeke ciwantir û şêwe ûmuzîkekciwantir bo helbestên xwe ava kirine.

Di biyavê naweroka helbestên helbestvanan, helbestvanên Hewlêrê jî, wekî piraniya helbestvanên din ên vê serdemê, mijarên neteweyî, dildarî, ayînî, stayiş

(peristin), civakî, şîret, şanazî bi xwekirin û mijarên meyvexwarin û çendîn mijarên din koma naweroka helbestên wan bûye ûhelbestvan her yek ji wan ji dîtingehêkê ve, naweroka helbestên xwe bi van mijaran xemilandin, û hindek ji helbestvanên me li gora hezkirina xwe, gellek bi hogirî ve çûne nava hindek ji mijaran, her vê yekê jî weha kiriye ku naweroka helbestên hindek ji helbestvanan bihêztir û xweştir derbikeve. Herweha gellek caran bi sedema vê ku helbestvanek girîngiyêke zêde bi mijarekê daye, mijarek zêdetir ji ên din pêş xistiye, wate di helbestên xwe de jî, gellek bi kûrî çûye nava mijareke diyarîkirî de, bo mînak neteweyî, şanazîkirin bi xwe, yan dildarî, yan her mijareke din, eva ye ku weha dike ku helbestvan pê bê naskirin, bo mînak Kaniyê helbestvanê me (gellek caran dibêjnê helbestvanê me yî û dildarî yan helbestvanê nefes bilind) (Kerîm Şareza, 1980: 21).

Bi awayekî giştî di vê serdema diyarîkirî de û bi taybetî di destpêkên vê serdemê de, li Hewlêrê tenê yek-du xwendingehên Mîrî hebûn, piştî hatine zêdekirin û hejmaraxwendingehan zêde bûne, hekî na, di vê serdemê de xwendin û hînbûn tenê di mizgeft û xwendingehên olî de hebûne, mizgeft û xwendingehên olî cihê fêrbûn û pêgehandina xwendekaran bûne, lewra di warê rewşên bîrî de, ew bajar zêdetir rûyê wê li aliyê ayînî bû, jiber ku hemû ew edîb û helbestvanên di vê serdemê de pê gihîştibûn, çêkiriyê mizgeft û xwendingehên dînî bûn.

Derheq bi naveruka vê tezê me hewl daye ku biawayekî giştî sinura vê vekolinê Dîwana Kanîbe, Di Dîwana Kanîde xebata me li ser helbestên Kanî û muzîka helbestêwîne. Dîwana Kanî yek ji komkiriya ji helbestên helbestvan e, ku ji aliyê (Mowefeq Ekrem Kanî) ve hatiye komkirin, Piştî ji aliyê Kerîm Şareza di sala 1980-î de wekî (Dîwana Kanî) li bajarê Bexdayê hatiye çapkirin. Di dîwana Kanî de xeynî vê ku bas ji jiyan û serpêhatiya wî hatiye kirin, hejmarek ji helbestên wî ku têkel in bi awaz û muzîkekciwan di nava dîwanê de, têne dîtin. Helbestên Kanî xeynî vê ku bi zimanê Kurdî ne, çendîn peyv û zaravayên zimanên cuda tene tene bikaranîn, ew jî wekî zimanên Erebî, Tirkî û Frasî.

## 1. MÛZÎKAHELBESTÊ

Muzîka helbestê zaraveyeke lêkdayî (têkel) e, ji du peyvên pêk hatiye, ew du peyv yan ew du destewaje (zarawe) têkiliyeke bihêz bi hev re hene, û her ji demên kevin û mêjîn ve heya niha wekî du regezên diyar û afirîner li hev nêzîk in, û hertim bi hev re ne. Em dikarin bêjin ku ecêb nin e, hekî ew bi hev re bin, jiber ku (muzîk û helbest) her du pêkve aliyê ciwanî û nazikiya hest û hundirê mirov nîşan didin, û her dîsan pêkve dibin sedem ji bo bexşîna xûreka ruhî ji bo mirovan, ji ber vê yekê "di hemî helbestan muzîk bingehe, nebûna muzîk di helbestê de ci helbest nabin helbest" (Şewqî Zeyf, 1987: 137)

Muzîka helbestê ew pêkhatiya nazik û ciwan e ku kar dike ser hesta xwîner û bîserê helbestê û herwisa tameke taybetî dide wê. Xeynî vê yekê jî roleke bibandor heye wekî regezeke (toxmeke) bingeha hunerî. Muzîka helbestê xwe di qalibê helbestê de dibîne ku ji kêrhatiya dilê helbestvan ve çavkanî digre û hildikele, û di helbestê de xwe nîşan dide, her hundirê vî helbestvanî ye ku ast û radeya Muzîka Helbestê di biyavê bihêzbûn û bêhêzbûnê de nîşan dide. Her di vê derheqê de Marif Xeznedar *dipêşgotina Dîwana Selam* de nivîsandiye (helbest, bîr û bawer û rêkxistin û muzîk e) (Dîwana Selam, 1958: 25). Lewra muzîka helbestê herwisa tişteke sanahî nîne, belku hewcehî bi rêkxistina van bîr û bawerî û "hest"an ve heye ku di hundirê her kesekê de hene, wate bi bê hebûna bilêvkirineke ciwan (telefozeke baş) ne helbest, û ne jî muzîk nahêne avakirin.

Her wekî ku me îşare pê kir ku muzîka helbestêdestewajeyeke têkel (lêkdayî) ye, û her di bingeha xwe de ji du peyvên cuda pêk hatiye, lewra em dixwazin ku bas ji peyvên muzîk û helbestê bikin, û herwisa bi awayekî hûr em bas ji têgeh û pênaseya her yek ji wan bikin:

### 1.1. Muzîk, Têgeh û Pênase

Peyva muzîk (Music) di warê avabûnê de ji navê (Muse) + paşgira (ci) pêk hatiye. Li ser dîroka serhildana muzîkê û herweha şêweya avabûna muzîkê boçûnên cur bi cur hene, lê bi awayekî giştî û piştî xwendina me bo vê basê piraniya çavkaniyan van boçûnên jêr îsbat dikin:

Muzîk wek destewaje ji peyva (Muse) a Yûnanî a kevin hatiye wergirtin, ku yek ji jinên Yûnanî bûye ku digotne wê "Xudawend". (Ziyus û Mîxos) neh keç hebûne, ku yek ji wan jinan Xudawend (Muse) bûye. Yûnaniyên kevn ser vê baweriyê bûn ku ew xudawend handerê (palderê) wan bûye di biyavên cur bi cur ên wekî edeb, huner û muzîkê.

Piştî ew destewaje (destepeyv) di sedsala 12-an de ji zimanê Yûnanî a kevn ve hatiye veguhastin bo nav zimanê Firansî a kevn ku ew jî destewajeya (Musike) e, ku bona karên hunerî bi kar hatiye. Her di zimanê Firansî de (Musique) jî bi kar hatiye, piştî heman destewaje hatiye bikaranîn. Piştî heman destewaje hatiye nava zimanê Latînî ku ew jî bi awayê (Musica) yan (Musicus) di nava zimanê Latînî de maye.

Serbarê hemû wan egeran ku dibêjin ew destepeyv, destpêkê ji Yûnaniya kevn ve hatiye û xistine rex vê muzîkê ku niha em basê dikin, boçûneke din heye ku ji ya serê cudatir e, ew jî ew e ku Dr. Îrec Gulsorxî di gotarekê de li jêr navnîşanê (*geşekirin û guherîna wateya peyva muzîkê*) îşare bi vê yekê dike; Ku navê muzîkê gellek berî Yûnaniyan bi Muzîkê hatiye bexşîn. Herwisa dibêje: peyv û zaraveya (Music)ê ji zimanê Farsî ve çûye nava zimanê Yûnanî, li ber vê yekê Yûnanî dibêjne muzîkê (Khavania), ku ew jî ji peyva (Khenia) a zimanê Fars ve hatiye wergirtin û dariştin, ku tê wateya têtîliya di navbera peyv û muzîkê. Di zimanê Farsî a kevn de û di merasimên ayînî û efsanewî ên Îrana kevn de, destewajeya (musiqaqia) hebûye. Ew jî bona lahîkirina ji firîşteyê mezin bi kar dihat, ew yek jî berî vê serdemê bûye ku Yûnaniyan peyva muzîkê ji bo jenîn û lêdana alavên muzîkê û strangotinê bi kar dianîn. Dr. Îrec dibêje: Destewajeya muzîkê ji zimanê Farsî ve çûye nava zimanê Yûnanî (Hejar Mukiryani, 1391: 12).

Di zimanê Erebi de peyva (El-musîqî) heye, her tiştekek yan her dengêk li cem Ereban wekî musîqa tê naskirin. Peyva (El-musîqî) di zimanê Erebi de heman ew peyv e ku di zimanên Firansî, Îngilîzî û zimanên din de heye, ew jî bi cudahiyeke kêma herfi.

Her derheq zaraveya muzîkê boçûnek heye ku li ser vê baweriyê ne ku peyva muzîkê ji peyva (Musa) ve hatiye wergirtin, wate îlham yan bexşîna îlhamê, û piştê peyva (qî) jê hatiye zêdekirin û di dawiyê de ew peyva niha dibêjê Muzîk (Musîqa).

Di zimanê Kurdî de zaraveya Muzîkê ya Musîqayê bi kar tê. Gellek caran di ferhenga Kurdî de muzîk bi awaz ya awazên xweş yan jî alavên destçêkirî tê binavkirin û di hindek lêkolînan de jî li cem musîqayê ya di cihê muzîkê de awaz hatiye bikaranîn. Hekî gellek caran ew têkeliye jî di navbera awaz û musîqayê de hatibe çêkirin, lê di warê watayê de, ew du zaraveya her yek wate û erk û rola taybet bi xwe hene, ya wan heye û ji hevdu cuda ne. Jiber ku di warê watayê de peyva (Awaz) di zimanê Erebi de (Lehn) û di Îngilîzî de jî (Melody) bi wan tê gotin. Li gor ku Zerqanî vedugehezîne Farabî lehna muzîkê beramberî beyta helbestê û nexme, yanî hemanên lehnê jî beramberî herfên helbestê dibîne (Zerqanî, 1345: 139).

Di zimanê Kurdî de jî awaz peywendiya denga di warê nazîkî û giraniyê de organîze dike. Li gora rêxistina peywendiya denga muzîkê ava dibe, wate her ji xwe re ava nabe. Digel avabûnê, livlivînek jî bo guhdar çê dike, wate muzîkdibe sedem bona vê ku hest û hişê mirov bilivlive, lewra jî gellek caran hatiye gotin ku muzîkxûreka ruhî a mirov e.

Derheq pênaseya muzîkê me destewajeya muzîkê wekî hunera muzîkê wergirtiye, ku bi zimanê saz û awaz hatiye gotin. Muzîkhuner e, zanist e, û ziman e, lewra dibjin ku ew huner e, jiber ku muzîkwekî beşên din ên hunerê hewcehî bi behreyeke xwezayî heye. Muzîkê zanist e, li ser bingeha zanista bîrkarî û fizîk û xwezayê hatiye danîn. muzîkê zimanekî cîhanî ye û alfabeya taybet bi xwe heye. (Selah Reûf, 1989: 6).

Zanist hebûna muzîkê ye ku weha kiriye ku zimanê axavtin û nivîsandina asayî ji darêtinên ciwan û muzîkî bê cudakirin, heman ew peyv û bilêvkirinên asayî ên mirov in ku dema di çarêveyeke ciwan a muzîkayê de li gora yasayeke taybet

dadirêjin, mînakek ciwantir û tameke xweştir bo derûn û hundirê mirov ava dike, (muzîka jî bo hemî curên mirovan dibe û hemî mirovan jî bo bikaranînê dikarin) (Umêd Mihyedîn Mihemed, 2010: 171), Têkiliya kûr ya di navbera muzîk û mirov hene (muzîkwek her hunerek peywendî yek bi hêz digel jiyana mirovan heye) (Fuaad Zekerya, 2006: 93), û herwisa dunyabîniya berfireh, weha kiriye ku zimanê muzîkê asteke cîhanî werbigre û li tev cîhanê yek xwendin û nivîsandin jê re hebe.

Muzîk bi wateya xwe ya giştî vê yekê digihîne mirov, ku (kome dengê e ku tundî û bilindî û nizmiyeke cuda hene, û ew bilindî û nizmî û tundî jî di awazê de hatine rêkxistin, awaz jî di şeweyên kêş û rêzbûn û cur û lêdana beşan de hatine organîzekirin) (Azad Ehmed Mehmûd, 2012: 88). Muzîk yek ji hunerên herî bilind û ciwan e ku hertim digel mirovanti û edebê hev girtiye, wate digel vegeşîna jiyane, muzîkê jî geşe kiriye û digel de jî pêş dikeve, (Muzîk hunereke pîr karigere li ser hest u nest e mirovan) (Twana 'Heme, 2014: 75), lewra di dema baskirin û vegêrana (baskirina wê de) wê de, bandorên kûr ên wê li ser hundirê mirov cihgir dibin.

Muzîk bi her tiştekê tê gotin ku dengeke muzîkê bibexşe mirov, ew deng her cure dengê be girîng ew e ku here nav çaroveyê muzîkê de. Bo mînak ew dengê ku ji gevriya mirov ve derdikeve, yan ew dengên ku ji alavên muzîkê derdikevin, yan ji teksteke helbestê yan edebî ve digihîjin me, her hemû jî muzîkê ne. Ku wisa bû peyva muzîkê biyaveke berfireh heye û em dikarin bêjin ku muzîka helbestê heman ew deng nînin ku em dibihîzin, belku rewşeke hêmin û aram a derûnî û asûdeyî digihîne dil û derûna xwîner yan bîser, gellek caran wekî xurek û avê ye bo têkirina dil û derûna mirov.

## **1.2. Helbest, Têgehû Pênase**

Destpêka derketina têgeha helbestê vedigere bo serdema Yanûna kevn. Peyva (Poeta) a zimanê Latîniya kevn û piştê peyva (Poetry) a heman zimanî bûye. Peyva (Poeta) ku wateya wê vehûnandiya helbestvan yan çêkiriya helbestvan bû, yan ew tiştê ku destçêkiriya helbestvan e, niha em dibêjin helbest. Herwisa di wê serdemê de peyva (Poetes) wateya helbestvan dida, û helbestvan jî wekî avaker yan dahêner (afirîner) dihat. Bi awayekî giştî em dikarin bêjin ku di sala 650-an a Mîladî de peyva (Poeta) a zimanê Latîni a kevn piştê bûye (Poetria) a heman zimanê Lataîni a kevn a

nawerast. Pştî vê yekê di sedsala 13-an a Mîladî ji zimanê Latînfî a Navîn ve çûye nav zimanê Firansî a kevn û li wir jî bi awayê(Poetrie) bi kar hatiye.

Di zimanê Erebfî dejî peyva(Helbestê) Şê`ir ji Şi`ûr ve hatiye wergirtin. Herweha tê wateya hest û ji aliyê kesekî ve hatiye nivîsandin ku dibêjnê şa`ir (Helbestvan).

Derheq zimanê Kurdî heman ew destewaje ye ku di Erebfî de heye û di zimanê Kurdî dejî bi kar tê. Herweha di zimanê Kurdî de xeynêhelbestê gellek caran peyvên din jî têne bikaranîn wekî:Helbest,Şê`ir, Hozan, Vehûnandin, Hone, Newşe...hwd. Li ser vê yekê Ferhad Şakilî dibêje: Ez bi xwe pirsra şê`irî pirsek e baş dibînm. Eger çî gelek nivîskarên kurd, bo nimune: Mamosta Goran di çend cihande pirsra "Helbest" bi karanîyejî, lê ez bi xwe pirsra şê`irî baştir dibînim. (Şakilî, 2011: 31). Herweha di gellek ciyên Kurdistanê gellek caran di hemberfî peyva şa`ir, helbestvan, yan hozanvan bi kar tê. Ew yek jî bi sedema cudahiya zimanê navçeyî û herweha bi sedema hebûna lehce û zaravayên zêde ên nav zimanê Kurdî ye.

Bi awayekî giştî destpeyva Helbestê zêdetir ji hozan û li hendek deveran şê`irê tê bikaranîn. Jiber ku bo kesekî Kurd ku ser bi zaravayê Soranî yan Kirmanc yan her şêwe zaravayeke din a Kurdî be, asayî ye ku peyva Helbest,Şê`ir, Hozan bi kar tîne û her hemû jî ji wateya wan tê digihîjin.

Helbest janreke sereke ya edebê ye, deng û awazeke taybetî heye, ew jî bi sedema "kêş" û "serwa" ve çê dibe. Bona pênasekirina Helbestê hewce ye ku têgihîştineke dirust û zelal ji bo Helbestê me hebe, jiber ku Helbest ji hundir ve hildikele û di nav rûberê xeyalê de ava dibe. Rûberê xeyalê jî berfireh û bêsinor e. Avabûn yan şêweya hilkelîna Helbestê bi vî rengî çê dibe, dema ku helbestvan hizir dike, piştî bi awayekî kûr diçe nav bîrkinên xwe de, û digihîje asta xeyalê (endîşê). Ji wir ve helbest ji rîya bilêvkirin û derbirîne afirandinên xwe dike. Wate Helbestê pêwendiyê rasterast bi bîrkin û hizrê ve heye. Di vir de bîrkinên Helbest wekî pirekê ne bo gişîtina bi rûbarê xeyal û hizrîne. (Lewra xeyal dibe ew cihê ku Helbest tê de ji dayîk dibe) (Mihemed Kedkeni, 1392: 145). Em dikarin bêjin ku xeyal nîştimana helbestê ye. Ku wisa bû Helbest di rûbereke ew qas berfirehde kar dike, û tu sinor û berbestek nikare pêşiyê bigrin, jiber ku xwediyê hêzekê ye ku



dibêjnê xeyal. Xeyal jî dergeha çûna wê ew qas berfireh e ku çê nabe tu sînorek û bazineyek li dewra wê bihê kişandin, yan jî di çarçoveyeke diyarîkirî de bê astengkirin, ku wisa bû, Helbest jî xwedî ûjêçêbûyê (zadeyê) vê rûberê bêsinor û berfireh e.

Helbest serbarê vê ku wekî pênaseya kilasîk a xwe, behreyeke "na berceste" ye, di demekê de ku li gora şiroveyên modern, pêk tê ji wê teknîka kar li ser kirî, û bikarhînayî ya zimanêke taybetî di nava zimanê giştî de.

Zimanê taybet yan em bêjin ku zimanê helbestvan ku hilkeliyê hundirê helbestvan e, xeynî awaz û muzîka ku ji riya helbestekê ve eşkere dike, tejiyê ye ji ders û şîret bo tewahiya mirovahiyê, jiber ku xwediyê helbestê ku helbestvanne, xeynî vê yekê ku dinivîse, gellek caran wekî filsof û mamosta û rênîşander li civakê nihêriye û ji riya helbestê ve xelk ber bi hişyarkirin û nîşandana rastiyên ve birine, çunkî (Şê'ir ji babetên duniyayê meselên hizrî cuda nabin, pirsyarên şê'irî.. pirsyarin ji hizirkirî û gumana şê'irêji şikandine wan bawerên hişk û bezandina wan yeqînane ewên şê'ir û hizir kirî şextebend diken) (Hoşeng Şêx Mihemed, 2002: 24).

### **1.3. Pêwendiya Di Navbera Muzîk û Helbestê Da**

Helbest û muzîk du hunrên nav edebiyatê de neû her duk pêkve digel serhildana mirovayetiye serî hildane, ew du huner ew qas tevlî yektir in ku dîroka serhildana her yek ji wan bi awayekî cuda zehmet e ku bê zelalkirin.

Jiber ku em bas ji her yek ji wan bikin, em nikarin yê din ji bîr bikin, wate muzîkê helbest du huner in ku her ji demên zû de tevlî yektir bûne, û em nikarin bi tu awayî muzîkê ji helbestê helbestê ji muzîkê veqetînin. Lê serbarê van pêwendiyên tund û qahîm ên di navbera wan de, boçûnên cuda hene derheq dîroka kevn ya her yek ji muzîkê helbestê. Derheq pêwendiya di navbera muzîkê helbestê her ji demên kevn ve heya niha jî gellek tişt di vê derheqê de hatine gotin, bo mînak Eflaton dibêje:

Muzîk kêşeyên me çareser dike, ruh ji riya muzîkê ve fêrî rîtm û harmonî û eşqa dadperweriyê dibe. Jiber ku ger kesek bi şêwazeke hevterîb û harmonîamêz hatibe perwerde kirin, êdî mehal estemkar be... Harmonî û

hevterîbî wekî du regezên muzîkê rêrewa xwe berew astên veşartî ên ruhê peyda dikin) (Şaho Se`îd, kovara Ayinde,2000: 59).

Muzîk di bngeh de pêwendiyeye ruhî digel mirov de heye, û di hundirê her kesî de ye, Lewra bona avedaniya ruhî a mirov û zindîkirin û mana vê hestê di derûna mirov de hawara xwe dibe ber wê xurekê yan wan peyv û risteyan ku muzîkê de ye ku ew jî helbest e, yan bixwe hewl dide guhdariya stranên bike, stran jî bixwe teji ye ji muzîkê û helbestê, lewra em dikarin bêjin ku li wir, wate di stranê de, muzîkê helbestê gellek bi başî hevdu girtine û tewaw têkilî yektir bûne. Derheq bi vê cudahiya ku di dîrok kevn a muzîk û helbestê bas jê tê kirin, bo mînak li cem Yonaniyên kevn.

Rîtma muzîkê girêdayî ye bi rîtma helbest û ziman, bi awayekî ku di biyaveke teorî de, tu cudahiyek tunebûye di navbera wan rîtman de. Kêşa Helbestê bingeha rîtma muzîkê bûye, lê paş vê serdemê muzîkê ji rîtma helbestê derketiye, rîtmeke hemû cur ji xwe re peyda kir (Enwer Qeredaxî, Govarî Karwan, 1984: 75)

Li herberî vê boçûna serê boçûneke din heye ku îşare bi vê dîke ku li gora dîroka kevn be muzîkê ji stranê hatiye wergirtin ku bi taybetî çend kesaneke karîne çend deng û awazên serçebe li ser rîtmeke cur bi cur li gevriya xwe ve derxin îca ji riya peyv ve van awazan bikin curek ji stranê, piştî vê ku alavên cur bi cur ên muzîkê hatina afirandin û çêkirin lewra bona vê bû ku alîkariya dengê mirovan bikin û bîzarê wan bikin. (Bakûrî, Govarî Raman, 1997: 104).

Her di nava muzîkahelbestê de dema ku li rîtma muzîk yan helbestê dinîhêrin yan dema ku li rîtma muzîkahelbestê dinêrin wê demê girîngiya rîtm û tevlibûna rîtmê ji me re eşkere dibe jiber ku ew jî di vê navberê de gellek girîngiya wê heye. Peyva rîtmê peyveke girîkî ya kevn ya Yunaniyan e û her di bingeh de ji Latîni ve hatiye wergirtin, (wateya rijîyan, û boşbûna rûbar û rabûna rûbar dide) (Ezîz Gerdî, 1999: 71).

Em dikarin bêjin ku rîtim regezeke girîng ya helbestê ye û di nava bingeha deqê de wekî asteke sereke li rex astên din de hatiye dîtin, rîtm xesleta hevpar ya di navbera hemû huneran e, ji hunerên muzîk, helbest, pexşana hunerî û semayê de bi

eşkere hest pê tê kirin, herweha em dikarin bêjin ku rîtim yek ji bingehên sereke ên helbestê û muzîkê, herwekî ku çawa muzîkbi bê rîtm naheve, wisa jî helbestdev ji rîtmê bernade. Eşkere ye ku rîtm di helbestê de girîngiyeke sereke heye, lê di muzîkê derîtim diyarîkirîtir û hûrtir bi kar tê, Ji aliyê gelek teorîsyenan ve hebûna pêwendiyekê di navbera helbestê û muzîkê de tê qebûlkirin. Li gor vê, di navbera elhan/usûlên muzîkê û weznên erûzê de hevterîbiyek heye û hin usûlên muzîkê bi hin weznên erûzê yê diyar tèn bestekirin (Kidkeni, 1392: 40-48).

Li gor feylesofên ku li ser mijarê hizrên xwe îfade kirine, hem elhanên muzîkê, hem jî weznên helbestê li ser bingeha tenasubê (ahengê) ava dibin. Ev tenasub jî bi herikbariya nîzamî û perîyodîk ya hereke û sukûnan di kelimê edebî û di nexmeya muzîkê de çê dibe û ya yekem kêşa helbestê, ya duyem jî nexmeya muzîkê derdixe holê (Zerqanî, 1345: 143).

Bi awayekî giştî piranî ser vê baweriyê ne ku muzîkbingeha helbestê ye, jiber ku ew rîtma di helbestê de heye ji muzîkê jê re maye. Hinek ji lêkoleran ser vê baweriyê ne ku rîtma helbestê û muzîkê vdigere ser bingehê (Ehmed Recayî, 1999: 63). Lê ji aliyê din ve kesaneke hene ku berevajiyê kesên yekem in, ewan jêve ne, ew rîtma ku di muzîkê de heye, ji helbestê ve bo wan maye, jiber ku mirov destpêkê deng derxistiye, û deng jî ziman jê çêbûye, û ziman jî helbest jê çêbûye û herweha muzîk û helbestser vê cure hunerê ne ku bi hunerên dengî tê naskirin.

Ew nivîskarên ku servê baweriyê ne ku muzîkê helbest vedigere bo heman serdema hvepar, wisa berhev didin ku muzîkdigel derketina edebiyatê, wekî helbest û sirûdên ayînî serî hildaye, ku ew cure ji edebiyat gellek girîngî pê hatiye dan, jiber ku ayînan palpiştî jê kirine û wisa hatiye nîşan dan ku karkirina li ser vê edebiyatê dibe sedema peristin û nêzîkbûna ji Xwedayan. Ew yek jî vê yekê zelal dike ku derketina helbestên ayînî û muzîkê ku bi awayê sirûdên ayînî li rex hev hatine xwedîn.

Bi awayekî giştî hekî em li xetên helbestê binêrin em dibînin ku hatine pîrr kiirn ji kêş û awaz, hemû pîtên dengdar û bêdeng bi awayê wekhev bi ser xetên helbestan de hatine parvekirin, wan parvekiirna weha li helbestê kirine ku muzîkekava bikin, dema ku guhdar yan xwîner dibihîze, hesteke cihê heyrîmanê jê re

çê dibe. Hin teorîsyenên Rojava rîtma helbestê dişibînin rîtma muzîkê û ji ber vê jî kêşê bi notayên muzîkê nîşan didin.

Eva ku dîroka edebiyatê bo me rohn kiriye, ku wek belgeyekê derdikevin ew nivîs in ku ji Yonana kevn ji me re bi cih mane ku îşarê bi vê dikin ku li cem gelek helbestvanan helbestû muzîk du tiştên ji hev cuda nekirî bûn, ji berku wê demê kêşnasî di nav muzîkê de reh û rîşe dakutabû, her derheq vê pêwendiya ku di navbera muzîkê helbestê de heye, ji bilî filsofên navdar ên Girîk, filsofên cîhana Îslamî hewl dane bo vedîtina pêwendiya di navbera muzîkê û helbestê de.

Her derhq têkiliya di navbera helbestû muzîkê ku pêştir jî me îşare pê kiriye ku pêwendî heya asta tewaw têkelbûnê çûye. Her di vê derheqê de Usman Ebdullah ji *Biyavê mosîqa di şê`irên Kurdî ên Safî de* ku wî jî pişt bi çend çavkaiyên din ve girê daye, hewl daye bi çend xaleka asta cewherî ya van pêwendiyên di navbera helbestû muzîkê de diyarî bike:

1-Pileyên muzîkê li heft pileyên sereke pêk tên ku pêk tên ji (Do, Rê, Mî, Fa, Sol, la, Sî), û di hember de pîtên bihîstî (bîstraw)ên helbestê di alfabeya hemû zimanan de hene, wate her wek ku çawa bi cihguherîna di pilebendiya notan de şêwaza awaz li muzîkê de bi heman şêweyî bi cihguherîna pîtên ziman de wateya peyvê û wateya giştî jî guherîn bi ser de tê.

2-Regezên serekî ên muzîkê pêk tên ji: Rîtm û awaz û harmonî û reng û deng, lê bingehên sereke ên rîtma helbestê yan muzîkahelbestê pêk tên ji: muzîka hundir û ya derve.

3-Çînên dengî ên muzîkê di navbera dengê girr û nazik de bi ser çend dengeka dabeş dibe, bi heman şêweyî di rîtma bihîstî (bîstraw) a helbestî di pîtên dengên gir û kip de, ,endîn dengên hemû cur ava dibin.

4-Rawestana kurt, dirêj, duabarebûn, awaza ji nişkêve... ji pîrensîpên sereke ên pêkhatiya teknîkî ya muzîkê ne, di hember de regeza dubarebûn derkewtineke grîng ya helbestê ne.

5-Hekî em li cewherê helbest û muzîkê binêrin, em dibînin ku helbest sê bingehên wê ên sereke hene, (Xeyal, Guncan, kêşa taybet) xeyal, bibandor e di

nav deqa helbest de. Piştire jî bandora wê li ser bîser çê dibe. Guncan û lihevkerin di navbera peyv û watayê de, bi awayekîku peyveke guncaw û baş hilibijêrin, bo watayekêku bi awayekî cudahiyê danên di navbera "lîrîk" û "diramîl"ên taybetmend ên temsîlkerinê (guzarişkirdin), herweha stûxwarbûna rêbaza helbestêbo kêşeke taybet. Her ku di muzîkê de em dibînin ku xeyal bibandore li darêtin û herweha lihevkerina peyjeya muzîkê û xwezaya deng digel watayê de. Herweha kêş û pêwendî bi rêbaz û cura awazê ve heye. Lwra di vir de em dibînin ku di bingehe de hevpar in.

6-Hunera rollîstinê (edakirinê) di helbest û muzîkê de wekî yek e, herwekî ku çawa vehûnandina helbestê di bingehe de tê avakirin li ser kertkirin û polênkirina xetên helbestê, ku wek bingeha rollîstina wê hatiye nasîn di polênbeniya hevokên muzîkê de, û pêkvezeliqandina beşên hevokê heya ku digihjin wêneyeke nimayîşkirinê li parçe muzîkê.

7-Dije pêwendiya di navbera deng "neşaz" di muzîkê de hilgirê bargeya delaleta xwe ye, hekî bi awayekî hunerî bixin ger, herwekî çawa ku diyardeyên wekî "Zihaf, Îyle,Peşewî di rîtmê de" delaleta xwe heye di siyaqa helbestê de.

8-Muzîk piştî xwe girê dide bi astên cuda ên strêse, wekî toxmeke pêkhînerê awaza giştî, rîtma helbestê jî piştî xwe girê dide bi heman tuxmî, ji riya zextkirina li ser çen yekîneyên Îqaf ve. (Usman Ebdullah,2011: 37).

Xeynî van xalan sere çendîn xalên din jî hene ku îşare bi vê dikin ku muzîk û helbestdu can in di yek cestayê de, du wata ne bo yek tiştî, yan jî du tiştin di derûna mirov de ku yek wateya wan heye, herweha her du jî sedemeke hestê bi kar tînin, ku ew jî "deng e", ku her du di aliyê bingehe de piştî xwe bi kêş ve girê didin. Ligel hemû ewên ku me bas kirin, lê qet û qet çê nabe ku du janrên edebî ji koma pêkhateyan bi tewahî nav hevde bihelin, lewra di encam de he ryek ji helbestû muzîk, serbarê vê ku hunera herî nêzîk in li hev lê hinek cudahiyên cewherî jî di navbera wan de heye, bo mînak helbestdî warê nawerok û wateyê ve hertim babetek heye ku li ser vê daxive, lê muzîkhertim digel xwe dipeyve, wate bixwe babeta xwe ye.

Herweha helbest hilkeliyê kêrahiya derûna mirov e, wêneyê hundirê mirovê helbeste ku derdikeve û dibe "deq". Lê muzîkli dervey hundirê mirov de tê avakirin, "lerelerek" e derekî a çêkirî ye ku çê dibe ku wekî zanistê bihê veguhastin, û bizarê wê bihê kirin. Ku wisa bû muzîkdibe milkê giştî. Li hember de helbestmilkê ew mirovê helbeste ku afirandiye, herweha derheq têgihîştineke giştî yan cîhanî diyar e ku muzîkzimanêke cîhanî ye, û bo têgehandina wê jî hewcehî bi wergêrek yan navendekê (nêwendekê) ve nîne, lê helbestku ji aliyê helbestvanekê ve tê nivîsandin, hewcehî bi zimanêke diyarîkirî heye bo nivîsandina helbestê û tenê ewên ku vî zimanî dizanin, ji vê helbestê tê digihîjin, lewra cuda ji muzîk, helbest hewcehiya wê bi werger heye bona vê ku bo zimanêke din wergerînin.

#### **1.4.Muzîka Helbestê Di Edebiyata Kurdî Da**

Helbest hilkeiyê hest û soza hundirê helbestvan e, tu helbestek bi bê hebûna muzîkê tama wê tama tune ye, hekî hemû regezên helbestêjî di nava helbestêde hebin, bi bê hebûna muzîkê dîsan ew helbest bitam nabe, jiber ku aliyê herî bihêz ê ciwanî û nazikiyê di helbestê de pêk tê ji muzîkê.

Helbest wekî behreyeke nazik ji helbestvanbi xwe ve çê dibe, û peyvan wekî destegulekê di hevokên muzîkdar de divêhûne. Îca herçend ku helbest afirandineke takekesî jî be, lê bîr û hizra wî kesî jî, dikeve jêr barê çendîn hokarên siyasî û rewşenbîrî û ayînî û civakî û aborî ku di nava civakê de cihgir bûye, û rûçikê rêrewa pêşkevîna civakê eyan û eşkere dikin. (Goran Feyzî, 2006: 89).

Muzîkahelbestêpêk tê ji wê muzîkê ku ji deqeke helbestêve hest pê tê kirin, ew muzîk jî ji çawaniya rêzkirina peyvên xetên helbestê çawaniya parvekirina wan bi ser beş û pîtan û herweha çawaniya dubarekirina wan ve çê dibe. Muzîkdi nava helbestêde hevsengiyê bo helbestêtîne, û ew regzên ku tu pêwendî û hevsengiyek di navbera wan de tune ye, bi riya muzîkê ve hevseng dibin. Her wekî ku me berê jî anî ziman ku helbest tenê bona tam jê wergirtinê nîne, di vir de em dibêjin ku muzîka helbestê jî têgehê nîne, ku tenê bona tam jê wergirtinê û ji bo "îstatîk"ê bihê kurtkirin, yan jî tenê di bin çend têgeh û zarava û pênaseyekê de bêne bendkirin, muzîka helbestê tewahiya têgehand bi xwe ve digre, û her yek ji wan jî ji cihê xwe ve bi pile û şewazekê muzîkê bo deqê ava dikin.

Her çawa be muzîk û helbest hertim pêkve ne, û bi dirêjahiya dîrokê ji hevdu neveqetiyane, yan bi watayeke din nekarîne ji yektir veqetînin, û dev ji yekir berdîn, ayîn jî gellek caran hevkar bûne bo manewa wan du hevalan bi hevdû, jiber ku piraniya sirûdên ayînî li bone û merasimên ayînî de bi awayê muzîkyî û têkelkirin bi awaz û hesteke ciwan , ku ew deb û resm di piraniya ayînên nav neteweyên wekî: (Yonaniyan, Aryaiyan, Babilîyan, Hurî, Mîtanî, Gotî, Mad, Aşûrî û Îbraniyan û ...hwd) dihatin xûyakirin.

Derheq neteweya Kurd û di nava hozên destpêkî de em dibînin ku di dema şer û munasibetên cuda de, û di dema çandiniyê û di dema cejnên de, û ji dema zarok razandinê heya ku digihîje bi axê spartina miriyan (mirî veşartinê) her hemiyan muzîkek a taybet û cuda hebûne. Xelîl Dihokî di *Qefteka gulên ji baxçê peîv û dahênana kurdan* dibêje:

Dîsan zimanê kurdî di vê meydanê de gelek dewlemende, mezn u payedare, her nivîş ji Helbest, Lawik, `Heyran, Serpêhatîçîrok û Liztkan dagirtiye. Kurd ji biçukatîve zarokên xwe hîn van tiştan diken, hej di dema pêcekê de, daiyk ji wan re dilorin û dîrok, sitran û çîroka dibejin. Ji lewra zarokên kurd xudriste hozan û hişyarin (2010: 33).

(Tablo û peyker û cihên kevnar ên Ekadî û Babilî û Aşûrî pîr in ji şahidiya vê yekê ku mirov her ji Kurdistana serdema şaristaniyetên kevn ve muzîk nas kiriye, û alavên destpêkî ên deng û awazan çê kiriye) (Ferhad Pîrbal, 2010: 8).

Gellek ji dîroknivîsên muzîkê, hindek ji alavên muzîkê vedigerînin bo navçeyên Kurdî, ku heya îrorojê jî ev alavên muzîkê ji aliyê rûniştîyên wan herêman ve bi kar tên bo mînak: Ud, û Saz her ji serdema Xûriyan zêdetir ji 2 hezar sal berî Mesîh li Kurdistana di navbera bajarê (Wan)ê heya ku digihîje navçeyên Kurdistana Îraqê îrorojê bi kar hatiye, (di mûzumetên Îraqê, Britanya û dewletên Yekgirtî derxistine) (Wrya mihemed, 2016:217). Dîroknivîs bo selimandina vê rastiyê (alaveke Êdê di navçeya (Nûzî) dîtine ku li nêzîk bajarê Kerkûkê ku paytexta Xûriyan bûye wê demê)(Ferhad Pîrbal, 2010:8). Herweha di nava tablo û kevala duyem ya Şerefnameyê a sala (1600)î a mîladî em Êd û Sazê dibînkû ew yek jî nîşana vê ye

ku Êd û Saz ew alavên muzîkê ne, ku her di demên kevn de di nava Kurd de bi kar hatine.

Li gora dîroka çavkaniyan be, li Ewropayê serdemekê muzîkahelbestê bi awayekî giştî û bi pileya yekem li dîn û hesta Xwedêperistî dihat hesabandin. Ayîna Mesîhiyet çavkaniya yekem û darêjerê yasa û rê û şûnên taybet bi muzîkêbû. Li Kurdistanê jî bi heman şeweya wê demê ya Ewropayê bûye. Kilîsayê girîngî daye vegeşîna muzîkahelbestê. Jiber ku hewl daye ku bi riya muzîkê ve dîn bi başî belav bike, û mezinahî û heybeta dîn û Mesîh û dêrê (kilîsayê) nîşanî xelkê bide. (Lewra kilîsa dihat û gellek xelkê desteng li ser riyên hildigirt û fêrî muzîkêdikir in bona vê ku bibin stranbêj û muzîkjenê kilîsayê) (Ferhad Pîrbal, 2010:11). Her di wê serdemê de wisa lê hat ku di nava kilîsayên Ewropa de teoriya muzîkê wekî zanist û felsefeyê bihê xwendin.

Di warê dîrokî de li ser asta cîhanê kevntrîn vehûnandin ku awazeke muzîkî têde be, vehûnandina "Rîk Vêda"ye, ku dîroka wê vedigere bo hezar heya 5 hezar sal berî Mîladê. Piştî "Gatakan" a Zerdestî ye ku ew jî di warê dîrokî de rabihuriyeke gellek kevn heye. Ew vehûnandin (honrawe) wekî yekem vehûnaninên bi cihmayî ên Kurd tene hesabandin. Li vehûnandinên din ên kevn em dikarin "pehlewantiya Gilgamêş" nav bibin, ku ew vehûnandin yekem hunraweya pehlewaniyê ye di cîhanê de. Herweha di dîroka cîhanê de jî çendîn pehlewantî ên mezin hene, ku ew jî wekî:

-Li Yonan, Îlyade û Odîseyê Homîros.

-Li Hindustanê, Mehabarata û Rmanaya.

-Li Romayê, Ênîd, berhema Fêrcîl.

-Li Îranê, Şahnameya Firdûsî.

-Li cem Kurdan, Mem û Zîn a Ehmedê Xanî.

Her wekî ku pêştir me îşare pê kir, ku di Kurdistanê de jî hewşeweya Ewropayê, ayînan bandora xwe li ser muzîkahelbestêhebûye, bi awayekî destpêkî muzîk ji riya kitêba pîroz ya Avestayê ve bûye ku li gora serdem, heman serdema împatoriya mîdya ye (550-625) a berî mîladê ye. Ji Hemedanê ve heta bigihîje



aliyê din ê Diyarbekir, li wê herêmê de belav dibe, lewra em dikarin bêjin ku ayîna Zerdeştî wekî yek ji yekemîn çavkaniyên muzîk û stranê tê hesibandin di Kurdistanê de.

Di ayîna Zerdeştî de Gata bi awaz ve hatine xwendin, li çend cihên Avestayê de jî îşare bi vê hatiyê kirin ku (hewce ye ku Gata bi awaz ve bêne xwendin) (Mhemed Mhemedî, 1394: 101), Zerdeşt pêxember bi xwe jî bo bangewazkirin bo bawerîanîna bi (Ahûra Mezda), ew (17 sirûdên şê`irî ên birgeyî bi alavê mosîqayê gotiye) (Mihemed Heme Baqî, 2001: 101).

Herweha di ayîna Ehlê Heq (Yarsan) sirûdên wan ku komek helbest in ku kêş û muzîka taybetî heye, bi alavê tembûrê digotin. Alava tembûrê jî li cem wan beha û pîroziya xwe heye. Dibû hemû ew cihên ku tembora tê de dihate parastin, cihên pak û pîroz bana, piştî bikaranîna tembûrê diviya ku bi hurmet ve hilgirtiban, û li ciheke parastî û pîroz danîbana.

Ku wisa bû, Yesna û Gata ku bi muzîk yan wekî sirûdên ayînî dihatin gotin, yadgarên wan nimêj û bangên mesebî ên serdema Zerdeşt in, ku piraniya dîroknivîsan ser vê bawriyê ne ku Siyah Çemane û Horeya Hewraman û herweha sirûda Yarsanên Ehlê Heq bi heman şêwe muzîk, û dîsan Êzîdî jî di dema du`a û zikirkirinê de, û di dema strangotinê de hemû jî ji muzîkaayîna Zerdeşt ve hatine.

Di ayîna Zerdeştî radeya pîroziya muzîkê di asta herî bilind de ye. Wisa nîşan dane ku biheşt (Bîr û hizra biheştê) li ayîna Zerdeştî pîvana Îslamê ye, ku biheşt pêk tê ji Hurî, Şerab û Hingwînê.. Lê biheşt di ayîna Zerdeştî de heman muzîke, wate di biheştê Zerdeştî de helbest û stran û muzîkheye, ne hûrî û şerab. Eva ew qasê pîroziyê dibexşe muzîkê, û pêwendiya di navbera ayîn û muzîkêpîroztir kiriye.

Dewleta Mîdyâ di sala 550 a berî Mîladê bi dawî hatiye. (Exmenî) têne cihê wan, lê her li jêr kultura mîdyayî û ayînê Zerdeştî de dimînin. Ayîna fermî (Exmenî) her ayîna Zerdeştî bûn,ew tîn, ku ne tenê her hunera helbestê, û muzîkê, belku hunera nivîsandin û nîgarkêşiyê jî pîroz dikin. Daryoş Paşa di xeta (72-76) a stûna çarem de, li ser kopîtka çiyayê Bîston, piştî serkevtina bi ser Mîdiyan de dinivîse: (Ey rehguzer, hekî tu wan nivîs û neqş û nîgarên vir tîk nedî û xera nekî, û biparêzî,

Ahûramezda wê piştî te be, û wê xêr û bereketê bixe nav jiyana te de)(Ferhad Pîrbal, 2010: 13).

Piştî vê ku ayîna Zerdeşt ji nav diçe, helbest û muzîk û gellek ji sirûdên wan di nava Kurdan de her bi pîrozî dimînin, û ji nav naçin, bi taybetî li cem Êzîdî û Ehlê Heq. Pîrozbûna muzîkê li cem Ehlê Heq Ku duktur Mihemed Mukrî baseke girîng bi Firansî li ser nivîsandiye, herweha pîrozbûna muzîkê li cem Êzîdiyan (Ku Mr. Rîc û gellek dîroknivîsên din li ser axivîne, hemû evane belgeya vê yekê ne, ku muzîka helbestê û stranê di zimanê kevn ê welatê Kurdan de ji hesta Xwedaperistiyê ve çavkanî digre. Her ji vir ve jî ji dayîk bûye, RojhilatnasêRûs Pîter Lîrx di lêkolînên xwe de, derheq Kurd, îşarebi stranên Kurdî ên Êzîdiyan dike, ku li ser gora Şêx Adê dixwînin (Ferhad Pîrbal,2010: 8).

Dawî ayîn jî ku bo mirovahiyê hatiye ayîna Îslamê ye, lê nekariye ku helbest û muzîk ji nav bibe, jiber ku ayîna Îslamê her bi xwe jî mifah ji wan wergirtiye, û nekariye qedexe bike. Lewra rê pê hatiy danê, bi mercekê ku di xizmeta Xwedêperetin û tehlîl û zikrên ayînî de be. Bi vî rengî û piştî hatina ayîna Îslamê, helbest û muzîk her li ser şêwe û naveroka ayîna Îslamê diçe pêş. Lê li ser çend bingheên mezhebî ên cuda û taze bedewam dibe.

Di heyama xelafeta Emewîyan li Kurdistanê, helbest û muzîkjenê Kurd Îbrahîm Kurê Mahanî kurê Behmen (El-musulî), yek ji navdartirîn stranbêjên serdema Emewî, di salên (706-143) a Zayînî, xizmeteke mezin a helbest û stran û muzîka Îslamî û Erebi kiriye, piştî wê jî xelafta Ebasiyan dest pê dike.

Xelîl kurê Ehmedê El-ferahidî (718-791) kêşên Erûz ên Erebi ji bomuzîk û helbestê ava dike, li ber vê ku ayîna Îslamê di navçeyê de gellek bandor hebûye li ser tewahiya helbestvanan û bi taybetî jî helbestên Kurd, herweha ew kêşeya helbestê Ferahidî bandora xwe hebûye li ser helbestên Kurd, heya ku wisa lê hat, ku helbestên Kurd jî hêdî-hêdî dev ji kêşa xomalî berdîn û rû li kêşa erûz ya Erebi bikin.

Di dîroka Kurdan de mîrên Kurd çendîn mîrnişîn li jêr sîber û deshilata dedewlet û împatoriya navçê ava kirine. Bi taybetî di serdema împatoriya Osmanî de, Mîrên Kurd bixwe hukm bi ser xwe de kirine. Wate heya asteke zêde ew serbixwe bûn. Di vê heyamê de mîrnişînên Kurd helbest û muzîk û stran

vegeşandine, û li koşk û munasibetan de hertim helbest û stran gotine. Ferhad Pîrbal di pirtûka *Dîroka Stran û muzîka Kurdî* de nivîsandiye:

Hemdaniyan (929-1004)-an di Cizîrê, Şedadî (951-1174)-an di Genceya Rojavaya Kurdistanê, Merwendî (dewleta Doskî:990- 1906) li Diyarbekirê, di wê sedemê de Merwendî di Diyarbekirê û navçeya Cizîrê de girîngî danestran û muzîka Kurdî. Her di vê serdemê de strana "Zemblîfiroş" hatiye gotin...(Ferhad Pîrbal,2010:103).

Herweha derheq bi çavkaniya herî kevn ya gerîdeyên Musilman ku bas ji helbest û muzîk û stranên Kurdî kiribe, weha dibêje: Ew pêk tên ji wan girûpên nivîskaran ku wekî (birayên Sefa) hatine naskirin û di bajarê (Besre) a başûra Îraqê di sedsala 10-an wate di salên (900) a Mîladî, 51 namîlke (kitêbok) derheq zanistan nivîsandine, û di yek ji namîlkeyên xwe de bas ji muzîka Kurdî kiriye (Ferhad Pîrbal,2010: 102-103).

Baba Tahirê Hemedanî (935-1010) di warê dîrokî de yek ji wan helbestvanên herî kevn ên nav edeba Kurdî ye, ku xeynî vê yekê ku Baba Tahir bixwe di koka xwe de Lor e, lê di helbestên xwe de çendîn peyvên zar û zimanên din têkel bi helbestên xwe kirine, herweha bi awayekî gelemperî ayîn bandora xwe li ser Baba Tahir hebûye, û ew yek di helbestên wê de xûya ne (Elaedîn Secadî,1395:182).

Piştî vê ku di navçeyên cuda cuda ên Kurdistanê de her yek ji helbestvanên navdar ên Kurd ên wekî (Elî Hererî, Feqê Teyran, Ehmedê Xanî, Bateyî) derdikevin, ew helbest bi sedema bandora ayînê bi ser xwe mînaka helbestên wan zêdetir xezel, û helbestêtesewof û Xwedêperestî ne, (Elî Herîrî) helbestvaneke diyar bûye û di serdema helbestvanêmezîna Êranî (Firdosî) jîyan kiriye, jiber ku wî di helbestên xwe de basê kiriye, bi taybetî di şahnameyê de. Herweha derheq dîroka jiyana yek ji helbestvanên din ên Kurd ku (Feqiyê Teyran) e. Li gora çavkaniyan be, em dikarin bi tewahî nêzî vê boçûnê bibin ku Feqiyê Teyran di dawiya sedsala 16-an û destpêka sedsala17-an jîyan kiriye, (di sala 1307-1308 mîladî ta sala 1375-1376 mîladî) (Kameran Mukrî, 1984: 12), Herweha helbestên wî bi naznavê "Mîm û Hê"yan "Mîm û H'ê" hatine nivîsandin. Helbest di çîroka *Şêxê Sen`an* de xwe wekî şarezayêke rêbazên felsefeya Îslamê nîşan dide, lê şêweya pîraniyavan vehûnandinan (hunraweyan) sade

ye, û di vê rêzê de cih digre, ku wekî hunraweya (pexşana) millî tê naskirin (Komek nivîskaran, 2000: 83). Îca Melayê Cizîrîwekî helbestvanekî xwedîşiyên rêzbendiya pêşê ya helbestvanên Kurd girtiye xwe, û helbestên xwe tevli awaz û muzîkekciwan bûn, û mînaka herî bilind ya helbestên xezel û Xwedêperistiyê ne, Melayê Cizîrî di bin bandora helbestvanên mezin ê Fars Hafîzê Şîrazî de bûye.

Ji layê rewşenbîrîve çî berhem ji bilî Dîwana wî ya helbestannegehîstine destê me, lê ev Dîwan ji ber bilindya astê xwe pileya wî di hemî waran de ber çav diket (Mihemed doskî, 2007: 14). Herweha (Ehmedê Xanî) wekî helbestvanekî neteweyî, karî ku riheke nû bixe ber nawerokahelbestên Kurdî û destana (Mem û Zîn) vehûne, û tevli raz û sirra di dilê xwe de bike. (Hîmdad Husên, 2007: 261).

Wan helbestên ku bi diyalîktîka (Goran) helbest nivîsandine ew in: (Mela Perîşan, Xanay Qubadî, Mewlewî, Bîsaranî û Seyidî Hewramî), ku ji helbestvanên herî diyar û xûya ên vê navçeyê ne, herweha helbestvanên Kirmancî ên Xwarê (Sorani) ew jî di sedema mîrnişînê Baban û li ser destê Nalî, Salim, Kurdî helbest gehandine asteke bilind, û tama muzîka bi helbestê re, di helbestên wan de gellek berçav in. Piştî wan jî çendîn helbestêderketine, û di vê qadê de ji riya helbestên xwe ve hest û soz û muzîkekciwan pêşkêşî guhdar û xwînerên helbestên wê serdmê kirine.

Çavkaniyên dîrokê bas ji vê dikin ku sofîyên Kurd li bajarê Hewlêrê di dema zîkr û du`ayên xwe de muzîk bi kar anîne, piştî jî di bîranîna rojbûna pêxemberê Îslamê de, di serdema Sultan Muzefer Gugberî de mewlûd encam dane, di van boneyên ayînî de, her tim ji riya helbestê muzîkê ve têkel bi zîkra Xwedêperistiyê bûne. Xeynî vê yekê jî hindêk alavên muzîkê jî, her ji zû ve, li bajarê Hewlêrê bi kar hatine, ew jî wekî Bilûr, û şîmşal, û def... hwd.

Ibnê Xelekan di pirtûka *Wefat Eleyamdi* sala 1282-an a Mîladî de, û herweha El-Henbelî, di *Şejerat El-zeheb* di sala 1417-an a Mîladî de, bas ji bikaranîna alavê tebl û duholê dikin. Heweha gellek ji nivîskarên navxwe û cîhanî bas ji vê kirine, ku terîqeta Qadirî di dema du`a û tehlîl û civatên Xwedêperistiyê de, ji riya bikaranîna helbest û sirûdên ayînî û çend alavên muzîkê têkel bi civatên derwêşane û Xwedêperistiyê bûne.

Ya ku hêjayî basê ye, û dibe em hemû jê fam bikin û jê tê bigihîjin ew e ku, helbest û muzîka Kurdî xizmeteke zor bi sirûd û korrên (civatên) Xwedêperistiyê di ayîna Îslamê de kiriye, bandorên muzîka Kurdî rengvedaneke bihêz heye li ser beşeke herî zêde ji dîroka muzîka cîhana Îslamî. Rola soltan Muzefer û mewlûdnameyên wê demê bandoreke bihêz hene li ser vegeşîna û meqaman, bi taybetî di ayîna Îslamê û cîhana Erebî de, ku di dawiyê de bû sedemek bo jidayîkbûna dehan cur ji maqamên Erebî di piraniya welatên Erebî de, ku îrorojê wekî (maqamên Bexdadî) têne naskirin (Ferhad Pîrbal, 2010: 103).

Di cîhanê de bi awayekî giştî û di nava helbest û muzîka Kurdî de jî, li rex wan rêwên muzîk ên ayînî şêwe û cura helbest û muzîka yek din ji dayîk dibe, ku çavkaniya wê ji hesta romansî û hezkirina ji jinê û bizvandina sozê û xerîzeyan ve hilkele (çavkanî girtiye). Piştî jî ber bi qonaxa neteweperwerbûnê ve çûye, ku vê qonaxê wek qonaxa (Lipirkî) bi nav dikin. Derheq Kurd, mîr û deshilatdarên wê demê gellek ji vê muzîkê hez kirine, û hertim bona dem derbazkirinê û ahengên şevê korrên (merasimên, kombûnên) helbest û muzîkê semayê li dar xistine.

Vegeşîna muzîkê Lipirk (Romansî û nîştimanî) di nava Kurdan de vedigere ser pêşkevtin û vegeşîna di jiyana û nawayê, di dawiya sedsala 19-an de û guherînkariyên mezin ên siyasî û civakî û edebî di nav Kurdan de rû didin. Ji wan derketina afretan mil bi milê mîran, û vegeşîna û tîkelbûna Kurd bi cîhana derve re, bi taybetî Ewropayê, ku ew jî zêdetir ji riya Stenbolê ve bû, herweha pêşkevtina jiyana xwendin û perwerdehiyê, vegeşîna hesta nîştimanî û neteweyî, hemû evane, dibin sedema vê ku hesta soz û hezkirin û neteweyî di nava helbest û muzîka Kurdî de reng vede.

Ew qonaxa ku dibêjnê (Lipirk) zûtir di nava neteweyên wekî Ereb, û Turk û Farsan serî hildaye, heta di nav neteweya Kurd bi taybetî di nava çîna deshilatdar û dewlemend de, jiber ku ew rêbaz zêdetir û zûtir di nava çîna deshilatdar a xweşguzeran a xelîfe û soltanan de geş dibe. Li ber vê ku meclisa vê bezmê, bona bezm û rezma xweşguzeranan hêsantir e.

Ji serdema rênsansê zêdetir, hewldan bo bicîhanîkirina muzîkê geşe kiriye, eva bû ku dirama hate nav muzîkê, wate gihîştê ve ku opêra (ew diramaya ku digel

muzîkê bi hev re xwe didin naskirin) di dawîya sedsala 16-an û destpêka sedsala 17-an bo yekem car li bajarê Filorensa û Vînz li Îtaliyayê serî rakir, û opêra li dervey kilîsayê bo hemû xelkê hate nîşandan, wate ji merasimên kilîsayê dihate cudakirin.

Di Kurdistanê de ew qonaxa muzîkê gellek kevn nine, gellek caran bi sedema hesta welatperwerî û neteweyî her tim nû dibe. Xeynî vê yekê jî janreke muzîkê serî hildaye, û ew jî sirûd e, sirûdên nîştimanî û neteweyî, ew janra muzîkê di van dawiyane de serî hildaye, û em dikarin bêjin ku eva janra nû ya sedsala 20-î ye.

Serhildana sirûdê di nava edeba Kurdî de, piştî vê hatiye ku komek nivîskar û helbestên Kurd li Stenbolê jiyan dikirin, dîtine ku çawa nivîskar û helbestên Tirk û Ermen û Ereb ji riya hunera xwe ve xizmeta nîştiman û neteweya xwe dikin, helbestvan û nivîskarên navdar ên Kurd jî, ên ku li Stenbolê jiyan dikirin, gellek bûn, lê yê ku karîn sirûda muzîkê bînin nava kultura Kurd de, Zîwerê helbestvan û Pîremêrd bûn. Piştî vê jî di salên sîyan de, Dildarê helbest hat, û sirûda (Ey Reqîb) nivîsand.

Me di vê lêkolînê de bi awayekî kurt ronahî xistiye ser muzîkê di edebiyata Kurdî de, lê bi awayekî giştî muzîkahelbesta Kurdî bo me eşkere dibe ku muzîkahelbesta Kurdî ji ayîn û siyaset û atîfeyê rizgar dibe.

Hewce ye ku bo îrrojê a muzîkahelbestê ji kîjan çavkaniyê ve avê vexot? Jiberkumuzîkahelbestê yêKurd ji qonaxên berteng û daxistî rizgar bûye, û cîhanbîniya niha bohelbest ûmuzîkya Kurdî gellek sanahîtir e ji serdemên berê. Ew jî bi sedema vê pêşkevî ve dibe, ku Kurd di warê rewşenbîrî û teknolojiya ve bo dunyadîtina derve heye.

### **1.5. Muzîka Helbestê Di Boçûnê Cuda Da**

Fîlsof û rexnegir û hunermend û lêkoler herdi demên kevn de û bi awayekî bas ji muzîkahelbestê kirine, herweha gellek caran muzîkê helbest her yek ji wan bi awayekî cuda bas jê hatiye kirin, destpêkê retkirin û heramkirin û piştî jî astengî û bend, û girîngnehesêbandina muzîkheya ku digihîje vê roja ku cihê baldanê ye ji aliyê piraniya mirovantiyê ve. Hemû ew qonaxên hişk û sext û dijwar ên ku muzîkahelbestê tê re derbaz bûye, bi sedema boçûn û bîrkirneweyên cuda ve bûye.

Di nava Yûnaniyan de berî Erestû, û Soqrat û Eflaton jî qise li ser helbestê kirine, lê ji hemiyana zêdetir ku bi awayekî berfireh bas ji helbestê kiribe, Erestû bû, Erestû di "hunera şê`irî" de ku namîlkeyeke (kitêbokek) serbixwe û rexnegirane ye li ser helbestê nivîsandiye.

Eflaton dibêje: (Em nikarin xelkê qedexê bikin li ser hezkirina hevdu, gelo tu nabînî ku hemû xelk xwedîpîşe (xwedîkar) in, hekî ew tirsîyan, û ji canê xwe bêzar bûn, eva di ber xwe de awazan vedibêjin (Mihemed Hilal, 1973: 461), di vir de ew yek ji me re eşkere dibe, ku Eflaton wisa li muzîkênihêrî ye, ku çavkaniyeke resen tune, belku di demekê de derdikeve, ku derûna mirov di dema bêhêzî û bêtaqetiyê de, wate muzîkdi demên herî bêhêz de ji dayîk dibe.

Eflaton di *Gotûbêjên Eyon* ku di sala 390-an a berî Mîldê hatiye nivîsandin, pirtûk wekî gotûbêja di navbera du kesan e, lê wisa dixûye ku her Eflaton be ku di cihê du kesan bi vî rengî gotûbêj kiribe, ew di vê berhema xwe de ku li gora teoriyazanîn, helbestvanan dixê xaneyê sêyem, wate piştî cîhana aydiya (îde) û cîhana hestan, di cîhana sîber de cihê wan vedike, wate dixwaze ku bêje ku helbestvanew kes in ku bizarê bizarkirinê dikin, lê di warê îlhama helbestê de, behre û îlhama helbestan weha rîz dike: (Xwedayê helbestê, piştî helbestvan, piştî helbestxwanû piştî helbestdost)(Hîmdad Husên, 2007: 27).

Erestû ku xwendekarê Eflaton bûye, pirtûkek heye bi navê *Huneraşê`irê* bo wê demê û bo niha helbestvan û nivîskar û rexnegir gellek mifah jê wergirtine, Erestû pirtûka xwe bi ser çend beşan de parve dike û hewl dide ku erk û wezîfeya her yek ji cureyên hebestê diyarî bike, destpêkê li derheq girîngiya helbestê daxive, û li ser vê baweriyê ye ku yek ji encamên helbestê pêwendiya mirov bi "îqa`î" û awazê ve heye. (Hîmdad Husên, 2007: 21).

Erestû bîrdoza edebîya xwe li ser bîngeha "bizarkirina rûdawan" darêtiye, wî sê cur kêş destnîşan kirine, û helbest bi ser her yek "Hemase, Tirajidî, Komêdî" de dabeş kiriye, di nav wan de jî heryek ji (Stran, Muzîka, Helbestên Dildarî, Govend û Sema) hene.

Bi têgihîştina Erestû ew hemû bi awayekî giştî di cewherê hunerê de hevpar in, û cudahî di navbera wan de tune, hemû jî di naweroka xwe de vedigerin ser

bizarkirinê (lasayîkirin, tqlîd). Li cem Erestû xeynê vê yekê ku bizarkirin beşeke xwezayî ye di kûrahiya mirov de, bi heman şeweyî rîtm û muzîkjî beşek in ji mirov. Her ew du sedem jî bingeha afirandina helbestê ne. (Erestû: hunera şê`irê, w: Ezîz Gerdî, 2011: 21).

Derheq bi helbestê û karê helbestvan, Erestû li ser vê baweriyê bû ku karê helbestvanê nîne ku rûdaw bi hûrî bêne gêran, (bêne baskirin)belku dibe ku bi awayekî bê baskirin ku renge rû dabe. Cudahiya helbestvan û dîroknivîs di vir de nîne ku ew bi pexşanê (hunraweyê, vehûnandinê) bûyerekê bas bike û yên din jî bi pexşan... Herweha Erestû jêve ye ku helbestji dîrokê felsefîtir û giştîbînîre, lê dîrok hûrbîn e û bas ji hûrdekariyan dike (Erestû, hunera şê`irê,w: Ezîz Gerdî: 2011).

Yek ji karên herî girîng ku li ser muzîka helbestê hatiye kirin, ji aliyê nivîskarekî navdar ê cîhanî bi navê "Holander" di sala 1956-an de di nivîsekê de, di kovara (Îstatîka û rexneya hunerî) belav kiriye, nivîskar hewl daye, ku têgihîştineke tewaw bo muzîkahelbestê ava bike, nivîskar ji dîroka têkelbûna muzîkaû helbestê ve dest pê dike, heya ku digihîje têkelbûna muzîkaû helbest di edebiyata Îngilîzî de. Herweha "Pol Firîdrîç" ew jî di sala 1998-an di pirtûka *Musîka Di Helbesta Rûsî de* hewl daye ku sîstema têgihîştinê vegeşîne, û bala xwe dide van cure cudahiyan, ku ji sedsala 18-an heyana werasta sedsala 20-î kar kirine ser helbesta Rûsî, karên her yek ji wan du nivîskaran "Holander" û "Pol Firîdrîç" ku derheq muzîkahelbestêve encam dane, wekî yek ji karên herî girîng ên serdema xwe û berî xwe jî têne hesibandin. (Jones,Amy. 2013, P. 11).

Helbestvan ê navdar a Erebi "Naiz Elmelaîke" dibêje: helbestvan herçend ku wêne û sozê kom bike, nabe sedema çêbûna helbest bi tenê, lê hekî helbest(şê`iriyet) hate peyrewkirin, eva helbestê diafirîne. Ku wisa bû helbestvan her çend ku xwedîşiyantir be, li darêtina muzîkahelbestê de, eva zêdetir serkevtîtir dibe, di gehandina peyama xwe de.

Xelîl kurê Ehmedê Ferahîdî, zanista Erûza Erebi afirandiye, zanayeke xwedîşiyani bû, di helbestû muzîkêde desteke bilind hebû, çendîn pirtûk li pey xwe bi cih hêlabûn, ji wan *ElnexmûEl-lehûn*. Xelîl xwediyê yekem fereng e di zimanê Erebi de bi navê "El`eyn". Lewra di edebiyata Erebi de her lêkolînek ku li ser



muzîkahelbestêhebe, hertim hewl dane, ku li dewra kêş û serwayê de bigerin. Tu dibêjî ka li cem wan muzîkêtenê kêş û serwa be, ku ew yek jî vedigere ser vê ku pêştir girîngiyêke zêde dabin kêşa erûz ya ferahidî, lê ew jî piştî nasyarbûna digel edebiyata rojava û digel derbazbûna demê, wan jî di lêkolînên xwe ên nû de, xeynî aliyê derekî hewl dane, bas ji naweroka helbestê, û herweha deng û peyvên nav helbestê bikin û wê şirove bikin.

Derheq edebiyata Kurdî destpêkê ew jî hevşeweyê edebiyata Erebi zêdetir girîngî daye aliyê derve, lê digel derbazbûna demê, edebiyata Kurdî jî hewl daye ku bi awayekî hûr li naweroka helbestê binihêre, û şirovekirin ji bo tewahiya wan dengên muzîkên helbestê bike, ku pêştir nehatibûn kirin, ew yek jî piştî vê hat ku rexneya edeba Kurdî pêşkevîneke berfireh bi xwe ve dît, û lêkolînên li ser muzîkêasteke berfirehtir bi xwe ve girt.

muzîkjenê navdar ê Kurd Ebdulqadir Meraxeyî (1354-1434) pirtûkek li jêr navnîşanê *Cami`i El-elhan* nivîsandiye, ku tê de bas ji helbestû awaz û stranên Kurdî dike. Herweha *Meshefa Reş Êzîdî* û piştî wê jî, çend helbestvanû zanayên Kurd derdikevin, ku ew jî her yek ji wan ji aliyê xwe ve bi awayekî ji awayan dikevn xaneya girîngîdana bi muzîk, helbest, û edebiyata Kurdî. Di navçeya Hewraman, Mela Perîşan, di navçeya Mardîn Celaledîn, Elî Herîrî li Kurdistanê Tirkiyê, biawayekî giştî hemû ew sedem in bo nasandina gellek curên awaz û muzîklî helbesta Kurdî. Di Şerefnameya mîrê Şerefxanê Bitlîs, di nava tabloya duyem ya Şerefnameyê mînakên saz û ûdê em dibînin.

Ehmedê Xanî (1650-1707) zana û filsof û helbestvanê navdar ê Kurd di *Mem û Zîn*, û di helbestên xwe de navê wê alava muzîkê tîne ku di Kurdistanê de bi kar hatine, ew jî wekî sentûr, ceres, mîzrab, zorna, nefir, saz û...hwd, herweha Ehmedê Xanî navê hemû wan meqamat û awazan jî aniye, ku di Kurdistanê de carr bûn (gellek belav bibûn): Uşaş Hezîn, aheng, newbeharî, nexme û...hwd. Hêjayî basê ye, ku destana Mem û Zîn a Ehmedê Xanî yek ji şakarên edebî yên ciwan e, ku wê demê tişteke taze û nû bû, û herweha rengvedana berfirehbûna zêde bo muzîkê helbesta Kurdî ava kir.

Lê hekî gellek bi hûrî em li muzîkahelbestê binêrin, helbestvan ji hemû kesî û feylesofî zêdetir ji muzîkêtêgihîştiye, jiber ku helbestvan ji filsof zêdetir û baştir ji wateya helbestê têdigihîje, helbestvan e ku helbesta xwe têkel (tevlî) bi muzîkê kiriye, ew bi bawereke zor bihêz li wê dinihêre ku muzîkbi rastî wateya xwe heye, jiber ku ew helbestvan e ku ji riya muzîka peyvê ve, wateya wê çê kiriye, herweha ji riya wan awazan ve wateyek ciwan û cuda daye peyvê û hevokên wê.

### **1.6.Muzîka Helbestê Di Rêbazên Edebî Da**

Rêbaz: Çend bingeheke serekî ye ku dibe hokar û sedema bona vê ku çend nivîskarek li ser van bingehan kok û yekdeng bin û hemû jî bi hev re li hev dikin, û komele yan girûpekê pêk tînin, û piştî jî dibe bi rêbaz. Çavkaniya rêbazê destpêkê bîroke û karê kesekê ye. Piştî dersxwanên wê, berdewamiyê didin wê û berfirehtir dikin, her rêbazek li cihek yan welatekî de serî hildide, û piştî bo welatên din tê veguhastin.

Dîroka derketina rêbazên edebî ew qas kevn nine, û vedigere bo piştî derketina "rênsans" li Ewropayê, ku milletên Ewropayê ketine çêkirina welatên neteweyî û piştî jî edeba neteweyî li Firansayê û Îngelteryayê û Îspaniyayê çêkirin, û piştî rêbaz jî yek li pey yekê hatin qadê. Destpêka van rêbazan jî bi rêbaza kilasîzmê dest pê dike. Her rêbazek wate her dîtinek yan her felsefeyek gellek caran janreke edebî ya taybet bi rêbazê hildibjêre, bo mînak di riyalîzmê de, çîrok û li kilasîzmê tirajidiya, û digel vê jî di rêbazeke wekî kilasîzmê, tirajidiya destpêkê bi helbestê bûye, lê evro tirajidiya pexşanamêze (bi pexşanê re ye).

Herwekî ku çawa me li aliyê serê de bas kir ku rêbaz çawa serî hilda, û di vir de jî em dixwazin ku her rêbazek digel rêbaza berî xwe, û rêbaza piştî xwe, bi awayê kar û karvedan bêne pêş. Wate pêwendiya her yek ji wan bi yê din re gellekî hûr û zanistî ye, bo mînak romansîzm karvedanek bû di hemberî kilasîzmê, ku hest û girjbûna tak (helçûna tak, tûrebûn û kerbvebûna tak) ber çav nedigirt, yan jî sîmbolîzm karvedanek bû di hemberî riyalîzmê û natoralîzmê de, ku wan tenê rû li heqîqet û tiştên pêş çav bû.

### 1.6.1. Muzîka Helbestê Di Rêbaza Kilasîzmê Da

Kilasîzim bi wan berhemên edebî tê gotin, ku destpêka serhildana wê vedigere bo sedsala hevdeyem, serdema (Loyîsê çarde) û ew rêbaz destpêkê ji Firansayê ve dest pê dike, û piştî di welatên cîhanê de belav dibe. Kilasîzm ji wan berhemên bi cih mayî ên edebiyata Yonan û Romanan ve dest pê kiriye. Kesên navdar ên vê tevgera Firansayê pêk dihatin ji: (Dobêllê, Mintînî, Biwalo, Ronsar, Kornê, Rasîn, Molyêr, Voltêr, Labrowêr).

Di sedsala şazdeyem de, komeleyên edebî rû li berhemên kevn ên xwe kirin, bi taybetî komeleya edebî ya "Pilyad" ku endamên wê komeleyê bi zimanê neteweyî ê xwe, wate zimanê Firansî nivîsandin, mamostayê vê komê kesek bû bi navê "Dora". Ew mamosta pispor bû di warê edebiyata Yonanî û Roman, Herweha bi xwe jî bi zimanê latînî helbest nivîsandiye.

Van girûpên edebî hêdî-hêdî di lêkolînên xwe de şarezaiyeke tewaw di biyavên edebî ên wê demê de peyda kirine, herweha zanyariyên baş di janrên edebî ên kevn wekî tirajîdiya û dastan û komîdyayê de, ku ji berhemên diyar ên Yonan û Romaniyan bûn, peyda kir, lêkolînên zanistî ku di warê wan janran de hatine kirin, û bi awayekî bingehîn jî cewherê helbestê wergirtin, heya serdemekê me dît ku çendîn pirtûk derheq helbest û muzîk û hunera helbest a serî hildan, "Ronsar" û "Dobîllî" ku ji komeleya Pilyad bûn, û dersxwanê (şagirdê) "Dora" bûn, di sedsala şazdeyem de yasayên weha tomar kirin, ku piştî di sedsala 17-an de bûne beşek ji bingeha kilasîzmê.

Çavkaniyên kilasîzma Ewropî ên herî girîng pirtûka (Hunera şê'irî) ya her yek ji Eresto, Horas, û Biwalo bû. Digel nûserên Girîk û Romanî berî Zayînê ku (Eskîlos, Orîpîd, û Homîros) bûn ku bibûne çavkaniyeke girîng ya bizarkirinê (lasayîkirinê, teqlîdkirinê)(Îdrîs Ebdullah,2006:24).

Li gora bingeh û yasayên kilasîzmê, peyrewîkirin ji pêşînan û xwezaya mirovahiyê baş e. Ew li ser vê baweriyê bû ku dibe di edebiyatê de û bi taybetî di hunerên helbest û muzîkê de wesf û medh(pesn) bo kesên baş bê kirin, li ser kesên gemar û çepel jî, digotin ku nabe sifetên xirab ku ajel û mirov tê de hevpar in, bêne baskirin. Lewra hertim rû li sifetên baş kirine. Herweha di şahnameyê de jî gellek bi

zelalî diyar e ku li wir jî hevşeweyê kilasîzma Ewropî, baskirin ji exlaqê baş û piyawetî, cesûrî, qehremantî, û welatperwrî gellek zor e.

Di şahnameyê de yên baş, reçelek (kok û binetar, esl û neseb) û huner û eql in, herweha di şewaza Xurasanî de jî, destpêkê hiş û eql buhayek bilind heye, û piştî jî mijar û bas li ser bingeha qebûlkirina deb û nerîta giştî ye. Hinek ji lêkolera jêve ne ku li kilasîzma eqilgerayiyê (hişmendxwaziyê) li jêr bandora "Dîkart" de ye, ne "Eresto", lê dîsan jî li kilasîzmê de eqlê berê bi baştir zanîne, di eqilgeriya dîkart de. (Sîros Şemsiya, 2010: 111).

Di kilasîzmê de her tim hewl dane, ku edeb kilasîzmê xwe ji tiştên zêde û bê bingeh û bê wata biparêzin, herweha pêdagirî kirine li ser van helbestan, ku dibû helbestvan tiştên zêde û bê mifah nenûse, û dibe ku edebiyat xeynî şîretê û tiştên baş, xwe nexer nava karê tu aliyê xirabkar û kirêt. "Voltêr" dibêje: Nabe tu tişteke bê mifah herji xwe re bê gotin. Kilasîzm pêk dihat ji zelalî, lewra her berhemek pêk hatiba ji zelalî (rohn, şefaf) eva ji aliyê Ewropîyan ve diçû nava rûkarê kilasîzmê de. Rexnegirê Firansî "Biwalo" îşare bi vê yekê kiriye ku her nivîskareke rêbaza kilasîzmê li berhema wê nezelaliyek têde hebe, eva li ber kêma eqliya nivîskar e, jiber ku nekariye deshilat bi ser berhema xwe de hebe. (Sîros Şemsiya, 2010: 112).

Lewra di vê serdemê de edîban xeynî vê yekê ku bîzarê lasayî (teqlîd) karên baş ên Yonan û Romaniyan dikirin, dibû helbestvan tenê wan tiştan di helbestên xwe de binûse, ku dibe sedema xweşî û qazancbexşî bo xelkê, herweha helbestvanan bi muzîka dilxweşker di helbestên xwe de bala xelkê radikêşan, herçend di naweroka helbestên xwe de tejjî bûn ji şîret û tiştên baş, hekî ew şîretên di nava helbestê de, helbestvan bi kinçeke ciwan danepoşîbana, renga wê demê xelk hez li guhgirtina wan nebûya. Lewra em dikarin bêjin ku zimanê helbestê di kilasîzmê de pîr e ji muzîka helbestê (Umed Mi'hyedin Mihemed, 2010: 33).

Derheq bi Kurd herçend ku li çav kilasîzma Ewropî ku di demên cuda de serî hildaye, lê di warê peyrewî ji rêbazê em dikarin bêjin ku hevşewe ne, Kurd jî heman zarava ji bo van rêbazên edebî bi kar aniye. Em dikarin bêjin ku muzîka helbestê kilasîk a Kurdî gellek rengê muzîka helbestê a kilasîk a Fars û muzîka helbestê a Kilasîk a Erebi dide, û helbestvanên Erebi di vê serdemê de peyrewî ji yasaya

"tefîle" kirine, wate zêdetir eva ku hatiye peyrewkirin, bikaranîna "kêş"ê bûye, herwha Farsanbi heman şêweya Ereban, ew yek peyrew kirine, piştî vê jî Kurdan sûd û fayideji vê yekê wergirtine, û heman ew kêş û awaz bo muzîka Kurdî bi kar anîne, piştî wê Kurdan jî mifah jê wergirtine, û heman ew kêş û awaz ji bo muzîka helbestê Kurdî bi kar anîne ku, her wekî ku berê me îşare pê kiribû ku dem û serdema hatina kilasîzma Kurdî li çav Ewropayê cudahî hebû, jibercku dûriya edîb û helbestvanên Kurd li rewşenbîriya Ewropayî û hilkevta coxrafiyayî ya Kurdistanê û welatên cîran, sedema vê yekê ne, ku ew rêbaz direngtir gihîştîye Kurdistanê, ew rêbaz ji wê serdemê ve gihîştîye edeba Kurdî, ku wê demê ayîna Îslamê di navçeyê de dihate peyrewkirin, û ayîna Îslamê jî bi zimanê Erebi bû, lewra zimanê Erebi jî bandora xwe li ser tewahiya zimanên neteweyî ên vê navçeyê hebûye, di nava Erebi de peyrewî ji kêşa Erûz hatiye kirin, helbestvanên Kurd jî fayide ji vê kêşê wergirtine, û helbestên xwe bi vê kêşê vehûnandine, ku em dikarin bêjin ku di edebiyata kilasîk a Kurdî de jî, kilasîzm hemû wan deqên edebî bi xwe ve digre ku peyrewî ji kêşa erûz kirine.

Yekem helbestvanê Kurd ku peyrewî ji vê rêbazê kiriye "Baba Tahirê Hemedanî" bûye, ku di sedsala 11-an a Mîladnî de jiyan kiriye, û muzîka helbestêli helbestên Baba Tahirê Hemedanî yan em bêjin li çarîne û du beytên Baba Tahir, zêdetir li ser kêşa "Hezecî şeşî mehzûf" hatine nivîsandin (mefa`îlun, mefa`îlun, fe`ulun) eva di demekê de ku em wekî kêşa erûz a Erebi lê binihêrin, lê hekî em vegerin ser kêşa xomalî (sîlab), em dibînin ku nîwa xetên dêrî ên du beytên Baba Tahir, "Yazdey Hîcayn" bi kertên kurt û dirêj ve, herweha qafiye wek di çwarîneyan de bi vî awayî dawî pê hat, yekem, duyem, çarem wek hevdu ne, û ya sêyem cuda ye (A.A.B.A), hinek caran bi kêmi rêk dikeve ku her çar nîve xet wek yek bi dawî hatibin. Wate weha (A.A.A.A).

Baba Tahir di destpêka jiyana xwe de, dilê wî girêdayî eşqa keçên ciwan û dîmenê heyvrûyên Hemedan û Loristanê bûye. Di nava wan de kesek bi navê "Fatîme" bi du çavên mest û du biriyên hîlalî bandor li ser Baba Tahir çê kir, û di çend xetên helbestan de ji boy wê heyran û sergerdan bûye.. Baba Tahir heyamekê bi vî awayî helbest nivîsandiye û piştî rû li wê qadê dike ku eşqa Xwedê tê de hatiye veşartin, di vê deştê de bi soza eşqa yezdan digere, û li hemû kuncêke erd û esmanan

de xeynî Xweda çavên wî kesî nabînin, îca dibe şîretkareke dilsoj û filsofeke rastîn. (Elaedîn Secadî, 1395: 184).

Her derheq helbesta kilasîk a Kurdî di warê dîrokî de sirûdên "serencam" û helbestên mela Perîşan û edeba Yarsan di qonaxa yekem ya helbesta kilasîzma Kurdî mînakê diyar û berçav in. Herweha jî helbestên diyar û xûya ên Kurd û bi taybetî li şêwezarê kirmancî, em dikarin îşarê bi helbestvanên wek (Feqiyê Teyran, û Elî Herîrî) bikin, û herweha piştî mînakên mezin ên wekî (Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî) bi bizarkirina (teqlîdkirina) jî reng û rû û naweroka neteweyên Rojhilata Musilman edebiyata Kurd dewlemend kirin.

Helbesta kilasîkî zîmaneke taybetî û diyar heye, bo avakirina muzîkê, ew jî bi riya wê "erûz"ê ve ku li helbesta kilasîk de tê peyrewkirin, lewra gellek caran ku tu guh didî helbesteke kilasîk, digel helbestê hest bi muzîkeke xweş û diyarîkirî dikî, wate hekî pêştir te guhdariya çend helbestên kilasîk ên zîmanê Kurdî kiribe, dema ku helbesteke Erebi jî guhdarî dikî, bi sanahî tu dizanî ew helbest, helbesteke kilasîk e. Jiber ku ew herduk jî li ser heman peyrewên kilasîk in.

Bi awayekî giştî helbestên kilasîk ên Kurdî jî aliyê helbestvanên Kurd ve girîngiyeke zaf pê hatiye dan, û helbestvanên Kurd di dema nivîsandina helbestên xwe de gellek xwe mandî kirine, hewl dane ku ciwantirîn peyvan hilbijêrin bona vê ku bikarin peyva herî ciwanhilbijêrin ku bikarin muzîkekherî ciwan di helbestên xwe depêşkêş bikin, helbesta kilasîk a Kurdî dema kesekî asayî dixwîne, tameke taybetî lê dibîne, lê hekî kesekî şareza bo xelkê bixwîne, wê demê tameke zêdetir heye, jiber ku li her xet û peyvekê de rawestiyan, û bilindî û nizmî heye, her ew rawestiyan û bilindî û nizmî ku awaz û muzîkê taybetî bo helbesta kilasîkî ava kiriye, lewra jî tameke xweş pê dibexşe.

Xeynî wan helbestvanên mezin ku pêştir me îşar pê kirin, çend helbestvanên Kurd ên ser bi rêbaza kilasîzmê ne, helbestên pirr jî muzîk ûciwan jî vehûnandine, ew jî (Nalî, Salim, Mehîwî, Kurdî, Şêx Riza, Siyapoş, Herîq...hwd) ne. Yek jî wan helbestvanên Kurd "Kanî" yê helbestvan e. Ku ew jî helbestvanên helbestên kilasîk e û tewahiya helbestên awaz û muzîka ciwan tede jêhatîbûna vî helbestvanê mezin di warê huner û şêwe û ciwaniya helbestvanên wê de reng vedaye, eva jêr yek jî

mînakên helbestên "Kanî" ye. Di vir de helbestvan şanaziyê dike bi helbest û nefsiyeta xwe, û wisa nîşan dide ku ew jî xwedî şîyan û behreya xwe ye. Ew dibêje:

*Ser firo nakem bo `alem çûnke `alî hîmnetim  
Naçiwênim bo hemu دنیا le destim rexbetim  
Nabime sayil le `halem sayile `halem bexwa  
`Îzetî nefsm heye nalême `hatem qebîletim  
Min ke razî bûm be kem nabim le şahenşahî kem  
Ger nekem şekwaiy `halim kê dezanî ziletim  
Sîm û zer ger çim nebê emma dilm mustexnye  
Şahîde asarekem me `hlûm eka mahîyetim  
Nakes û naehl û naqîs her nezanin çatire  
Kamil û Dana le guftarim dezanin qîmetim  
Zahîrim her merdî meîdanîm wekû şerî dilêr  
Gwêt le beytim bê deka îspatî nutq û qwetim  
`Îarîfî `esrim, edîbim, `hur û serbest û fefîm  
Bê mu`hab şa `îrim meşhûre Kanî şuhretim* (Kanî: 27)

### **1.6.2. Muzîka Helbestê Di Rêbaza Romansîzmê Da**

Tevgera romansîzmê rêbazeka edebî ye, li Ewropa dest pê kiriye, û dîroka wê jî vedigere bo sedsala 18-an û destpêka sedsala 19-an, lê di destpêka sedsala 18-an de çê dibû ku hest û kerbvebûna mirov li hember xwezayê de hebe. Di dehka 1760-î de helbestên "Osiyan" helbestvanê Skatlendî, "Cîms" û pirtûka (Bîrkinên di dema şevê de) a "Yong" û çend berhemên din hatibûn çapkirin, ku ew hemû bûne sedema belavbûna romansîzmê di Ewropa de, û taybetmendiya wan cure nivîskar û helbestvanan pêk dihat ji rûkirin li mijarên wekî Merg û Goristan. Bûyera herî romansîzm pêk dihat ji carrbûna romanê, û şanonameyên Şikspîr ku ser ji nû zindî bûn. (Dr. Sîros w: Hîmdad û Senger, 2018: 96).

Romansîzm pêngavek bû bona nêzîkbûna ji hundirê helbestvan, û helbest di serdema kilasîzmê de heya radeyekê hatibû astengkirin, ku nedikarî hemû ew tiştên ku di hundirê wê de ne çê bike, û bi awayê helbest bîne ziman. Bi awayekî giştî romansîzm pêk tê ji (rêbazeka edebî, ku giranî û girîngiyê dide derûna mirov, nest û

hest, soz û hizir, raman û pirs, guman, helwest, xwest û daxwaz, hêvî û armanç, îradegerî, derbazbûn ji eqil, û lojîka rût (petî) (Heval Ebubekr, 2010: 3)

Sedema hatina bo nav qadê ya vê rêbazê û bidawîanîna rêbaza kilasîzmê vedigere ser vê ku rêbaza kilasîzmê rêbaza qata derebeg û xanedan û çîna dewlemend bûye. Lê romansîzm rêbaza çîna navgîn bû, kesên wekî "Kant" û "Şilayermaxer" di qonaxa rêbaza Romansîzmê de bûn, herlewra di vê qonaxê de têgeheke wekî nîştîman û nasyonalîzm û millet, hatin qadê. Feylesofê Almanî "Kant" li ser vê baweriyê ye ku kesê azad dikare afirandinê bike, û qalib û astengî pêşiya afirandinê digrin, bi boçûna "Kant" huner hekî sînor û qalib û merc hebû, va nabe huner, belku dibe pîşe û sen`et, û di vê derheqê de dibêje: (Huner bi vê yekê ji sen`et tê cudakirin ku azad e, lê pîşe hunera destçêkirî ye) (Mihemed Ebdulkerîm, 2012: 23).

Bi awayekî giştî romansîzm bawerîya wê ew bû ku helbestvan her çawa ku nabe şert û mercan bo helbestê danêt, dibe bi xwe jî, di hundirê xwe de azad be, ji vê kanalê ve êdî alavên zimanê helbestê sivik bûn, û êdî ber bi sadeyî û heya astekê jî çend watayiyê pêngav hilgirt, û ew azadiya helbestê ya serdema riyalîzmê de jî wekî xwe ma, û di hindêk xalan de xwe nîaşn da:

1-Nemana qalibê helbestê.

2-"Kêş" a helbestê guherîn bi ser de hat û ber bi nemanê ve çû.

3-"Serwa" jî bi heman awayî guhertin bi ser de hat.

4-"Şêwaz" guhertin bi ser de hat, û berew sadeyiyê ve çû. (Mihemed Ebdulkerîm, 2012: 23).

Yek ji hokarên din serhildana şoreşa Firansayê, xanedan û kesên mezin hatin jinavbirin, û bot hatin şikandin, û di cihê wan, kesekî wekî "Napoleon" anîne ser kar, û her ji şoreşa pîşesaziya Îngelteryayê civaka çandiniyê guhertin bi ser de hat, û rû li pîşesaziyê kirin. Bajarên biçûk girîngî bi wan hate dayîn, û bûne bajarên mezin û pîşesaziyê tê de geşe kir. Avakirina akadîmyaya zanistî û vegeşiyana rojnamevanî û vegeşiyana lêkolînan, hemû jî sedem bûn ku romansîzm bê qadê.



Romansîzman herçend ku çîrok jî dinivîsandin, lê rola wan hebû di hunerên helbest û muzîkê de, û di dawiyê de jî karê helbestvanîyê her dikirin. Helbestvanên vê rêbazê têhnî û hogirê xwezayê bûn, û li cem wan xweza gellek bi pîrozî lê dihate nihêrîn, wan jêve bû ku xweza destê mirov negihîştîyê, û ciwaniya wê nehatiye têkdan, herweha romansî bona gihîştina bi Xweda, li xwezayê dinihêrîn, wate xweza ji dîtingeha romansiyan pileya herî bilind wergirtibû. Herweha di vê rêbazê de deshilat tê jibîrkirin, û girîngiyê dide hest û soz, û di cihê mêjî, dil dikin kangeha îlham û cihê hest û wijdan.

Romansîzmê bawerî heye bi azadiya derbirîne (bilêvkirinê) ya hest û sozê, û helbestvanên romansîzm di vê serdemê de azadane bas ji hundirê xwe dikirin, xem û xefet bo derbazbûyî dixwarin, ku di derbazbûyî de nekarîne bigihîjin hêviyên xwe, û niha jî şiyana wan ya pêgihîştinê tuneye, wate tûşî kêmiya şiyane û hêviyên zêde bibûn, ew yek jî bû sedema vê ku hertim gazindeyê li bextê xwe bikin.

Di edebiyata Kurdî de, ew rêbaze di dawiya sedsala nozdeyan û destpêka sedsala bîstem serî hildaye, lê di nav bîr û hesta piraniya herî zor ya helbestvanên kilasîk ên Kurd de hest pê hatiye kirin, herweha piştî wan guherînen siyasî ku bi ser Rojhilata Navîn û dewleta Osmanî de hatin û geşbûna agirê şerê yekem ê cîhanî hemû bûne sedema guherînkariyan di navçeyê de.

Edebiyatê jî wekî rengvedaneke rastîn a civakê guherînkariyeke nû bi xwe ve dît, derheq bi edebiyata Kurdî ku zêdetir rengvedana wê ji rîya Tirkiyê ve bo dihate veguhastin, jiber ku di wêserdemê de hejmarek ji nivîskar û wergerê nû li Tirkiyê dest dane vejandina edebê, û çendîn pirtûk û belavokên Ewropî li Tirkiyê bi zimanê Tirkî hatin çapkirin, û piştî hinek rêkxirawên din hatin avakirin. Sansor li ser biyavên edebî nema, û nûbûn di edebiyata Kurdî de dest pê kir (Hindek nivîskarên xwedî şiyan derketin wekî: Tofîq Fikret, Namiq Kemal, Celal Sahîr, Ebdulheq Hamid, Umer Seyfedîn, Mihemed Akif Arso... (Hîmdad Husên, 2014: 116).

Di edebiyata Kurdî de gellek in ji wanhelbestvanên ku rê ji bo romansîzmê xweş kirin, Hacî Qadirê Koyî yek bû ji wanhelbestvanên mezin ên serdema kilasîka Kurdî, piştî vê ku diçe Stenbolê û li wir digel rewşenbîrê wê demê ê Usmaniyan û Ewropayê bi awayekî giştî nasyar dibe. Herweha Pîremêrd, Zîwer, Qazî Zade, û

Mistefa Şewqî (Piştire Goran bû yek ji helbestvanên herî xûya ê vê rêbazê) (Hîmdad Husên,2014: 116). Herweha piraniya herî zêde ya wan helbestvanên Kurd ku pêştir li Stenbol û herêmên din de jiyan kirine, zûtir ber bi guherînkariyan ve çûn, bi taybetî romansîzm.

Kanî Doxremçî helbestvanê kilasîk ê bajarê Hewlêrê, bi sedema şarezaiya baş ya malbata xwe di zimanê Tirkî û herweha bandora van helbestvanên berî xwe, her zû ber bi romansiyetê ve çûye, Kanî hinek ji helbestên wê bi zimaneke sade û zimanê xelkê tevli muzîkê nivîsandine, lewra jî hertim xelkê sade ê navçeyê gellek bi sanahî ji helbestên wê tê gihîştine, dîsan Kanî bas ji kûrahiya xwe dike, û hemû ew hest û soza ku heye di çend xetên helbestên pirr ji muzîkê de derdike û dibêje:

*Emro çî 'aceb hatî lepêşm guzerit kird  
Canim le beden cane beyek xemze dertkird  
Meylit le şer û ezyete mumkîn bu lerengt  
Bê çare dilim hatî bexem pir xeterit kird  
Ger meqsedî to lem guzere lutfû kerrmbu  
Em camey sûrey 'xezebe bo leberit  
Bem clweyî celadî wekû xeraman  
Zanîn ke lebo qetilme wextê nezerit kird  
Bo xwênî serim herdû birot hate îşaret  
Xwên rêjî gelê başe ezanî hunerit kird?!  
Tirsim heye mucrîm bî be xwênim le qiyamet  
Pêtxoşnebû em qewle le bo bê kederit kird  
Pê m sukiye şahim weku em xelke bizanê  
Bo kuştinî (Kanî) keto 'ezmî seferit kird*

(Kanî: 45)

### **1.6.3.Muzîka Helbestê Di Rêbaza Riyalîzmê Da**

Hinek ji nivîskar û helbestvan û rexnegirên romansîzmê di Sedsala 19-an de, bûne sedema serhildana rêbaza riyalîzmê, ku ew jî piştî wê tê, ku romansîzm di warê helbest û edebiyatê bi awayekî giştî digihîje lûtkeyê (kopikê).

Piştire rû li lêjiyê (ber bi xwar) dike,ew yek jî bi sedema vê yekê bû ku riyalîstên pêşîn digel helbestê, navbera wan baş nebû, wan jêve bûn ku ew rastiya ku

di romansîzmê de dixin rû, rûkeş û zûbihur e (zû derbaz dibe). Herweha bi baweriya riyalîzman ew qonaxa waqî`iyetê pêk tê ji baskirina çînên herî bibandor ên civakê wate borjewaziyên, ew yek jî ji riya çîrokê ve tê nîşandan, jiber ku di vê serdemê de vegeşîna borjwaziyê dest pê kiribû, piştî gihîştê astekê ku bi tewahî cihê çînên xandanangirt.

Riyalîzman gellek caran di vê derheqê de romansîzm rexne dikirin ku romansîzman jiyana xwe bi vî rengî nîşan dane ku bixwe jê hez kirine, wate cuda ji "waqî`î", pirr karesat û ciwantir jî kirine, lê riyalîzman hewl dane ku jiyana wekî ya ku heye nîşan bidin, wate li gor rastiya heyî (waqî`ê) lê nihêrîne.

Rêberên riyalîzmê: Li gora piraniya lêkolînan "Şanfilorî" wek rêberê vê rêbazê tê danîn, ku di sala 1843-an a Mîladî de, yekemîn nivîsînên xwe raxistine ber çavan, ku karvedaneke zêde li pey xwe hebûye, lê wekî rêbaz li ser destên van nivîskar û rexnegirên jê hatine avakirin:

-Fîransa; Balzak, Standal, Filobêr.

-Îngeltera; Can Oston, Çarliz Dîkînz, Corc Îlyot, Hênri Cênz, Li Îngeltera hinek helbestên felsefî, û pirr ji fikrî (Birawnînk)jî wekî riyalîzmê danîne.

-Amerîka; Çak Lenden, Walt Wîtman, Mark Tiwayn. (Sîros, 2018: 123-133).

Bi awayekî giştî di serdema riyalîzmê de nivîskar û rexnegirên serdem, zêdetir giringî dane çîrok û romanê heya helbestê, lewra di vê serdemê de helbest û muzîkahelbestê li çav serdema romansîzmê zêdetir rû li lawaziyê kiriye. Lê dîsan hekî em li riyalîzmê binêrin, hemû rêbaz ne wekhev in, bo mînak zimanê helbestê kumuzîkjî beşek e ji wê, di riyalîzma sîhrî de hatiye vegeşandin.

Riyalîzm bi lênihêrîneke giştî li jiyana mirov dinihêre, her du aliyên xwexweyî (xudî) û babetî (gotarî, mijarî) li ber çav digre, bi baş û xirab ve. Riyalîzman "çendbabetî" berçav girtine, jiber ku xwastine ku li ser hemû tex û çînên civakê şarezayîya wan hebe. Di riyalîzmê de dibû hemû çavkanî ji rastiye ve hatiban wergirtin. Di biyavê rûçikê (ruxsarê, reng û rûyê) ziman, hewl dane zimanê rewan bi kar bînin, bona vê ku bi awayekî zelal û eşkere bas li waqî`î (rastiya heyî) bikin.

Riyalîzma sîhrî jî çavkaniyên wê ji rastiye û waqî`ê hatibûn wergirtin, lê nivîskar bi awayekî dahênerane (afîrînerane) efsane û xewn û xeyal tevî deqê dikir û di kinçeke waqî`î de pêşkêş dikir. Nivîskarên riyalîzmasîhrî di deqên xwe de girîngî dane bi deng û peyvên nazik û zimanê teji ji muzîk e.

Bi awayekî giştî di riyalîzma sîhrî de zêdetir girîngî bi deq hatiye dan, di deqa helbestê de jî zêdetir girîngî bi muzîkanav helbestê hatiye dan, ew deqa muzîkê çîrok û pexşan jî bi xwe girt, di riyalîzmê de zêdetir ji helbestê girîngî bi çîrok û pexşanê hatiye dan, eva bû ku wisa lê hat ku di asta zimanê pexşanê bilindtir bibe.

Di edebiyata Kurdî de û bi taybetî di helbesta helbestvanên kilasîzmê de û heya digihîje helbestvanên hevçerx jî, deq û helbest hewşeweyê riyalîzmê gellek zêde ne, jiber ku gelê Kurd bi helbestvan û nivîskar û rewşenbîran ve jî bi dîrokê di bin azar û îşkenceyê de bûn, lewra nivîskar, rexnegir û helbestvanan jî hertim hewl dane waqî`ibînanê binûsin, û tewahiya waqî`ia jiyana xwe û gelê xwe bînin ziman, her vê yekê jî weha li edebiyata Kurdî kiriye ku edebeke riyalîzm ne wek rêbaz belku xweriskane hebûye. Derheq helbestvanên Kurdî rêberên vê rêbazê Dr. Îzedîn Mistefa Resûl dibêje:

Pîremêrd, Ehmed Muxtar caf, Zîwer, Muftî û bêkes nûnerên diyar û xûya ên vê rêbazê ne, û gellek ji nivîskarên Gelawêj û Kameran û Elaedîn Secadî berew pêşberê vê rêbazê ne... Selam û Cigerxwîn helqeya bi hevgehandina armanca helbesta riyalîzma rexnegerane û riyalîzma sosyalîst in (Îzedîn Mistefa Resûl, 1987: L62).

#### **1.6.4. Muzîka Helbestê Di Rêbaza Sîmbolîzmê Da**

Sîmbolîzm karvedanek bû di hemberî ewên ku tenê tîkiliya wan bi "rastiya bi çav dîtî" (waqî`iyeta dîtî) û hestpêkirî re hebû. Ew jî wekî rêbaza natoralîzmê û felsefeya pozetîvîzmê ku dibêjin wan girîngî daye waqî`ibînanê (dîtina rastiya heyî) û heqîqetê. Serperestyarê vê tevgerê (Şarl Bodlêr)e, ku di sala 1897-an de pirtûkek li jêr navê gulên xirab (Lest fleurs du mal) belav kir, wî di bingeh de bawerî bi teoriya huner bo hunerê hebûye. Bi aweriya Şarl Bodlêr rastî li pêş çavên mirov hatiye veşartin.

Sîmbolîzm wekî tevgerê edebî bo yekem car di Firansayê di sala 1880-î şûnda serî hilda, û yek ji rêbazên herî xûya ên edebiyatê ye, û pêşengên vê rêbazê her yek ji (Pol Vêrlîn, Artor Rambo, Stîvan Malarmî, Morîs, Bodlêr û...) bûn.

Ew rêbaz piştî belavbûnê ji aliyê piraniya neteweyên cîhanê ve dihate peyrewkirin, yan beşek ji binemayên rêbazê peyrew dikirin, di rêbaza siyolîzmê de bo gihîştina bi heqîqetên veşartî pêwîstî bi xeyaleke berfireh heye, bona vê ku bikarin her di cîhana derve de heye bidin aliyekî (Hîmdad Husên û Senger, 218: 179-194).

Sîmolîstan baweriya wan ew bû mirov nikare di vê cîhana waqî`î (rastîn) ku tê de dijî, bigihîje hemû hêviyên xwe, û mirov di dema bêhaybûnê de dikare baştir bas ji vê bik ku dixwaze, wate hemû ew tiştên ku mirov di cîhana waqî`î de nagihîjê, dikare di xewn û xeyalan de bi dest bixe, helbestvan jî dikare di cîhana xeyalên xwe de helbestên herî ciwan û nazik vehûne û tevlî muzîkeke pirr ji hestbizwên (hestlivîn) bike, muzîka helbestêku di helbesta sîmbolîzman de dihate pêşkêşkirin zêdetir wêneyeke derûnî hebû, ne sîstemeke cuda û diyarîkirî.

Di bin bandora felsefeya "şopinawê" xewn û xeyal yek bû ji taybetmendiyên sîmolîzman, bi lênihêrîna wan, "cîhan" nihênîyek e (sirrek e) ku bi xeyalkirinê eşkere dibe, gellek caran wisa tê berhevdan, û lêkdan ku helbestvanên sîbolîst bi îdeya Eflaton wêneyan dikêşin, mebest û niyet ew e ku ew dixwazin ji wê heqîqeta nediyar, heqîqeteke bilindtir nîşan bidin, yan bixin berçav. Ziman li cem piraniya feylesûf û helbestvanên sîmbolîzmê zimanêke aloz e, wan jêve bû ku nabe ziman lojîkî be, ziman li cem wan zimanê xewnê ye, helbestvanê sîmbolîzmê hertim zimanê bîr û hestê xwe disparte muzîka peyvan.

Lewra sîmbolîyan ji muzîka helbestê "Vagner" hez dikirin û girîngî didan awazên xweş û ciwan ên wê...di encama reftara sîbolîstan digel "kêş" û "serwa"yê de, helbesta azad hate ber bas, û yekem kes ku helbesta azad nivsandibe "Rambo" bû, lê berî wî jî li Amerîkayê "Walt Wîtman" helbesta azadiyê vehûnandiye. (Hîmdad Husên û Senger, 2018: 199).

Herçend ku di dawiya sedsalan 19-an de li Ewropa zimanê helbest guherînkariyêke zaf bi ser de hat, lê buhagiraniya muzîka helbestêher wekî xwe

ma,jiber ku sîmbolîstan muzîka helbestê wekî regez û toxmeke girîng a zimanê helbestê dihesibandin, herçend ku ew muzîk girêdayî bû bi zimanê taybetî ê her helbestvanekî, lê hebûneke gelemperî her hebû. Ji aliyekî din ve zimanê helbestê hewcedarê rê û şûn û zimanê bû. Serbarê hemû wan serpêçiyên, lê yasayên sîntaksî ên xwe her parastibû. Eva bû ku ew parêzgarî û parastin zêde dom nekir, û ezmûn û ceribandineke nû ya helbestêli ser destê helbestvanên Dadayî û Soryalî ji dayk bû. (Mihemed Ebdul Kerîm, 2012: 26).

Di edebiyata Kurdî de, helbestvanên Kurd jî wekî sîmbolîzman, girîngiyeke zêde dane remz û xewn û xeyalên xwe ên helbestvaniyê, hewl dane li cem vê hest û mebest û armancên ciwan ên hundirê xwe, û hunereke ciwan bo helbest û muzîk û edeb bi awayekî giştî ava bikin, herweha ji bilî helbestê, helbestvanên Kurd di vê serdemê de girîngî dane rewanbêjiyê jî. Rewanbêjî di nava deqên edebî muzîkeke ciwan bo koma deqên edebî ava kiriye.

Hemû ewên ku li jor, derbarê şêwe û naweroka helbest û deqên edebî ên sîmbolîzmê de me bas kirin, weha kirine ku xwîner hewcedarê navnîşanan be, wate bo mînak, helbesteke sîmbolîzmê bi bê têgihîştin ji navnîşanên helbestê, zehmet û dijwar e ku bi sanahî ji wate û niyeta helbestê tê bigihîjin, lewra navnîşan roleke girîng hebûye û gellek daran pêk hatiye ji tewahiya naweroka mijarê.

Di nîva yekem a sedsala 20-an de li Ewropayê, di encama şer û pevçûnan û mergesata jiyane û bîr û boçûnên cuda de, her yek ji rêbazên wekî (Sîmbolîzm, Soryalîzm, Dadayîzm, Pernasîyîzm û ...hwd) serî hildan, û hemû ew yek jî di nava edebiyatê de rengvedaneke rasterast hebûye.

Di edebiyata Kurdî de, ew deqên me kêr nebûn, lê bi nav û zarawayên cuda ên ayînî û sofîgerî û felsefî ên cuda, ne wekî rêbazeke edebî yan hunerî û hinek daran jî bi sedema cudahiya kulturane ew xasîyetane serûber û tewaw wek yek nebûn, lewra serî li lêkoler tîk daye, lewra nekarîne li hember de derkevin, û ew ji bîr kirine (Hîmdad Husên, 2014: 258).

## 2. Mûzîka Helbestê, Piraktîzekirdin Di Helbestên Kanî Da

### 2.1. Mûzîka Derve

Mûzîka Derve, beşeke sereke ye ji ciwantirkirin û nîşandana koma helbestê bi awayekî berçav û ciwan ku ew Mûzîkajî ji riya Kêş û Serwayê ve çêdibe, wate Kêş û Serwa her du pêkve dibin sedem, bona avakirina Mûzîkadervey helbestê. Îca ew helbest çî kilasîk be yan jî helbesteke nû be. Bikaranîna Kêş û Serwa di koma helbestan de gellek caran dibe sedema çêbûna du regezên cuda di helbestê de ku pêk tê ji hewtayî û hevterîbiyê, Ew du regez jî awazeke ciwan û dilrevîn dibexşne helbestê. Her derheq Mûzîkadervey helbestê bîrmendên kevn jî hewl dane wisa pênaseyê bo helbestê bikin ku (axavtineke bi Kêşû Serwadar e, ew tevîbûnekê bi Mûzîkadi tewahiya van birgeyên axavtinê de dibînin ku girêdayî rêxistineke taybet e herweha vê yekê jî pêve zêde dikin ku helbest xwediyê Kêşû Serwayeke dubarebûyî ye) (Îbrahîm Enîs, 1952:19).

Lewra awaza derve bi vê tê pênasekirin ku hevsengî û lihevkirineke dengî ye di navbera dengdêr û bêdengî de û pît û birge û yekeyên rîtmê li gora pîvana kevn û nû em dikarin bi Kêşû Serwayê destnîşlan bikin. (awaza dervey helbestê bi sedema Kêşû qafiyê tê encamdayîn û dibe ahenga çarçoveya giştî ya helbestê û sercem binyatê bi xwe ve digre) (Dilşad Elî, 1998: 87). Ku wisa bû em dikarin bêjin ku (awaza dervey helbestê di Kêşû Serwayê de xwe dibîne) (Se`îd Farûq, 2011:105).

Herwekî ku pêştir me got bo avakirina muzîka derve di helbestê de me hewcehî bi avakirina Kêş û Serwayê de heye bo heman helbestê, ku wê demê helbest diçe nav qalibeke Mûzîkaciwan û bal Kêş, herwek ku çawa Kêş û Serwa dibin sedem bo avakirina Mûzîkaderve bo helbestekê, bi heman şeweyê nabe sedem bona têkdana mijara helbestê. Wate nabe ku helbestê bikin qurbaniya Kêşû Serwaya helbestê, herweha nabe ku mijar jî nirxa reha (tewaw) ya helbestê pê bête dan, (wate dibe herdu mijar û Mûzîkadi helbestê de bi hev re bin) (Samh Elrewaşde, 2006: 138) jiber ku her du pêkve dibin sedem bo avakirina vê tama taybet a ku bo mînak di nîwedêra helbestekê de tê xûyakirin, û Mûzîkadervey helbestê jê tê berhemanîn, (Mûzîkaderve di encama hev kêşa her du nîwedêrên helbestê de çêdibe. (Usman Deştî, 2009:162).

Bi awayekî giştî piraniya şarezayên vî warî her di demên kevn û nû de li ser vê ekê hevdeng in ku Kêşû Serwa du bingehên serekî ne. bona pêkanîna mozîka dervey hebestê, jiber ku xwe helbest axvtineke Kêşû Serwadar e. (Mihemed Hadî Elterablosî 1981: 19). Herweha em dikarin bêjin ku di Kêşde dubarkirin li gora yasayên Erûz in û li Serwa de jî her li gora van yasayan in ku ji bo Serwa hatine diyarîkirin. Emê jî di lêkolîna xwe de derheq muzîka dervey ronahiyê bixin ser Kêşû Serwa û herweha piştî bi awayekî giştî di helbestên Kanî de piraktîze bikin:

### 2.1.1. Kêş

Kêşyek ji aliyên sereke ên helbestê û liqeke mozîka dervey helbestê ye ku roleke taybetî heye di avakirina Mûzîkadervey helbestê. Herweha Kêş yek ji wan bingehên serekî ye ku helbest û pexşanê ji hev cuda dike. Bixwe xwediyê çarçoweyeke zanistî ye û wek yasayekê çarçoweyekê bo helbestê ava dike û ji jevbelavbûnê diparêze. Derheq avabûna Kêşê em dikarin bêjin ku (pêk tê ji sercema wan piyên ku dêrehelbestek ava dike) (Ebdulrezaq Bîmar, 1992:10) digel avabûna helbestêKêşjî çêdibe. Wate dîroka serhildana wan di tewahiya cîhanê pêkve bûye, jiber ku (Kêşdi her zimanekê de pêk tê ji çarêoweya giştî ya awaza dervey helbestê) (Ezîz Gerdî 1999: 73) Her lewra jî bi awayekî giştî digel her lêkolînekê di helbestê de dibe ku lêkolîn li serKêşjî bê kirin.

Di serdema Yûnaniyan de û piştî wan jî heya ku digihîje îrorojê, li rex baskirin ji helbestê bas ji Kêşa helbestê jî hatiye kirin, gellek caran wek aliyê serekî ê helbestê û gellek caran jî wekî tişteke neserekî (piştguhxiştî) li helbestê hatiye nihêrîn, lê tu carî ji helbestê nehatiye veqetandin, Bo mînak di serdema Eflaton Kêşbandoreke tewaw û berçav ji helbestê dîtiye. Her di vê derheqê de hekî em lê binêrin. Eflaton di gotûbêja “Eyon” de dibêje (dema ku helbestvan helbestê dinivîse dikeve rewşa bêagayiyê, û hay li xwe nabe, û mosîqa di ser wî/ê de zal dibe) ( Ezîz Gerdî 1999:71). Di serdemên piştî Eflaton jî helbestên baş û pirr ji mosîqa bi sedema Kêş ji helbestên lawaz û kêmmosîqa dihatin veqetandin, wate Kêş aliyê serekî ê derketina helbesta baş e. “Horas” jî di pirtûka (Hunera Helbestê) a xwe de îşare bi vê yekê dike ku dibe rexnegir ji vê yek halî bin ku çawa bi sedema Kêşê, helbesta bêmosîqa ji helbesta bimosîqa cuda bikin. Bi sedema hemû wan girîngiyên ku Kêşê di mijarên wekî helbestê de heye, zanista “Kêşnasî” yê girîngî pê hate dan.



“Kêşnasî” liqeke di zanista lêkolîna edebiyatê de, bona lêkolîna li ser Kêş a edebî. Wate ji riya “Kêşnasî”yê ve, em hûrgiliyên Kêş a helbestê dizanin û em dikarin wan hûrgiliyan diyarî bikin ku di Kêşa her helbestekê de pêk hatiye. (Bi sedema zanista “Kêşnasî”yê, beşeke bibandor ya wîjdana helbestê ji me re eyan û eşkere dibe. Bo me eşkere dibe ku awaza helbestê digel regezên din ên helbestê çî Kêşekê ava dikin, bona veguhastina hest û soza helbestvan, û çî bandorekê li ser soza xwîner dikin) (Ezîz Gerdî, 1999:5), wate “Kêşnasî” xeynî vê ku lêkolînê li ser Kêşû çawaniya avabûn û banorên Kêşê dike, lêkolînê jî li ser hest û soz xwîner dike, ku gelo ewKêşku têkilî regezên din ên helbestê bûye, tu bandorek jî li ser aliyê hember wate xwîner yan bîser daniye.

Bi awayekî giştî wisa têgihîştine kuKêşa helbestê di helbesta hemû welatanû netweyan de heye, wate helbesta tu helbestvanekî di tu welatekî de nahê dîtî ku tê deKêşbi kar nehatibe, lê ji helbestvanekî/ê ve bo helbestvanekî/ê din, û ji welatekî ve bi welatekî din, ji neteweyekê bo neteweyeke din şêwe ûKêşcuda ye, Bo mînak (di zimanê Yûnanî û Îngilîzî deKêşa (eyambî) û di zimanê Firansî deKêşa (elîkzander) û di zimanê Tirkî deKêşa yazdeh birgeyî (5+6) û di zimanê Erebi de jî Kêşa (Tewîl) (Fe`ûlûn,Mefa`îlûn,Fe`ûlûn,Mefa`îlûn) heye. Derheq zimanê Erebi de bîr û boçûnên cuda hene, hinek li ser vê baweriyê ne kuKêşa Recez (mustef ilun, mustef ilun, mustef ilun) kevntirînKêşe di vî zimanî de (Hîwa Nûredîn Ezîz, 2016:5), Herweha di helbesta kevn û nû a Kurdî de çend curKêşhene ku ji aliyê helbestvanên Kurd ve bi kar hatine ku ên herî diyar û berçav ev in: Kêşa Xomalî û Erûzî. LewraKaniyê helbestvan ku helbestên wî di warên hest û soz û civakî û neteweyî û dildarî de ne, her du cureyênKêşên diyar û berçav bi kar anîne. Kêşa Erûz a erebi û Xomalî.

#### **2.1.1.1. Bingehên “Kêş”ê**

BingehênKêşa helbestê di hemû cîhanê de ji deng û birge û risteyê pêk tên. Lê di zimanê her netewe û welatên cuda de dengê taybet bi xwe hene, û gellek caran di welatekî de li çav welatekî din kêmtir yan dengê zêdetir di zimanê wan de hene, bo mînak me di zimanê Kurdî de derdora 31-36 dengî heye ku hebûna wan cudahiyan wisa kiriye ku diKêşa helbestê de komeke bingehên cuda jî peyda bibin. Bingehên giştî ênKêşa helbestê weha ne:

1-Deng: Deng di zimanê Kurdî de wekî her zimanekî din ê cîhanê, du cur deng hene (dengdêr û bêdeng), Di bêdeng de dengê (girr û kip) hene, û didengdêr de hemu deng hene.

2-Birge: Ew deng yan çend deng in ku bi yek henseyî ji dev derdikevin. Birge bi bê dengdêr nabe. Her birgeyek tenê dengeke dengdêr tê de heye, îca çi kurt be, yan jî dirêj be.

3-Dêr: Dêra helbestê li gora şeweya helbestê du cur in:

Yekem: Helbesta stunî: Ew helbest e ku hemû dêrên wê bi ser du let (pişk,ker)an de parve dibe û dêrên wê her ji destpêkê ve heya dawiyê her yek “Kêş” hene. Dirêjîya wan bi qasî hevûdin in (tenê hinek rewşên taybet nebe). Wekî hemû helbestên kilasîk û mesnewî û millî di van cure helbestan de, dêr hertim ji du pişk (ker)an pêk tê. Yek ji helbestên Kanî bo mînak weha ye:

*Sed afetî nazikbeden û gerdenî mîna*

*Sed wechî qemer horî liqa dilberî re`ina*

*Sed sine sedef calibî dil arif û dana*

*Her yêkê be sed `îşwe bika `ers û temenna*

(Kanî: 50)

Duyem: Di helbesta azad ya çendî û çawaniyê de, waten di helbesta Erûzî û na“Erûzî” de dêrahelbestê her ew qas e ku di yek xetî de tê nivîsandin, tenê yek pişk e. Bo mînak Kanî di dêrehelbestekê de dinivîse:

*Her le binî pêm heta mûy serim*

*Xerqî gunah bûm nemdekird şerm*

(Kanî: 32)

### **2.1.1.2. Cureyên “Kêş”ê Di Zimanên Cîhanê Da**

Yekem: Kêşa çawanî ya (hêzdar): Ew cureya Kêşê ji dubarebûna birgeya hêzdar û bêhêzê tê avakirin, wate bihêzî û bêhêzî ya birgeyan, cureya Kêşê diyarî dike, merc jî ew nine ku hejmara dêran di hejmara birgeyan de wekhev bin, Wek helbesta zimanê Îngilîzî û Almanî.

Duyem: KêşaÇendî: Di vê cureyê de her qalibekê sîstemeke taybet bi xwe heye, wate kurtî û dirêjîya birgeyan û çawaniya rêzbûna wan, cureyaKêşê destnîşan dike, wekî helbesta zimanê Yûnanî, Latînî û Erebi.

Sêyem:Kêşa jimareyî:Kêşa jimareyî, Birgeyî, Sîlab û penceyî jî dibêjnê. ew cure Kêşji dubarebûna hejmareke diyarîkirî ya birgeyan ava dibe, bi bêy guhdana bi kurtî û dirêjî yan bihêzî û hêzdariya birgeyan, wek zimanê Firansî, Îspanî, Kurdî.

Çarem: Kêşa Peyjeyî: Kêşa peyjeyî yan tebeqeyî, li gora bilindî û nizmî a tebeqeya deng tê diyarîkirin, wek zimanê Çînî û Vîyetnamî. Zimanê çînî baştirîn mînak e bo van cure Kêşan, jiber ku zimaneke birgeyî ye.

### **2.1.1.3. Cureyên Kêşê Di Edebiyata Kurdî Da**

Drheq bi helbesta Kurdî di hemû zaravayên zimanê Kurdî de ji kevn ve heya niha li ser du rêbazan çûye pêş, wate di helbesta Kurdî de du cureyên Kêşê bi kar hatine:Kêşa Xomalî ûKêşa Erûzî.

#### **Yekem: Kêşa Xomalî**

Kêşa Xomalî: Kêşa Jimareyî, Birgeyî, Sîlab û Penceyî jî dibêjnê. Ew cure Kêş ji dubarebûna hejmareke diyarîkirî a birgeyan ava dibin, bi bêy guhdana bi kurt yan dirêjî yan bêhêz û hêzdariya birgeyan. EwKêşli gora hejmara birgeyan û cihê rawestana birgeyan tê diyarîkirin. Bi awayekî ku her du nîvedêrên helbestê di warê jimareya birgeyan de wekhev bin, lê merc nine ku ew birge di kurtî û dirêjîyê de wek hevdu bin.

DiKêşa jimareyî de em dikarin ku jimareya birgeyan bi qasî penceyên destan bijmêrin, Bo me Kurdan jî ewKêş Xomalî ye, wate (Kêşeke di koka xwe de resen e û binkeya pêkanîna awaza pexşana (hunraweya) folklor a Kurdî ye) (Dilşad Elî, 1998: 136).

Helbestvanên Kurd berî hatina Îslamê her çi beyt û lawik û heyran û stran hene, her hemû jî biKêşa Xomalî nivîsandine, hemû helbestvanên neteweyî û hemû helbestvanên diyalekta Goran biKêşa birgeyî helbest nivîsandine, tenê “Seyd” ê Hewramî nebe, ku hinek helbest biKêşa Erûz nivîsandine. Herweha hindê helbestên nû ku di salên 20 û 30`î ê sedsala bîstem de, hindê ji helbestvanan vejeriyan û

helbest biKêşa Xomalî nivîsandin, di vê derheqê de Ferhad Pîrbal dibêje: Devberdan jiKêşa Erebi û bikaranînaKêşa pence yek ji xasîyetan û diyardeyên vê sîstema nû ya afirandinê ye.

Kurd berevajiyê derûcîranên xwe gellek digel helbesta nû bîhanî nebûye, û her di destpêkê de li ber ronahiya beytên folklorî guhên wê adet bi vê şeweyê kiriye. Hinek li ser vê baweriyê ne ku edebiyata folklorîk a Kurd di serdema paşatiya Sefewîyan (1678-1715) de serî hildaye, û temenê vê edebiyatê ji wê serdemê kevntir nine, lê jiber ku dîroka danîna beytan nehatiye diyarîkirin, em nikarin piştî xwe bi vê gotinê girê bidin û her wek boçûnekê cihê balkêşanê ye. Piraniya beytên folklorî ên Kurdî bi awayê ciwan û paraw li serKêşa xomalkî û taybetî a Kurdî hatine darêtin. Di hindêk ji wan de heta Serwa û pîşeya helbestê jî berçav hatiye girtin. Di beyta Zembîlfiroş de xûya ye ku danerê wê bona vê ku xwendewarbûna xwe nîşan bide, di beyta xwe de peyvên Erebi û Farsî bi kar anîbûn. Herweha di beyta Las û Xezal ê de jî ku yek ji wan beytane ye ku gellek hostayane hatiye darêtin, mîsra`ên wê kurt û dirêj in, lê di dema dirêjbûna mîsra`an de jîKêşa beytan hatiye parastin. Elî Berdeşanî di beytan de ew qas şarezaya û hosta bûye ku tu kesî nevēraye digel wî bikeve nava rikeberiyê de. Beytên folklorî û şeweya darêtina wan ku bêhna Xomalîbûnê didin, bûne bingehadarêtineke nû ku helbestên me yên nû ên niha jî vedigerin ser vê bingehê û her vê bêhnê didin.

Serbarê vê yekê jî em nikarin ku bas ji rol û bandora edebiyata cîranan jî nekin, Di Kurdistanê Îraqê de “Şêx Nûrî Şêx Salih” (1896-1958) û “Goran” (1904-1962) ji riya edeba Tirkên Osmanî ve nasyarî digel şeweya helbestên nû peyda kirin. Goran ku can da helbesta nû ya Kurdî, zimanê Îngilîzî jî dizanî û şarezayî di edebiyata biyaniyan de hebû. Diyare ku Mewlewî û Melayê Cizîrî jî helbestê weha hene, Goran jê re derket kuKêşa Erûz digel xwezaya zimanê me li hev nayê, û Kêş ên Xomalî û folklorî ku ji bav û bapîran ve bo me bi cih mane, baştir digel xwezaya zimanê me li hev tên.

Goran û hevalên xwe dema ku ji sala1952-an ve dest kirin bi nûkirina helbesta Kurdî. Yek ji wan xalên ku bona nûkirinê girtin pêşiya xwe, pêk dihat ji guherînkariya diKêşû mozîka helbestê de. Momsta Goran di cihekî de qala vê çendê

dike, ku di bikaranîna Kêş û Erûzê de, guherînkari di “Zîhaf” û “îlle”yê de pêk anîne û cara dawiyê jî bi yekcarî ji Erûz dûr ketin. Serbarê vê yekê jî zimanê Kurdî a `esîl û petî di helbestê de hate bicihkirin, û ji bikaranîna peyvên biyanî dûr ketin. Ziman jî xweza û şewaza taybet bi xwe heye, û xwezaya zimanê Kurdî ye ku digel Kêşa Erûz de li hev nedihat. Belku wisa hewce bû, ku cure Kêş ekê bi kar bînin, ku digel zimanê me li hev bê, û eva bû ku vegeyriyan ser vê Kêşê di folklor û edeba herêma Goran de, û navê “Kêşa Xomalî” yan “Penceyî” li ser danîn (Goran Ebdulla, 1384:14). Bi vî awayî ji wê qonaxê ve heya îrorojê bikaranîna Kêşa Erûz hêdî-hêdî kêmbû, û niha di hemû edebiyata Kurdî de tu çend helbestvanan nabînin ku li ser “Kêşa Erûz” helbestan vehûnin.

Gellek nivîskar û rexnegir û helbestvanan bas ji “Kêşa Xomalî” kirine, lê gotar Cigerxwîn ji her hemiyana balkêştir e di kovara Hawar, hejmar 22 sala duyem 1933-an de. Cigerxwîn hewl daye ku hinek destpeyvên nû danê. Cigerxwîn bo “lete şê`ir”ê peyva (Gav) û ji bo “birge” peyva (Movik) daniye, û hewl daye navê taybet bo “Kêş”an danê (Ezîzî Gerdî, 1914: 239).

Helbesta Penceyî bi zêdetir ji deh birgeyî hatiye nivîsandin, (5+5) ku sekinîn di nawerastê de ye, yan “Kêşa heştî” (4+4) e, û piştî “Kêşa heftî” ku ew jî gellek kêmbi kar hatiye (3+4). Herweha “Kêş yazdeh” birgeyî jî heye ku ew jî wek (5+6) û (3+4+4) tê. Bi awayekî giştî em dikarin bêjin ku helbesta Xomalî ji sê cureyan pêk hatiye ku ew jî ev in: (Piyên sê birgeyî, çar birgeyî û pênc birgeyî). Herweha ên neserekî jî ev in (yek birgeyî û dubirgeyî). Ew du pê tenê di helbestên azad de derdikevin. Ew jî gellek kêmbi in. “Kêşên Xomalî” li gora cureya hejmara piyên “lete dêr” (pişkek ji dêr) sê cur in: Kêş a saf, Kêşa têkelaw, Kêş a Dewrî:

Kêş a Saf: Ew Kêş ji dubarebûnayeke cureya “pê” tê avakirin. Wate pê di hejmara birgeyê de hemsêwe ne, bo mînak bi vî awayê jêr:

Sê birgeyî a saf:  $12 = 3+3+3+3$ ,  $9 = 3+3+3$ ,  $6 = 3+3$ .

Çar birgeyî a saf:  $16 = 4+4+4+4$ ,  $12 = 4+4+4$ ,  $8 = 4+4$

Pênc birgeyî a saf:  $15 = 5+5+5$ ,  $10 = 5+5$ ,  $5 = 5$

Yek ji mînakên Pênc birgeyî a saf di helbestê Kanî (xeyaleke îmandarane) ye:

*Her lebnî pê m heta mûy serm*  
*Xerqî gunah bûm nemdekrid şerm*  
*Mîsalî mecnûn bê seru saman*  
*Degeram ser sam le deşt û kêwan(kanî: 32)*

Kêşa têkelaw: Ew cure Kêşji du pêyan ava dibe û her yek ji wan cure piyek e, wate wek hevdu nînin. Yan jî ji sê çar piyan ava dibin. Piyeke wan carekê tê, û ên din jî du car û sê car tèn. Bo mînak bi awayê jêr çêbûn:

Piyeke çar birgeyî û piyeke sê birgeyî:  $7= 4+3$

Du piyên çar birgeyî û piyeke sê birgeyî:  $11= 4+4+3$

Sê piyên çar birgeyî û piyeke sê birgeyî:  $15= 4+4+4+3$

Du pîtên çar birgeyî û piyeke pênc birgeyî:  $13= 4+4+5$

Kanî herçend ku helbestvanekî helbestên kilasîk ên Kurdî bûye, lê di qada helbestê Xomalî ên Kurdî de dîsan ew jî hemşeweyê hindêk ji helbestvanên navdar ên Kurd helbest li ser Kêşa Xomalî jî nivîsandine, ya xwarê yek ji mînakjên heft birgeyî, di helbestên Kanîde ku bi awayê Goranî nivîsandiye:

*Serxoş m le dîdart*  
*Bedû çawî xumar*  
*Lêwt xunçey neşkuftî*  
*Mnim bulbulî zart...* (Kanî )

Kêş a Dewrî: EwKêşji du pîtên cuda bi rêz yek li pey yekê dubare dibin. Mînaka van cureyên Kêşan, ji dubarebûna du piyên çarî û du piyên sêyî derdikevin. Ew jî weha: ( $14= 4+3+4+3$ )

### **Duyem: Kêş a Erûz**

Peyva Erûz a Erebî: Peyva “Erûz” ku peyveke zimanê Erebî ye, û ji aliyê zana û zimanvanên Ereb ve, gellek wate jê re hatine danîn, bo mînak di koma ferhengokên erebî de nêzî 14 wate bo peyva Erûz bi kar birine, ew jî wekî (riya

dijwar, tenke`evir, navçe, stûna navendê ya reşmalê, mekke, senter, ...hwd). Bi awayekî gelemperî wekî tişteki dijwar û pîroz û nawerasta tiştan lê hatiye nihêrîn.

Zaraweya Erûz a Erebî: Erûz wekî zarawayeke zanistî ku qada karê lêkoîna helbestên erebî ye bi çend awayan hatiye pênasikirin wek:

- Erûz terazûya helbestê ye

- Erûz zanistek e ku bi riya wê ve, helbestên nivîşkan ji helbestên kêşdar û dirust cuda dike.

- Erûz zanistek e ku bas ji rewşa Kêşan dike.

- Erûz zanista wan destûran e ku bi riya wê ve, Kêşên dirust ji ên nedirust têne veqetandin. (Hîwa Nûredîn, 2016: 1-12).

Zanista Erûz a Erebî ji aliyê (Xelîl kurê Ehmedê Ferahîdî) ve hatiye avakirin. Xelîl zanayekî şareza bû û xwediyê çend pirtûkên zanistî ên taybet bi ziman bû, berî Xelîl zimanê Erebî têkelawiyê bêsêrûber di helbestê de hebû. Wî zanistek ji bo helbesta Erebî anî, ku ew zanist jî di bingeh û koka xwe de karê wê lêkolîn e li ser helbestên erebî. Herweha xeynî vê ku helbestên nedirust û netewaw ji hevdu cuda dike, û palderek e jî bo vê ku helbestvan helbestên xwe ji nedirustiyê biparêzin, û hewl bidin ku li gora peyrewa vê zanistê helbestên xwe binivîsin, ku di dawiyê de helbestên wan rast derdikevin, û pirr dibin ji muzîkê. Vê zanistê her gellek zû geşe kir, û wisa lê hat ku hemû helbestvanên Ereb peyrewiyê ji vê zanistê bikin û herweha ji bilî helbestvanên Ereb helbestvanên Fars û piştê jî helbestvanên Kurd jî heman zanista Erûz di helbestên xwe de bi kar anîn.

Helbestvanên Kilasîk ên Kurd bi awayekî giştî hemû helbestên wan bi awayê Erûz hatine nivîsandin, tenê helbestvanên “Goran” nebin ku wan bi “Kêşa Xomalî” helbest nivîsandine, “Kêşa Erûzî” bo xwe Kêşa helbestvanan û helbesta Kurdî nebûye, belku “Kêşa Xomalî” (birgeyî) Kêşa serekî ya zimanê helbesta Kurdî bûye. Lê piştî hatina ayîna Îslamê û serhildana Kêşa Erûza erebî û peyrewkirina wê ji aliyê helbestvanên her du neteweyên Ereb û Fars ve, vê yekê weha li helbestvanên Kurd jî kir ku peyrewiyê ji Kêşa Erûz bikin.

Herwekî ku me berê jî gotku helbesta kilasîk a Erebî hemû li ser Kêşa Erûz hatine nivîsandin. Dema ku gelê Kurd ji ayîna Îslamê peyrewî kir, li ber vê ku helbestvanên Kurd piraniya wan di mizgewtan de dixwendin, ketin bin bandora edeb û zimanê Erebî, herweha ew helbestvanên Kurd jî ku zimanê Erebî nedizanîn, û di zimanê Farsî de şarezayî peyda kiribûn, ketin bin bandora helbesta Farsî de. Dîsan bi sedema vê ku helbestvanên Fars di bin bandora edebiyata Erebî de bûn, wan jî peyrewî ji “Kêşa Erûz” ya Erebî dikirin, lewra helbestvanên Kurd Erûza Erebî veguhastin bo nav edeba Kurdî (wêjeya Kurdî).

Bi vî awayî helbestvanên Kurd li ser deryaya Erûziyan helbest nivîsandine, lê gellek caran deryayên Erûzî (Behr a Erûz) di Kurdî de wekî qalibê xwe bi tewahî nehatine wergerandin, û di guherînkariyên (zîhaf) û (Îlle) de bi kar hatine, û radeya bikaranîna her yek ji van Kêşan jî li gora şiyana helbestvan û şewaza nivîsînê ji helbestvanekî/ê ve bo yekî/ê din tê guherîn, û merc nîne ku hemû deryayên Erûzî di helbesta Kurdî de wekî hevdu bi kar hatibin.

Eva bû ku zanista Erûz bû bingeke serekî bo helbestvanan û helbestvanên kilasîk ên Kurd bi taybetî û heta îrrojê jî piraniya herî zaf ya helbestvanên me peyrewî ji vê zanistê kirine, û gellek caran helbestvanên Kurd Kêşa Erûz tewaw wekî xwe wernegirtine, belku heya astekê destkarî kirine, herweha hewl dane ku di nava Kêşên Erûz de zêdetir van Kêşan werbigrin ku baştir bo helbestên Kurdî bi kar tên, wate helbestvanên Kurd zêdetir ew Kêşwergirtine ku ji cureyeke “pê” wate (tefîle) pêk hatine, û digel sîstema dengê zimanê Kurdî zêdetir ji ên din bi kar tê. Ew Kêşên ku helbestvanên Kurd zêdetir bi kar anîne ev in: (Hezec, Remel, Recez, Muteqarib..). Cuda ji ên din di nava van çar Kêşên helbestvanên Kurd de helbestvanên Kurd ji hemiyana zêdetir Kêş a Hezec û Kêş a Remel bi kar anîne, jiber ku ew du Kêş di zimaê Kurdî de dikarin sanahîtir û ciwantir rêk bikevin û li hev bên, û muzîkekciwantir jî pêşkêş bikin. Kaniyê helbestvan jî di vê qadê de zêdetir Kêşa Hezec, Kêşa Remel, û Kêşa Serî`îbi kar anîne.

### **Bingehên Erûz**

1- Deng: bi ser du cureyên denga de tê parvekirin (Dengdêr, bêdeng).

2- Bingehçn Erozi: Pêk tên ji (Sebeb, Weted, Fasîle),



Sebeb: Sebeb beşek e, yan du birge (beş) e: (Du pît e, ew du pît ya yekem dengdêr e, û ya duyem bêdeng e, yan jî her du lertzok in). “Sebeb” du cureyên wê hene, (Sebeba Sivik û ya Giran).

Yekem: “Sebeba Sivik”: Beşeke dirêj e (du pît e, yekem dengdêr e, û ya duyem bêdeng e) bo mînak (ser, em, dem, na), hêma û nîşana wê weha tê nivîsandin (-).

Duyem: “Sebeba Qurs” e ku du beşên kurt hene. (Du pît in ku her du jî dengdêr in, bo mînak (eme, heme, şe, kure) hêma û nîşana wê jî weha ye (U U).

Weted: du beşên wê hene ( sê pît e, du dengdêr û yek jî bêdeng e). Wate du cureyên wê hene).

Yekem: “Weted” a kom ku du beş e, beşeke kurt û yek jî dirêj (sê pît e. Dengdêr, dengdêr, bêdeng). Mînak wekî (Belem, Seda, Nekey, Emem, Qesem) hêma û nîşana wê jî weha ye (U -).

Duyem: “Weteda Bilaw” ku du beş e, beşeke dirêj û beşeke kurt (dengdêr, bêdeng û dengdêr) mînak wekî (Şexte, Doxe, Saye, Daye, Babe) hêma û nîşana wê weha ye: (- U).

Fasîle: ji sê birgeyan yan jî çar beşan pêk tê (Çar yan pênc pît e û hemû pîtên wê jî dengdêr in, yan jî tenê pîta dawiyê bêdeng e). “Fasile” du cureyên wê hene:

Yekem, “Fasileya Biçûk” sê beş e (çar pît e, dengdêr, dengdêr, dengdêr, bêdeng) du birgeyên kurt û yek jî dirêj mînak: Wekî (kurekem, ewetem, behewes) nîşana vê jî weha ye: (U U -).

Duyem: “Fasileya Dirêj” çar birge ye (sê birgeyên kurt û yek jî dirêj (U U U -) pênc pît e, dengdêr, dengdêr, dengdêr û bêdeng) mînak wekî (nedegera, lexefeta).

Bingehên Erûz					
Sebeb 2 Deng		Weted 3 Deng		Fasîle 4,5 Deng	
Sivik	Giran	Kom	Belaw	Biçûk	Dirêj
Yek birge	Du birge	Du birge	Du birge	Sê birge	çar birge
(-)	(UU)	(U-)	(-U)	(UU-)	(UUU-)

### Tefîle Erûzî

1-Fe`ulun (U - -) (Weteda Kom +Sebesa Sivik).

2-Fa`îlun (- U -) (Sebesa sivik + Weteda Kom).

3-Mefa`îlun (U - - -) (Weteda Kom+Sebesa Sivik + Sebesa Sivik).

4-Mustef`îlun (- - U -) (Sebesa Sivik + Sebesa Sivik +Weteda Kom).

5-Fa`îlatun (- U - -) (Sebesa Sivik +Weteda Kom+ Sebesa Sivik).

6-Mufa`eletun (U U - U -) (Weteda Kom+Sebeba Giran+ Sebesa Sivik)

7-Mutefa`îlun (U - U U -) (Sebeba Giran+ Sebesa Sivik+Weteda Kom)

8-Mef`ulatu (- - - U) (Sebesa Sivik + Sebesa Sivik + Belaw)

9-Mustefe`î lun (- - U -) (Sebeba Sivik+Weteda Kom +Sebeba Sivik)

10-Fa`î latun (-U- -) (Weteda Kom +Sebeba Sivik + Weteda Belaw)

Têbînî:Yên ku li ser vê baweriyê ne ku hejmara Tef`îan heşt in, wan du tef`îlên dawiyê kêr dikin (Ezîz Gerdî, 2014: 33).

### Kêşên Erûzî

Kêşên Erûzî(ên behr) hejmara wan 16 ne. her yek ji Wan Kêşên Erûzî hejmareke zaf ji helbestvanên cîhanê helbest li ser wan nivîsandine, lewra nave wê

danîne derya (behr), jiber ku gellek çiqên wê hene, û bi awayekî berfireh û bi rûbereke mezin helbestvanan di nav ahelbestên xwe de bi kar anîne.

Herweha ew behr di warê şewaza parvebûna xwe de, bi ser sê komeleyên cuda de parve dibin. Cuda ji van parvebûna bi ser komeleyan de “Kêşên Erûzî”(ên behr) di çarçoveya çend bazineyan de digerin û her yek ji wan bazineyan komeke Kêşan bi xwe ve girtine, û bi geriyana di çarçoveya bazineyên xwe de Kêşên xwe diguherin.

Her wekî ku me got “Kêşên Erûz” hejmara wan 16 ne, ku di helbestên xwe de hemû ewKêşbi kar neanîne. Belku em dikarin bêjin ku helbestvanên Kurd bi wayekî giştî nêzî 9Kêşji koma wan 16Kêşan bi kar anîne ku ewKêşpêk tên ji: (Hezec, Remel, Recez, Xeffif, Moctes, Muteqarib, Besît, û Serî`i). Lê koma giştî ya “Kêşên Erûz” ku hejmara wan 16 Kêş in, pêk tên ji ên jêr:

Kêşa Hezec: Mefa`îlun, Mefa`îlun, Mefa`îlun

Kêşa Remel: Fa`îlatun, Fa`îlatun, Fa`îlatun

Kêşa Recez: Mustef`îlun, Mustef`îlun, Mustef`îlun

Kêşa tewîl (dirêj): Fe`ulun, Mefa`îlun, Fe`ulun, Mefa`îlun

Kêşa Medîd: Fa`îlatun, Fa`îlun, Fa`îlatun, Fa`îlun

Kêşa Besît: Mustef`îlun, Fa`îlun, Mustef`îlun, Fa`îlun

Kêşa Wafir: Mefa`eletun, Mefa`eletun, Mefa`eletun

Kêşa Kamil: Mutefa`îlun, Mutefa`îlun, Mutefa`îlun

Kêşa Serî` (Bilez): Mustef`îlun, Mustef`îlun, Mef`ulatu

Kêşa Monseî`i: Mustef`îlun, Mef`ulatu, Mustef`îlun

Kêşa Xeffif (sivik): Fa`îlatun, Mustef`îlun, Fa`îlatun

Kêşa Mozarî`i: Mefa`îlun, Fa`îlatun, Mefa`îlun

Kêşa Muqtezeb: Mef`ulatu Mustef`îlun, Mustef`îlun

Kêşa Moctes: Mustef` îlun, Fa`îlatun, Fa`îlatun

Kêşa Moteqarîb: Fe`ulun, Fe`ulun, Fe`ulun, Fe`ulun

Kêşa Motedarîk: Fa`îlun, Fa`îlun, Fa`îlun, Fa`îlun

Hemû ew “Kêşên Erûz” bi ser sê komeleyan de parve dibin ku komele jî ev in:

Koma yekem: Kêşên tak yan Kêşên saf. Ew Kêşji dubarebûna yek tef`île çê dibin. Kêşên wek: (Hezec, Recez, Remel, wafir, kamîl, moitedarîk, moteqarîb).

Koma duyem: “Kêşên li rêzê” (benorekan); Ew Kêşji dubarebûna li pey hev ya tef`îlan ava dibin. Herweha ew Kêş di warê muzîkêde gellekî bihêz in. Jiber ku du cureyên îqa`ê tê de hene. Îqa`ek ji rawestiyan atef`îlan û yek jî ji hatina dubare ya li pey hev ya tef`îlan ava dibe. Ew komele ji wan Kêşan pêk hatiye: (Tewîl, medîd û besît).

Koma sêyem: Ew kom ew Kêştê de kom bûne ku Kêşên wan ji dubarebûna tef`îlan ava dibin, lê bi awayekî têkelaw Kêşên vê komê jî pêk tên ji: (Serî`i, Munserî`i, Moqtezeb, Xeffif, Moctes, Mozarî`i).

Xeynî parvebûna bi ser van sê koman ew 16 Kêşên Erûz bi ser 5 bazineyên cur bi cur parve dibin, ku dibêjne wan (bazineyên Erûz) ku bazine jî pêk tên ji ên jêr:

1- Bazineya yekem muxtelif (cuda): Ew bazine ew Kêştê de ne (Mediye, Mostetîl, tewîl, Besît, Momted).

2- Bazineya duyem Mo`itelîf (teba): Lewra ew nav li ser hatiye danîn ku pîtên wê di warê biçûk û mezin de wekî hevdu ne, û serûber û teba ne. Ew bazine tenê sê “Kêş” tê de hene. Ew bazine tenê sê Kêştê de ne, wek (wafir, Kamîl, Motewefîr).

3- Bazineya sêyem, “Mocteleb” (hawirde): Lewra dibêjnê “hawirde” jiber ku hemû piyên Kêşên wê bazineyê ji ya yekem ve hatine wergirtin. Ew bazine sê Kêştê de hene (Hezec, Remel, recez). Herweha ew Kêşji Kêşên herî berçav û carr ên helbesta kilasîka Kurdî ne.

4- Bazineya çarem “Elmoştêbeh” (jê têkçûn): Ew bazine zortirîn Kêşê de ye ku hejmara wan 9 Kêştê de hene, (serî i (bilez), Moteîd (xerîb), Monserîd (Qerîb), Monserîh (asan), Xefîf (sivik), Mozarî I (pêçû), Moqterîb (Birran), moctes (derkşaw), Moterred).

5- Bazineya pêncem, “mottefiq” (rêk): Lewra dibêjnê (rêk) jiber ku piyên Kêşan rêk û rast in. Wate hemû piyên wê biçûk in. Ew bazine tenê du Kêştê de hene, ew jî (Mutedarîk, Muteqarîb wate nêzîk).

### 3.1.1.4. Kêşên Erûzî” Ên Diyar Ên Helbesta Kilasîka Kurdî

#### Yekem: Kêşa Hezec

(Mefa`îlun, Mefa`îlun, Mefa`îlun, Mefa`îlun) (U - - -, U - - -, U - - -, U - - -)×2

Kêşa Hezec, Kêşeke sivik û awazdar e, û ji Kêşên herî diyar û carr ên di nava helbesta Kurdî de yer. Helbestvanên Kurd bi awayekî giştî zêdetir ew Kêşbi kar anîne. Lewra em dikarin bêjin ku (ew Kêşdi warê bikarhatinê de di helbestên kilasîk ên kurdî de di pileya yekem de ne) (Hîwa Nûredîn Ezîz, 2016: 157), ew girîngîdan jî zêdetir vedigere ser vê, jiber ku Kêşa Hezec, Kêşeke saf û ahengdar e, û digel helbesta Kurdî û herweha digel pêkhatiya muzîkê û strana Kurdî baş û rêk e. “Kêşa Hezec” di helbesta kilasîk a Kurdî de di zêdetir ji 16 qalibên cuda de bi kar hatiye. Lê di vir de zêdetir em qalba van liqan dikin ku helbestvanê bajarê Hewlêrê Kanîû helbestvanên Kurd bi awayekî giştî bi kar anîne.

1- Hezeca heşt a tewaw (salim): 4 ,4 ,4 ,4 = 16×2 = 32 birge.

Du Erûzên wê hene:

- Musebbex (mefa`îlan)

- Tewaw- salim (mefa`îlan)

(mefa`îlun, mefa`îlun, mefa`îlun, mefa`îlun- mefa`îlun, mefa`îlun, mefa`îlun, mefa`îlun)

(U - - -, U - - -, U - - -, U - - -

U - - -, U - - -, U - - -, U - - -)

Dêre helbest ji 32 birgeyan pêk hatiye û her aliyeye wê ji 16 birgeyan pêk hatiye bi awayê (4+4+4+4) ew Kêşdi nava bazineya serekî ya xwe de sê tefîle ye, wate sê caran (mefa`îlun) hatiye. Dema ku dibêjin Hezeca heşt a tewaw, merem ew e ku tefîlen tu “Zihaf” û “Îlle”yek wernegirtine, û di nava bazineyê de her çawa ku heye wisa jî bi kar hatiye, wate tefîleya (mefa`îlun) bi awayê salim bi kar hatiye.

Bo minak:

Ke şêr pîrbu debête mesxerey gurg u seg u rîwî

Ciwan ferdêke Kanî ba neşirka çapekey gîwî

Ke	şêr	pîr	bu	de	bê	te	mes	xe	rey	gur	gu	se	gu	rî	wî
U	-	-	-	U	-	-	-	U	-	-	-	U	-	-	-
	mefa`îlun				mefa`îlun				mefa`îlun				mefa`îlun		
Ci	wan	fer	dê	ke	ka	nî	ba	ne	şir	ka	ça	pe	key	wî	wî
U	-	-	-	U	-	-	-	U	-	-	-	U	-	-	-
	mefa`îlun				mefa`îlun				mefa`îlun				mefa`îlun		

Bo minak:

Weten şîrîne lay min daxekem bes goze sawaya

Be qîl u qalî min amancekey nagate hîç paya

We	ten	şî	rî	Ne	lay	Min	da	xe	kem	bes	go	ze	sa	wa	ya
U	-	-	-	U	-	-	-	U	-	-	-	U	-	-	-
	mefa`îlun				mefa`îlun				mefa`îlun				mefa`îlun		
Be	qî	lu	qa	Lî	min	A	man	ce	key	na	ça	te	hîç	pa	ya
U	-	-	-	U	-	-	-	U	-	-	-	U	-	-	-
	mefa`îlun				mefa`îlun				mefa`îlun				mefa`îlun		

2- Hezeca heşt a exrebî a mekfûf a mehzûf. (3 ,4 ,4 ,3 = 14 × 2 = 28) b.

Dû Erûz hene:

-Mehzûf (fe`ulun)

-Meqsûr (fe`ulan)

(mef`ulu, mefa`îlu, mefa`îlu, fe`ulun      mef`ulu, mefa`îlu, mefa`îlu, fe`ulun)

(- - U, U - - U, U - - U, U - -      - - U, U - - U, U - - U, U - -)

Bo minak:

Her çend hebî sultanu Melîkşahu hukimdar

Nabin weku ew laîqu dana le cîhanî

her	çend	he	bî	sul	Ta	nu	me	lîk	şa	hu	hu	kim	dar
-	-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	U	-	-
mef`ulu		mefa`îlu				mefa`îlu		fe`ulun					
na	bin	we	ku	ew	La	î	qu	da	na	le	cî	ha	nî
-	-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	U	-	-
mef`ulu		mefa`îlu				mefa`îlu		fe`ulun					

Bo minak:

Heytim kerekî dêze çi hifrîtu behêze

Wek cûtî deka raste xetî rêzî lerêze

hey	tim	ke	re	kî	Dê	ze	çi	hif	rî	tu	be	hê	ze
-	-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	U	-	-
mef`ulu		mefa`îlu				mefa`îlu		fe`ulun					
wek	Cû	tî	de	ka	Ras	Te	xe	tî	rê	zî	le	rê	ze
-	-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	U	-	-
mef`ulu		mefa`îlu				mefa`îlu		fe`ulun					

3- Hezeca şeş a mehzûf:  $4, 4, 3 = 11 \times 2 = 22$  b.

Du Erûzî hene:

-Meqsûr (fe`ulan)

-Mehzûf (fe`ulun)

(mefa`îlun, mefa`îlun, fe`ulun                      mefa`îlun, mefa`îlun, fe`ulun)

(U - - -, U - - -, U - -                      U - - -, U - - -, U - -)

Bo minak:

Le Hewlêr medresey yekem guşabû

Hemû mekteb le hejimet menhenabû

le      hew      lêr      med      re      sey      ye      kem      gu      şa      bû

U      -      -      -      U      -      -      -      U      -      -

mefa`îlun                                      mefa`îlun                                      fe`ulun

he      mû      mek      teb      le      hej      met      men      he      na      bû

U      -      -      -      U      -      -      -      U      -      -

mefa`îlun                                      mefa`îlun                                      fe`ulun

Bo minak:

Perêşanim lebo zulfi perêşant

Birîndarim be nûkî tîrî mujgant

pe      rê      şa      nim      le      bo      zul      fî      pe      rê      şant

U      -      -      -      U      -      -      -      U      -      -

mefa`îlun                                      mefa`îlun                                      fe`ulun

bi      rîn      da      rim      Be      nû      kî      tî      rî      muj      gant

U      -      -      -      U      -      -      -      U      -      -

mefa`îlun                                      mefa`îlun                                      fe`ulun

4- Hezeca heşt a exreb a mekfûf a meqsûr: 3 ,4 ,4 ,3 = 14 × 2 = 28 b.

Du Erûzên wê hene:

- Mehzûf (fe`ulun)



- Meqsûr (fe`ulan)

(mef`ulu/mefa`îlu/ mefa`îlu /fe`ulan    mef`ulu/mefa`îlu/ mefa`îlu /fe`ulan)

(- - U, U - - U, U - -U, U - -                      - - U, U - - U, U - -U, U - -)

Eva jêr mînakeke ji helbesta Kanî:

Emro çi 'eceb hatî lepêşm guzerit kird

Canim le beden cane beyek xemze dertkird

em	ro	çi	'e	ceb	Ha	tî	le	pê	şim	gu	ze	rit	kird
-	-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	U	-	-
	mef`ulu			mefa`îlu				mefa`îlu				fe`ulan	
ca	nim	le	be	den	Ca	ne	be	yek	xem	ze	de	rt	kird
-	-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	U	-	-
	mef`ulu			mefa`îlu				mefa`îlu				fe`ulan	

Eva jêr mînakeke ji helbesta Kanî:

Sedahuî wehşî nezer û mehweş û dildar

Sed xemzeî cadû perîefsungerî h'eyar

sed	a	hu	î	weh	Şy	ne	ze	r u	meh	we	ş u	dil	dar
-	-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	U	-	-
	mef`ulu			mefa`îlu				mefa`îlu				fe`ulan	
sed	xem	ze	î	ca	Dû	pe	rî	ef	sun	ge	rî	h'e	yar
-	-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	U	-	-
	mef`ulu			mefa`îlu				mefa`îlu				fe`ulan	

5- Hezeca heşt a musebbex: 4 ,4 ,4 ,4 - 16×2 - 32 b.

Du Erûzên wê hene:

-Musebbex (mefa`îlan)

-Tewaw- salim (mefa`îlun)

(mefa`îlun, mefa`îlun, mefa`îlun, mefa`îlan mefa`îulun, mefa`îlun, mefa`îlun, mefa`îlan)

(U ---, U ---, U ---, U --- U ---, U ---, U ---, U ---)

Ew “Kêş” bi sedema giraniya musebbexê ji “Kêş”a Hezec a tewaw tê cudakirin, ku di vêKêşê de xetên helbestê ji 32 birgeyan pêk hatiye, her beşek ji 16 birgeyan pêk hatiye bi awayê (4+4+4+4), ew qalib du Erûz tê de hene, (mefa`îlun, mefa`îlun, mefa`îlan) lê ji bo birgeyên kurt û dirêj her wekî hevdu ne.

6- Hezeca heşt a exreb a musebbex:  $3 \cdot 4 \cdot 3 \cdot 4 = 14 \times 2 = 28$  b.

Du Erûzên wê hene:

- Musebbex (mefa`îlan)

- Tewaw- salim (mefa`îlun)

(mef`ulu, mefa`îlun, mef`ulu, mefa`îlan mef`ulu, mefa`îlun, mef`ulu, mef`îlan)

(-- U, U ---, -- U, U --- -- U, U ---, -- U, U ---)

7- Hezecî heştî exreb:  $3 \cdot 4 \cdot 3 \cdot 4 = 14 \times 2 = 28$  b.

Du Erûzên wê hene:

-Musebbex (mefa`îlan)

-Tewaw- salim (mefa`îlan)

(mef`ulu, mefa`îlun, mef`ulu, mef`aîlun mef`ulu, mefa`îlun, mef`ulu, mef`aîlun)

(--\U U --- \ -- UU \ -- ---\U U --- \ -- UU \ ---)

8- Hezeca şeş a meqsûr:  $4 \cdot 4 \cdot 3 = 11 \times 2 = 22$  b.

Du Erûzên wê hene:

- Meqsûr (fe`ulan)

-Mehzûf (fe`ulun)

(mefa`îlun, mefa`îlun, fe`ulan                      mefa`îlun, mefa`îlun, fe`ulan)

(U - - -, U - - -, U - -                      U - - -, U - - -, U - -)

### **Duyem:Kêşa Remel**

Kêşa Remeldi bazineya Ferahîdî de ketiye bazineya sêyem de, Di nava bazineya xwe de bi sê caran (Fa`ilatun, Fa`ilatun, Fa`ilatun) hatiye, Lê di Kurdî de bi awayê çar tef`il jî hatiye, Kêşa Remeldi warê bikarhatina di helbesta kilasîk a Kurdî de di pileya duyem de ye piştî Kêşa Hezec, Lê di warê muzîkê de ji Hezecê bihêztir e(Hîwa Nûredîn Ezîz, 2016: 79). Peyva Remel di warê watayê ve pênaseyên cur bi cur jê re hatine kirin, bi sedema vê ku ewKêşgellek digel muzîkû stranê li hev tê, navê Remel li ser danîne. Herwaha (Remel cure stranek e ku li ser vêKêşê diçe) (Elxetîb Eltebrêzî, 1994:83).

Derheq bi helbestvanên Kurd, wan jî ewKêşa Remel gellek bi kar anîne, pîraniya helbestên xwe bi vêKêşê nivîsandine. EwKêşdi helbesta Kurdî de, di 15 qalibên curbicur de bi kar hatiye. Lê em dixwazin ku tenê bas ji hindêk ji wan bikin, bi taybetîKêşên carr (baw) ên Remel. Herweha wan mînakên helbestan jî em şirove bikin ku Kaniyê helbestvan diKêşa Remel de bi kar aniye, ew jîKêşa Remel ya Heşt Mehzûf û Remel a Şeş Meqsûr e.

1- Remelaheşt a mehzûf:  $4 \text{ , } 4 \text{ , } 4 \text{ , } 3 = 15 \times 2 = 30 \text{ b.}$

(fa`ilatun, fa`ilatun, fa`ilatun, , fa`ilun    fa`ilatun, fa`ilatun fa`ilatun, fa`ilun)

(- U - -, - U - -, - U - -, - U -                      - U - -, - U - -, - U - -, - U -)

Du erûzên wê hene:

-Mehzûf (fa`ilun)

-Meqsûr (fa'ilan)

Herwekî ku me got helbestvanên helbestên kilasîk ên Kurd piştîKêşa Hezec zêdetirKêşa Remel bi kar anîne, û her di vê derheqê deKanîjî wekî helbestvan ji hemanKêşê peyrewî kiriye, eva jî mînakek di helbestên wî de:

Xoy legel heq rêkî xist emma le Ella bu beriy

Hem le ehlulla berîbu kewte cennet cewheriy

xoy le gel heq rê kî xist em ma le el la bu be riy  
 - U - - - U - - - U - - - U -  
 fa`ilatun fa`ilatun fa`ilatun fa`ilun

hem le eh lul la be rî bu kew te cen net cew he riy  
 - U - - - U - - - U - - - U -  
 fa`ilatun fa`ilatun fa`ilatun fa`ilun

Eva jêr mînakeke din ji helbesta Kanî:

Ser fironakem bu 'alem çunke 'alî hîmetim

Naçiwênim bo hemû dunya le destim rexbetim

ser fi Ro na kem bu ha lem çun ke 'a lî hî me tim  
 - U - - - U - - - U - - - U -  
 fa`ilatun fa`ilatun fa`ilatun fa`ilun

na çi wê nim bo he mû dun ya le des tim rex be tim  
 - U - - - U - - - U - - - U -  
 fa`ilatun fa`ilatun fa`ilatun fa`ilun

2- Remela şeş a meqsûr:  $3 \cdot 4 \cdot 4 = 11 \times 2 = 22$  b.

Du Erûzên wê hene:

- Mehzûf (fa'ilun)

- Meqsûr (fa'ilan)

fa'ilatun, fa'ilatun, fa'ılan                      fa'ilatun, fa'ilatun, fa'ılan

(- U - -, - U - -, - U -                      - U - -, - U - -, - U -)

Eva jêr mînaekeke ji helbesta Kanî:

Aşinaiy çahî qelbe bê guman

Baş ekatin cumle esrary nîhan

a	Şi	na	iy	ça	hî	Qel	be	bê	gu	man
-	U	-	-	-	U	-	-	-	U	-
	fa'ilatun				fa'ilatun			fa'ılan		
baş	E	ka	tin	cum	le	Es	ra	ry	nî	han
-	U	-	-	-	U	-	-	-	U	-
	fa'ilatun				fa'ilatun			fa'ılan		

Her derheqKêşa Remel xeynî ên ku li serê de, me bas kirin, helbestvanên Kurd evKêş jî bi kar anîne: Remela heşt a meqsûr ‘Remela heşt a mexbûn a meqsûr ‘Remela heşt a mexbûn a mehzûf ‘Remela heşt a eslem a musebbex ‘Remela heşt a mexbun a eslem‘Remela şeş a meqsûr ‘Remela şeş a mehzûf.

### Sêyem: “Kêşa Serî”

Kêşa Serîdi bazineya çarem de ye piyên wê di bazineyê de ev in: (mustef'ilun,mustef'ilun, mef'ulat — mustef'ilun,mustef'ilun,mef'ulat). Bi awayekî giştî helbestvanên Kurd ew cureKêşbi kar anîne, lê bikaranîna van cureKêşan li çav wanKêşên Erûz ên ku me li serê de bas kirin kêmtir bi kar hatiye. Bi taybetî “Kêşên Hezec”, “Recez” û “Remel”. Derheq “Kêşa serî”i” cuda ji helbestvan Kanî, di vê serdemê de kêmtir ewKêşbi kar anîne. “Kêşa serî”i” hejmarek liqên wê hene. Ew liqên ku helbestvanên Kurd zêdetir bi kar anîne, ev in: Serî`i a şeş a meto a mekşûf, Serî`i a şeş a meto a mewqûf. Kanî di vê qadê de ew du cureKêşbi kar anîne:

1- Serî`i a şeş a metwî a mekşûf: dêre helbest e, di vê qalibê de 22 birge hene, wate her rêzedêrek (11) birgeya hene (3+4+4).

muftè`ilun, muftè`ilun, fa`ilun      muftè`ilun, muftè`ilun, fa`ilun.

(- U U -, - U U -, - U -      - U U -, - U U -, - U -)

Eva jêr mînakeke ji helbesta Kanî:

Gah degiryem û denalim gehî

Hîç le `îşiqt nebû qelbim tehî

ga	Hi	de	gir	yem	û	de	na	lim	ge	hî
-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	-
	muftè`ilun				muftè`ilun			fa`ilun		

hî	Çi	le	`îşi	qt	ne	bu	qel	bim	te	hî
-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	-
	muftè`ilun				muftè`ilun			fa`ilun		

1- Serî`i a şeş a meto a mewqûf: Dêrehelbest di vê qalibê de 22 b, wate her rêze dêrek (11, 4+4+3) b.

muftè`ilun, muftè`ilun, fa`ilan      muftè`ilun, muftè`ilun, fa`ilan.

(- U U -, - U U -, - U -      - U U -, - U U -, - U -)

Eva jêr mînakek e ji helbesta Kanî:

Dûrî derûnim le sema bo sehab

Xwênî sirşkim buwe seyl û hebab

dû	Rî	de	rû	nim	le	se	ma	bo	se	hab
-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	-
	muftè`ilun				muftè`ilun			fa`ilun		

xwê	Nî	si	rş	kim	bu	we	sey	l û	he	bab
-	U	U	-	-	U	U	-	-	U	-
	muftè`ilun				muftè`ilun			fa`ilun		

KomaKêşên Erûz ên bikarhatî li cem Kanî li gora vê xişteyê:

J	BEHR		QALIB	HELBEST	R. S
1	Hezec			22	%81
		1	Hezeca heşt a exrebî a mekfûf a mehzûf	13	%59
		2	Hezeca şeş a mehzûf	4	%18
		3	Hezeca heşt a tewaw	3	%13
		4	Hezeca heşt a exreb a mekfûf a meqsûr	2	%9
2	Remel				%11
		1	Remela heşt a mehzûf	2	%66
		2	Remela şeş a meqsûr	1	%33
3	Serî i				%7
		1	Serî i a şeş a metwî a meksûf	1	%50
		2	Serî i a şeş a metwî a mewqûf	1	%50
G	3		8	27	

## 2. 1. 2. Serwa

Serwa wekî aliyekî serekîa muzîka helbestê rol heye ku bi awayekî hevpar digelKêş, rola avakirina muzîka derve a her helbestekê dibînin, Ew du regez herdu jî tewawkerê hevdu ne, lewra hekî di helbestekê deKêşbi pîvanekirina awazekê bo helbestê ava kiribe, bi taybetî di helbesta kilasîkî de eva Serwa jî ji riya dubarebûna pîtan bi taybetî di dawîya dêrehelbestan de muzîkek dilrevîn û xweş bo muzîka dervey helbestê ava kiriye. (Serwa diyardeyeke muzîkê ye ku bend e bi dubarebûnê, wate dubarebûna pîta dawiyê di hemû dêrehelbestekê de) (Mihemed Riza Mubarek, 1983:179) aliyekî girîng a avabûna muzîka derve di dubarebûna pîtên dêrehelbestekê de çêdibe. (Serwa çend dengê in di dawîya nîvedêran yan jî dawîya dêrên helbestan de ku ducarî dibin) (Îbrahîm Enîs, 1952:244), bikaranîna van dengan ji aliyê helbestvan ve şîyan û kêrhatîbûna helbestvanê me nîşan dide,wate bi sedema bi karanîna peyv û pîtên ciwan û hemawaz di rêzehelbestekê de ciwaniya helbestê û awaza muzîka helbestê dilgîrtir û xweştir dike, lewra em dibînin ku muzîka helbestê ya helbestvanekî heya muzîka helbesta helbestvanêke din cuda ne, jiber ku çawaniya

bikaranîna Serwa ji helbestvanekê ve bo helbestvanekê din cuda ye, û muzîka her yek ji wan ji cuda derdikeve.

Herweha di warê zorî û kêmi a bikaranîna serwa di helbesta helbestvanên zimanekî heya zimanekî din de cudahî gellek heye, lê her ji demên zû ve, piraniya helbestvanên cîhanî, û bi taybetî helbestvanên Kurd, bo avakirina şêweyê ciwan a muzîkê di helbestên xwe de (xeynî kêşên erûzî) piraniya helbestvanên kilasîk hewl dane ji riya yarîkirina bi serwa saziyê û dengên serwa yê ve, muzîka helbestên xwe bihêz û balkêşbikin)(Hîwa Nûredîn,2016: 175). Her derheq ciwanî, û rengîniya helbesteke muzîkdar ve, Refîq Hilmî di pirtûka *şîrû Edebiyata Kurdî* de nivîsandîye;

Yên ku ji muzîkê têdigihîjinû şarezaiya wan li ser muzîka helbestê heye, dibêjin ku mirov wekî av û hewa hewcehiya wê bi mosîqayê heye. Ji kangeha dil ve li hemêberî dengan “meyl”ek heye ku nizane li ber çî ye? Girmîna evran û xurrîna avê û verîna pelgên daran, her yek ji wan bi awayekî kar lê dike... yek ji wan diveciniqîne, û dadixorpîne, û ya din laşê mirov dibizbizîne, yan jî dilê mirov ditevizîne, wate ji hinek dengan dilê mirov vediciniqe, û yan qahîm dibe, yan jî di hinekan de jî xweşiyek digihîjê, û vedigeşe. Îca edebiyat van cureyên dengan ji hevdu vediqetîne (1988, 166-167).

Herweha Ezîz Gerdî li *kêşnasiya Kurdî* de derheq serwa nivîsandîye ku; serwa pêk tê ji dubarebûna dengê yan çend dengan, û peyvekê di dawîya “misre`i” yan “bêytek”ê de. Serwa zêdetir di dawîya “misre`i”ê de tê. Lê dikare di nav de bê, Serwa navxwe, yan jî di destpêkê de Serwa ya destpêkê. Serwa dikare di pexşanê de jî hebe, wekî ku di pexşana serwadar de derdikeve (2014:269).

Li cem helbestvanên kilasîkî serwa yek ji mijarên herî girîng ên helbestê bûye, û helbestvanên kilasîk her tim hewl dane ku ji van destûr û yasan dernekevin, ku bo şêwaza nivîsandina helbesta kilasîkî hebûye, lewra çawaniya bikaranîna serwa li cem koma helbestvanan cuda ye. Di vî warî de (Hekî em li helbestvanên kilasîk ên kevn binêrin, em dibînin ku her ji destpêkê ve heya dawiyê bi yek serwayî helbestên xwe vehûnandine)(Jiwan Gerdî, 2018: 164).Di helbesta kilasîkî de li rex bikaranîna kêş, helbestvanan demeke zêde danîne bo avakirina serwaya helbestên xwe, bona vê ku muzîkek ciwan û dilgir bo helbestên xwe berhem bînin, bo avakirina



muzîkekciwan helbestvan hewl dide (xwe pêbend bike bona vê ku cureyek ji rêkxistin û guncanê çê bike, heya ku bikare muzîkekê bo peyva dawî xetan ava bike)(Şe`iban Selah, 2005: 11).

Girîngiya serwayê li cem helbestvanên kilasîk vedigere ser vê ku her helbestekê hewcehiya wê heye bi muzîkekciwan, û bi bê hebûna serwa di helbestê de muzîka helbestan vê ciwaniya xwe ji dest didin, û ew helbest rastî nivîşkanbûnekê tê, lewra li rex bikaranîna kêşê de serwa jî girîngiya xwe hebûye li cem helbestvanên kilasîk, bi taybetî helbestvanên Kurd. Her derheq avabûna muzîka dervey helbestê ku serwa tê de regezeke sereke ya avabûna vê muzîkê ye, jiber ku her serwa, (tirpe û awaza helbestê zêde dibe, û lengera şîpela dengên “bêytek”ê radigre, û dibe bi dengvedana dengê hevciwîn din ên nava heman xet û dengên din ên hevpar. Herweha dubarekirina deste dengê cure rîtmê awazê ava dike, bi taybetî di dema xwendina bideng de, ku pêdagirtin tê de ye li ser hilkişiyên û daketina awazê, û rûniştina li ser dengên hev serwa ên paşve)(Ezîz Gerdî, 1999: 39).

Derheq helbestvanên Hewlêrê û bi tabetî helbestvanên serdema Kanî hevşeweyê helbestvanên berî xwe, bi awayekî giştî du cure serwa (qafiye)yan, bi kar anîne, ku yek ji wan yekîtiya serwa û yê din jî serwa (qafiye)ya hemûreng e. Kanî a helbestvan jî di vê qadê de roleke girîng hebûye, û wî jî di helbestên xwe de peyrewî ji her yek ji wan du serwa yan kiriye, ku em hewl didin di xwarê de bi awayekî hûrtir zelal bikin.

Berî vê ku em bas ji her yek ji wan cureyên serwa yê bikin, em dixwazin ku hûrtir qise li ser serwayê bikin, jiber ku serwa hekî ew peyv be, yan ew deng yan ew çend deng be ku di dawiya “misre`i”a her helbestekê dubare be, yan hindek caran li nav de, yan jî li destpêka “misre`i”an derdikeve, eva dibêjnê serwa, lê sînorê serwayê li ser asta deng û peyv û herweha şeweya parvebûna serwa dîsan nîşaneyên berfirehbûna serwayê ye.

## **2. 1. 2. 1 Astên Sînorê Serwa**

### **1. Serwa Di asta Deng Da**

Elif- “Rewî”, dawî dengê peyva serwa ye, nabe tu morfemek yan zêdeyiyeke rêzimanî be, belku dibe ku esla peyvê be, dengdêra (e) nabe “rewî”, jiber ku bêhêz e, wê demê dengê pêş vê dengdêra kurt hesaba “rewî” li ser tê kirin, ku wateya “rewî” (Dawîdengê binçîneyî û peyva resen a serwa ye, û honrawe li ser tê avakirin)(Ezîz Gerdî, 1999: 112). “Rewî” yek ji wan dengên bandordar e ku di pêkhatiya serwa yê de roleke diyarîkirî heye bi taybetî bona avabûna rîtmê di serwayê de. Ew rola bibandor û diyar ya “Rewî” wisa kiriye ku gellek caran qesîde û xezel bi navê dengê “rewî” bê binavkirin, wekî qesîdeya “wawî” yan qesîdeya “Mîmî” ew yek jî, li ber vê ye ku qesîde û xezel yek cureya dengê rewî peyrew dikin, wate di qesîdeyekê de yan li xezelekê de li serve heya dawîya hemû “bêytek”ê de, yek cureya peyrewkirinê heye, û serwa jî yek cureya dengê “rewî” tê pêşkêşkirin.

Derheq bi pêşrewî û paşrewî ew e ku, hekî her morfemeke rêzimanî li pey “rewî” de hat, eva dibe “paş rewî”. Ku wate hekî serwa ji yek dengî zêdetir bû, ya ziyade jî li berahiyê bû, dibêjnê “pêş rewî”, ku di eslê peyvê de ye, û hekî li piştê bû, dibêjnê “paş rewî”, ku morfemeke rêzimanî ye. Di warê peyv û ronan ve peywendiya wan bi peyva serwa nine, dibe ku ziyade li pêşê û li pey “rewî” hebe (Ezîz Gerdî, 1999: 111-112).

B-“Pêş rewî”, ew deng e ku dikeve pêş dengê “rewî”, her du jî pêkve beşdar dibin di avakirina serwa yê de.

C-“Paş Rewî”, pêk tê ji dengdêra kurit, li pey “rewî”, yan ew morfema rêzimanî ku li pey peyva serwa yê tê.

Serwa Di Asta Dengê De		
Pêş rewî	Rewî	Paş rewî
dengdêra kurt	dengdêra dirêj	morfema rêzimanî
Yan dirêj	Yan dengdar	dengdêra kurt

## 2. Serwa Di Asta Peyvê Da

Di asta peyvê de digel peyva serwa, peyva “pêş serwa” (Hacib) heye, yan peyva “paş serwa” (redîf) heye, ew jî wekî serwa li her “bêyteke”e helbestê de, digel serwa de dubare dibin.

Elif-Pêş serwa(Hacib): Pêş serwa peyvek yan çend peyvek in, ku li her “bêyteke”ê li pêş peyva serwa dubare dibin, û herweha wateya wê naguhere, wateya her yek ji “pêş serwa”yan, heman wata ye, ku dubar dibin û dikevin pêş peyva serwa yê, Ew diyarde, wate “pêş serwa” li helbesta Erebi de diyar û berçav nine, yên ku gellek girîngî danê, helbestvanên neteweya Fars in, (Fars pêşeng in, di biyavê afirandina vê yekê de, û dibêjnê Hacîb) (Jiwan Gerdî, 2018: 198), Bi sedema vê ku pêş serwa roleke girîng heye di avakirina muzîka helbestê de, Helbestvanên Kurd jî, bi awayekî berçav kar di vî warî de kirine.

B-Paş serwa (redîf):Paş serwapeyvek e yan jî çend peyv in li paş serwa yêderdikevin, bi heman manayî dubare dibin, û nabe watayên wê ji xetekê ve bo xetêke din cudahî hebe, yan bê guherîn, jiber ku hekî wateya wê hate guhertin, wê demê diçe çarçoweya peyvaserwa de, û dibeserwa, wateserwa wek “paşserwa” namîne. “Paşserwa” (redîf) awazeke xweş bo helbestê ava dike, û deqa helbestê jî ciwantir dike, alîkareke baş e bo serwa û sedemek baş e, bona ragirtina muzîka“bêyt”ên helbestê, derheq bikaranîna “paş serwa” helbestvanên neteweya Fars ji helbestvanên din wekî Erebi û Tirk û Kurd zêdetir “paş serwa” bi kar anîne.

Serwa di asta peyvê de		
pêş serwa (hacîb)	peyva serwa	Paş serwa” (redîf)

Derheq bi derkevîna her yek ji peyvên “pêş serwa”, li “bêyteke”ê de, li çav peyva serwa cudahiyeke heye ku ew jî ew e ku (dibe ku di serwa de tenê peyva serwa hebe, yan peyva serwa û paş serwa (redîf) hebe, yan peyva serwa û “pêş serwa” (hacîb) hebe, yan peyva serwa û “paş serwa” û “pêş serwa” her sê jî hebin, wate dibe ku peyva serwa her hebe, lê ên din dikarin hebin, û dikarin tunebin, Serwa bi bê peyva serwa ava nabe)(Ezîz Gerdî, 2014: 278).

Paş serwa (redîf) gellek caran wekî rîtmekê, muzîkekciwan bo serwa û koma helbestê ava dike, û cihê balkêşana helbestvanan e, jiber ku “paş serwa” bi sedema

cihê xwe, ku dikeve paş serwa yê, nîşaneke zeq û berçav e, ciwaniyê dibexşe şêweya derve ya helbestê, û helbestvan jî her yek ji wan ji aliyê xwe ve girîngiyeke zaf danê, û bûye nîşana şiyani û kêrhatîbûna helbestvan. “Paş serwa” li gel serwa de xaleke girîng ya pêkve girêdana “bêyt” ên helbestan e, û di biyavê demê de balansa dem û wextê “bêyt”an radigre. Di warê watayê de erk û wezîfeya tewawkirina wateya “bêyt”an digre stûyê xwe, di warê kêş de jî, “bêyt” hewcehiya wê pê heye, û herweha roleke girîng heye di cudakirina xezel ji qesîdeyê, Jiber ku “paş serwa” (redîf) zêdetir digel xezel, du beyt, û çarîne tê, Gellek bi kêmî digel qesîdeyê tê. (Hîwa Nuredîn, 2016: 177).

## 2. 1. 2. 2. Cureyên Serwa

### 1. Yekîtiya Serwa

Yekîtiya serwa: Serwaya yekgirtî ew cureyaserwa ye ku hemû “bêyt”ên wê, bi awayekî stûnî bi yek şêwe serwayê bi dawî hat, û cure yekgirtineke hevşêweyî nîşan dide. Serwaya yekgirtî digel vê yekgirtinê de muzîkek ciwan dibe helbestê, Ya ku tê têbînîkirin ew e ku ew cureyaserwayê zêdetir di helbesta helbestvanên kilasîk de tê xûyakirin, herweha em dikarin bêjin ku ewserwa di eslê xwe de ya helbestvanên Kurd nebûye, (yekîtiyaserwa yê şêweyek e ku ji erebî ve hatiye wergirtin) (Meirûf Xeznedar, 1962:58). Lê helbestvanên Kurd gellek jîrane hewldane ku bînin nava helbesta Kurdî de, û bo avakirina muzîkan li dervey helbestên xwe qazancê lê bibînin. (Xelkê jî hez dikirin ku di serwa yan de regeza dengê wekhev zêde bi kar bînin)(Kemal Xembar, 1980:36), Jiber ku di yekîtiya serwayê de xeynî vê ku muzîkekxweş heye, hebestvan formeke ciwan a stûnî bo helbesta xwe ava dike. Kanî ê helbestvan jî di vê qadê de wekî helbestvanekî kilasîk rola xwe lîstiyê, û çend mînakê di vî warî de pêşkêş kirine, ku ya jêr, yekek e ji mînakên yekîtiyaserwayê, ku tê de hatiye peyrewkirin:

Helbesta (Serifronakem)

*Serifronakem bo 'alem çunke 'alî hîmetim*

*Naçwênim bo hemû dunya le destim rexbetim*

*Nabme saîl le 'alem saîle 'alem bexwa*

*Îzetî nefsim heye nallême hatem qîbletim*

*Min ke razîbûm bekem nabim le şahnişahî kem  
Ger nekem şekwayî halm kê dezanî zilletim  
Sîm û zerr ger çim nebê emma dlim mustexinye  
Şahîde asarekem me'lûm eka mahyetim... (Kanî: 27)*

### Helbesta (Perêşanim)

*Perêşanim lebo zulfî perêşant  
Brîndarm be nûkî tîrî mujgant  
Le mindallîwe dill qeydulheyat bende  
Esîre wa lenaw çahî zenexdant  
Berrayî be'zê detpirsî le ehwallm  
Nemawe çawekem bo lutfî carant  
Ne emrro ruhekem mecnûnî tom leyla  
Ser û mallm demêke buyte qurbant... (Kanî: 46)*

### 2. Serwaya Hemûreng

Serwaya çendreng hokar û sedemek e bona avakirina muzîkek çendreng bo rûçik û rengûrûyê dervey helbestê, ew cure ya serwa yê pêk tê ji dubarebûna dengê yan zêdetir ji dengê ku di dawiya “bêytek”ê de derdikeve, lê ew dubarebûn merc nine ku li koma “bêyt”ên helbestan de hawşêwe bin, jiber ku li serwa ya hemûreng de helbestvan azad e li her dêre helbestekê de serwa ya cuda û çendreng bo helbesta xwe bi kar bîne. Bi vî rengî muzîkek çendreng û ciwan di helbestê de kom dibe, û her “bêytek” bi henaseyê cuda ji “bêyt”ên din muzîka helbestê xweştir pêşkêş dikin, û muzîkeke rengareng tînin qadê, Ew cureya serwa yê xeynî vê ku helbestvanên kilasîk bi kar anîne, helbestvanên nû jî vê cureya serwayê bi kar tînin. (Helbestvanên nû lewra peyrewiyê dikin ji vê cureya serwayê bona vê ku hest û soz û diyardeyên derûnî bi awaz û rîtmekê nû watayêke tewawbigehînin bermaberî xwe)(Jiwan Gerdî, 2018:169).

Serwaya çendreng biyav û rewş bo helbestvan xweş kir, bona vê ku êdî xwe li serwaya stûnî û yekîtiya serwayê de nehêlin, jiber ku gellek caran bo nivîsandina helbesteke stûnî (yekîtiyaserwayê) helbestvan naçar bûye hawara xwe bibe ber bikaranîna deng û peyvên ne di cihê xwe de, bona vê ku yekîtiya serwa di helbestan de biparêze, û hewceyên serwayê pê teji bike, dîsan jî ew yek tenê sedema avabûna

serwaya çendreng nine, jiber ku bêyt û deb û helbestên folklor ên Kurdî her di serdemên kevnar de jî hebûne, û piraniya herî zaf ya wan jî bi awayê serwaya çendreng hatine gotin. Lê em dikarin bêjin ku serwa ya hemûreng derfeteke baş bû, bo helbestvanên Kurd, jiber ku helbestvanên kurd ji vê riyê ve karîn ku sanahîtir û baştir helbestên xwe vehûnin, û riyê baş ya afirandina serbest ji bo wan çêbû. Serwaya hemûreng (Asoyêke wisa li pêşberî helbestvanan daniye ku bikarin bi awayekî seribest danûstandinê digel qafiyê de bikin)(Dilşad Elî, 2007: 221).

Derheq biserwaya hemûreng Kanî ê helbestvan di vê qadê de çendîn şêwe û serwa yên cuda di helbestên xwe de bi kar anîne, û hewl daye ku bi bikaranîna serwaya hemûreng muzîkek balkêş bo helbestên xwe ava bike, û bibin cihê girîngîdana xwîner û biserên helbestên xwe. Em jî hewl didin ku di jêr de çend mînakên cuda ji helbestên Kanî ku bi awayê serwa yên cuda hatine nivîsandin, bixin ber bas:

#### 1-Tekserwa:

Tekserwa “bêyt”êke serbixwe ye, ku ji du “misre`i, xişte”yan pêk tê, û tekserwa a serbixwe heye, û di warê gotinê de, ew “bêyt” wateya tewaw û serbixwe heye, lewra (ew cureya serwa yê dibêjnê tak serwa, wate tenê yek peyvî, serwa ya “bêyt”ê ragirtiye)(Hîwa Nûredîn, 2016:182). Bi awayekî giştî serwa ya helbestê zêdetir li cem helbestvanan bi awayekî hatiye nivîsandin, ku ew jî serwa ya wê bi vî rengî ye, (AA), lê hinek ji helbestvanan cureyêke din jî bi kar anîne, ku serwaya wê bi vî rengî ye, (AB). Kanî ê helbestvan ji helbesta tak tenê peyrewiya şêweya serwa ya yekem kiriye, wate serwa ya wê bi vî rengî bi kar aniye (AA). Bo mînak:

*Sahêbî sê şit qet nadîm nabê*

*Fikr û emel û qiseşî çabê(Kanî:59)*

Peyva serwa di vê “bêyt”ê de (Nabê, Çabê) ye, û herweha dengê rewî (B),pêş rewî(A), û paş rewî (Ê) ye, bi vî awayî helbestvan kariye ku muzîkeke ciwan bo her du (misre`i, xişte)yên helbestê ava bike, û koma “bêyt”ên helbestê bibe cihê baldana xwîner.

#### 2-Cotserwa (Mizdewîc):

“Cotserwa” yan heman “mesnewî”, pêk tê ji vê cureya ku her du (misre`i, xişte) xwediyê yek serwayê bin, û pêwendiya wan bi (misre`i, xişte) ên din ve nebe. Wate di van cureyên helbestê de her du (misre`i, xişte) xwediyê yek serwa ya taybet bi xwe ne, û helbestvanan qazanc ji vê cureyê dîtine. Jiber ku azadiyeke reha ji bo helbestvan pêk hatiye, bona vê ku bikare bi hêsanî û ciwantir helbesta xwe vehûne, û bergeke muzîka ciwan bi awayekî hêsan ji bo “misre`i”an ava bike.

Ew cureya helbestê pêştir bi awayekî berfireh di şêwezaren Goran, herweha helbestên folklor, Destan û mijarên ayînî bi kar hatiye, (nêzî tewahiya helbestên bi şêwezara Goran û hemû Destanên muzîkê dabeşbûna wan ya serwa yê b awayê mesnewî ye) (Ezîz Gerdî, 2014:284). Fars di vehûnandina helbestên dirêj de girîngiyeke zêde dane van cure serwa (qafîye)yan, ( Di bingehe de ew cure helbest li cem Farsan serî hildaye, û piştê çûye nava helbestên Erebi û Erban navê Mizdewîc li ser danîne) (Se`id Şêx Biznî, 2011:122). Cotserwa yan mesnewî li cem helbestvanên Kurd cihê baldanê bûye, û piraniya helbestvanên Kurd ew cureya helbestê bi kar anîne, (serwaya mesnewî piştî nûkirinê a helbesta Kurdî ji aliyê helbestvanan ve bi awayekî berçav hatiye bikaranîn) (Jiwan Gerdî, 2018: 172). Kanî ê helbestvan wekî piraniya helbestvanên Kurd, di helbestên xwe de peyrewî kiriye ji şêwaza bikaranîna cotserwa yê di helbestên xwe de. Bo mînak di helbesta (Xeyaleke Îmandarane) de dibêje:

*Her lebinî pêm heta mûy serim*

*Xerqî gunah bûm nemdekird şerim*

*Misalî mecnûn bê ser û saman*

*Degeram sersam le deşt û kêwan* (Kanî: 32)

Di vir de her yek ji “bêyt”an, serwa ya xwe ya cuda hene, û di du “misre`i, xişte”ên yekem de, serwa pêk tê ji (Serim, şerim), herweha di du “misre`i, xişte”ên duyem de, serwa pêk tê ji (Saman, Kêwan), Kanî bi vî rengî bi awayê cotserwa (cotqafîye), vê helbesta xwe didomîne, û heya ku digihîje dawiya her “bêyt”ekê, û bi serwa ye ke cuda vedihûne.

#### 1- Serwa ya Çarîne

Serwaya Çarîne ew hunera helbestê ye ku ji çar (misre`i, xişte)yan pêk tê, yan baştir e ku em bêjin ku hejmarek “bêyt” in ku her yek ji wan ji çar (misre`i, xişte)yan

pêk tê, û kêş û serwa ya taybet bi xwe hene, û ew huner ji aliyê helbestvanên kilasîk ve bo mebestên taybetî tê eyankirin, wekî sofizim, dildarî, felsefe, mey, û meyxane, pend û qiseyên nesteq, lê bo helbestvanên nû û di edebiyata taze de ew huner bo (armanca siyasî, û rexneya civakî, tê bikaranîn) (Marif Xeznedar, 2011:162).

Di çarîne de serwa ya “misre`i”an bi vî rengî dibe (AABA), wate pişka yekem û duyem û çaremserwa ya wan wekhev e, lêserwa ya pişka sêyem cuda ye û azad e, û dibêjne vê “çarîna natewaw”. Ew serwa ya di çanda edebiyata cîhanî de dibêjnê (serwaya xeyamî), li ber vê ku gotina yekem kes Xeyam bi kar aniye, (lê di rastî de dibe bêjnê “serwaya Tahirî”, jiber ku Baba Tahir, sed salî zêdetir berî xeyam bi kar aniye)(Ezîz Gerdî, 2014:287).

Herweha şeweyeke din ji çar beytî ku ew jî serwaya wê her “çar misre`i”yên wê wekhev in, wate hêlkarî ya serwa (qafiye)ya “bêyt”ên helbestan bi vî rengî ye (AAAA), ew yek jî dibêjnê çarîneya tewaw, li gora hindêk çavkaniyan be (ew hunera helbestê hunereke farsî ye, û di kevn de li ser kêşa (La hewle we la quwete êla billah) bûye) (Goran Soran, 2006:98). Lê helbestvanên Kurd bona bikaranîna vê cureya serwa yê mifah ji yek ji “kêş”ên erûz wergirtine. Nivîsandina helbesteke çarîn wek vê ye ku helbestvan bixwaze ava deryayekê bîne û di avxorekê (perdaxekê) de cî bike. Ew yek jî li gora kêş û zimanê xwe du cur e: Ruba`î û du beytî. Mînak jî wek “çarîn”ên Baba Tahir Hemedanî, û “roba`iyat”ên Xeyam û çend mînakên din. Mînaka serwaya çarîn a tewaw (AAAA) di helbesteke Kanî de:

*Sed ahuy wehşî nezer û mehweş û dildar*

*Sed xemzeyî cadû û perî efsûngerî eyyar*

*Sed saqîy saxir be kef û nêrgz û xumar*

*Heryekê bes şewe bika husnî xoy îzhar...(Kanî:49)*

Kanî di vê helbestê de hemû kople ên çarîne bi awayê serwa ên çarîne ên tewaw nivîsandine, wate her kopleyekê şewe “qafiye”yek heye, lê “qafiye”ya (misre`i, xişte) a her çarîneyekê bi vî awayî ye (AAAA), Di vê çarîneya serê de jî peyva serwa pêk tê ji (dildar, eyar, xomar, îzhar), serwaya helbestê jî ji dengê (ar) pêk hatiye.

Kanî ê helbestvan xeynî hunera helbestê a çarîneya tewaw, hunera çarîne ya netewaw jî bi kar aniye, huneraserwa ya çarîneya netewaw pêk tê ji serwaya pişka



yekem û duyem û çarem ku wek yek be ûserwa ya pişka sêyem cuda ye, bo mînak hêlkarî a wê weha dibe (AABA), piraniya helbestvanên Kurd bi taybetî helbestvanên kilasîk ew cureya hunerê di helbestên xwe de peyrew kirine, eva jêr yek ji mînakên helbestên Kanî ne ku bi awayê çarîn a netewaw hatiye vehûnandin:

*Bulbulî naw rezanim*

*Nale û fixan dezanim*

*Beharim be xar royî*

*Zû hat wextî xezanim...(Kanî: 51)*

Peyvên serwa ewin:(Rezanim, Dezanim, Xezanim) serwaya pişka sêyem azad e, peyvên ferhengî ênserwa pişka yekem û duyem û çarem pêk tên ji (zan), pêşserwapêk tê ji (re, de, xe), paşserwa(redîf) pêk tê ji “cînava likaw”a(m). Herweha “rewî” pêk tê ji dengê (n), “Paş rewî” pêk tê ji dengê (m) û “pêş rewî” pêk tê ji dengê (a).

Derheq bi hunera helbestê ya çarîn û çar xiştekî ku her du jî di biyavê (misre`i, xişte) de wek hevûdin in, herweha di warê wergirtina şêwaza serwa wek hevdu ne, wate ew du huner gellek têkel in û di gellek ciyan de wek yek hesab ji wan re tê kirin. Lê li gora hindêk lêkdaneweyan be, ew yek ji me re eşkere dibe, ku çarîn yekeyeke serbixwe heye, lê çar xiştekî serbixwe nine, helbesteke dûr û dirêj e, û hatiye parvekirin bi ser çend bendan de hekî her bendek jî heya radeyekê wateya wê ya serbixwe hebe, lê dîsan her hemû pêkve di çarçoweya watayî de ne, û pêwendiya wan bi hev re heye, ku wisa bû, çarîn cuda ji çar xiştekî heya radeyekê hunereke serbixwe ye, û muzîkek a taybet bi xwe heye.

## 2-Pênc xiştekî

Pêk tê ji hunereke helbestê, ku helbestvanek du “misre`i, xişte”ên helbestên helbestvanekî têkel bi sê “misre`i, xişte” ên helbesta xwe dike, û koma “misre`i, xişte”an dibe pênc “misre`i, xişte”, û kopleyeke pênc “misre`i”î lê ava dibe, û dibêjnê pênc xiştekî. Li kopleya yekem her pênc “misre`i, xişte” xwediyê yek cure serwa ne, li kopleyên din de çar “misre`i, xişte”ên yekem li ser yek serwa yê ne, û pişka pêncem li serserwa ya kopleya yekem pênc xiştekî ye, wate bi vî rengî: (AAAAA, BBBBA, CCCCA).

Kani yê helbestvan li ser şêweya hunera pênc xişteki helbest nivîsandine, û di mînaka jêr de Kanî mifah ji helbesta helbestvaneke Fars wergirtiye, bi navê (Mesîha) ku helbestvanekî navdar ê Îranî ye. Kanî li gora sîstema pênc xişteki du “misre`i, xişte”ên helbesteke Mesîha wergirtiye, û digel sê “misre`i, xişte”ên xwe têkel kirine, û pênc xişteki jê dirust kirine, û eva jêr beşek e ji mînaka pênc xişteki a Kanî li ser helbesta Mesîha:

*Her çend ekem ae û fixan, nallew firyad*  
*Bo şewqî cemalt dill û canim buwe berbad*  
*Şahim! Le temennay wîsalt hene dilşad*  
*(Sirwe û semin û yasemîn û 'er'er û şemşad*  
*Kuştend feday qed dilcuy tu her penc) (Kani: 63)*

### 3- Serwa ya Şeşîne

Şeşîneparçeyek e ji şeş “misre`i, xişte”an pêk hatiye. Parvebûna wê, serwa (qafiye)yên curbicur hene, (qalibê herî carr û naskirî a şeşîne di edebiyata Kurdî de ew e ku çar kerên (pişkên) pêşê li ser yek serwa û du kerên paşiyê, li ser serwayeke din dibe) (Ezîz Gerdî, 1999:227), wate du cureyên serwa (qafiye)yê hene, çar let (pişk)ên destpêkê serwa yek e, û du pişkên dawiyê jî serwa yek din e. Xeynî vê sîstema serê çend sîstemên din jî hene bona vê ku serwaya şeşîne li ser bê avakirin lê a herî carr ew bû ku me bas kir, Kanî ê helbestvan li yek ji helbestên xwe de ew serwa bi kar aniyê, eva jêr mînaka serwa ya şeşîne ya Kanî ê helbestvan e:

*Gah degiryem denallm gehî*  
*Hîç le 'îşqit nebû qelbim tehî*  
*Çend be wîqarî weku şahenşehî*  
*Tabî'e ruhim le bo emir û nehî*  
*Ah mnel 'îşiq we halatîhî*  
*Ehîriqû qelbî bîheraratîhî!!...* (kanî: 53)

## 2. 2. MuzîkaNavxwe

Muzîka navxwe digel muzîkaderve du bingehên sereke ne bona pêkanîna muzîkahelbestê, her yek ji wan ji aliyê xwe ve rola xwe ya taybet û diyar hene di deqa helbestê de, (helbest wekî hêza bibandor e, şêwe û naweroka wê tu carî ji muzîknahê qutkirin) (Xorxî Lwîs, w: Salh `Elmanî,2007:109). Derheq bi muzîka navxwe de bandora wê di nva helbestê bixwe de ye, wata pêwendiya wê bi naweroka deng û peyv û destewaje û riste û koma naweroka helbestê ve heye, wate muzîkanavxwe di encama dubarebûna dengdêr û bêdeng, hilbijartina cureya peyvan, dubarekirina wan, û lîstina bi peyvan ku her hemû jî bi hev re nîşanderê derûna helbestvanan in, û dixin rex hevdu, wate hemû jî bi awayekî ciwan li rex yektir têne rêkxistin, û helbesteke ciwan û berhemdar jê çê dibe.

Ew yek jî vê rastiyê nîşanî me dide ku muzîkanavxwe pêwendiyek reha û tewaw bi kûrahiya derûna helbestvan bi xwe ve heye, wate bi jêhûrbûna li muzîka navxwe ya helbestê, derûna helbestvan ji me re eşkere dibe, ku di çi rewşeke derûnê û civakî de ye, jiber ku pêwendiya muzîkanavxwe zêdetir pêwendî heye digel pêkhateya nav helbestê bixwe, ku ew jî bi dubarekirina deng û peyv û destewaje û hunera ciwankariyê dest pê dike, muzîkanav helbestê roleke girîng heye di pêkanîna rîtm helbestê de, ew rîtm jî bingehê wê ya cihgir tune, û çendîn diyarde di avakirina wê de beşdariyê dikan, ku her yek ji wan rîtm bandore wê ya berçav heye di avakirina deqeke helbesta ciwan de.

Muzîka navxwe wekî aliyekî girîng beşdariyê di deqa helbestê de dike, û li cem wê girîng nine ku ew helbest kêş û serwa heye yan kêş û serwa tune, lê hekî digel deqekê de kêş û serwa derket, wê demê rîtm muzîkê çêtir e, li çav vê ku hekî helbest xwedî kêş û serwayeke baş nebû, wê demê rîtm, xawtir dibe, jiber ku rohn û eşkere ye ku rîtm û kêş pêkve di helbestê de dikarin ku hevdu tewaw bikin, ne rîtm bi bê kêş, û ne jî kêş bi bê rîtm nikarin kinkeke ciwan bikin ber deqên helbestê de, lewra bandora rîtmê bi ser kêş eşkere ye, û kêş jî bi bê rîtmê bêruh e. Rîtm dikare ruh û şiyane bide kêş ê. Xeynî vê yekê muzîkanavxwe pêwendiyê nerasterast bi derûna helbestvan bixwe ve heye, pêwendiya helbestvan û rîtmê li deqên helbestê de xuya dike, (warê derûnê a helbestvan û rabûna hesta navxwe ya wê, pêwendiyê zaf bi rîtm û muzîka xwezayî ya vê rîtmê ve heye, ku di nav de hukmê helbestê dike, û

aliyê eşkere û veşartî ê testkirina helbestê dike, û aliyê eşkere û veşartî ê testkirina helbestê bi rengê xwe dineqîşîne), rîtm dikare ruh û şîyanê bide ber kêşê, xeynî vê jî muzîka navxwe pêwendiyê wê ya rasterast bi derûna helbestvan bixwe ve heye, pêwendiya helbestvan û rîtm ji deqên helbestê de xûya dibe, (biyavê derûniya helbestvan û livlivîna hesta nav de ya wê pêwendiyê zaf heye bi rîtm û muzîka xwezayî ya vê rîtmê, ku di nav de hukmê bi ser helbestê de dike, û aliyê eşkere û veşartî ê testa helbestê bi rengê xwe dineqîşîne (Ezîz Gerdî, 1999:77).

Derheq bi dîroka muzîkanavxwe em dikarin bêjin ku tişteke nû ye, jiber ku li rexneya kevn de tişteke wisa nehatiye baskirin, lê di rexneya nû de bûye cihê girîngîdana rexnegiran, herweha bo lêkolîn û nirxandina helebestekê li niha de li rexvê ku bas ji muzîkaderve tê kirin, bêguman bas ji muzîkanav de ya helbestê jî tê kirin, wate bo serdema nû muzîkanavxwe de girîngiyê zaf pê tê dayîn, jiber ku niha bo diyarîkirina buha û nirxa deqê helbestê, muzîkanavxwe yek ji fakterên sereke ên diyarîkirina asta deqê ye.

Li gora rexnegiran be, zaraweya muzîkanavxwe zaraweyê nû ye, lê li rexneya Erebi de bi taybetî di van lêkolînan de, ku bo rewanbêjî hatine kirin, piraniya wan li derdora rîtma navxwe dizivirin, ew yek jî tê wê watayê ku li cem rexnegirên kevn jî bi taybetî di edebiyata Erebi de, lêkolîn li ser wê mijarê hatiye kirin, lê negihaye wê asta niha ku bo muzîkanavxwe ya helbestê tê kirin, jiber ku li cem rexnegirên niha li gel ya ku di warê rewanbêjî de li muzîkaderve tê hilkolîn, ew aliyê taybet bi muzîkanavxwe ya helbestê girîngî bi van tê dan, ew jî wekî: regezdozî, dijiyek, beramberî, ciwaniya bays, tîlnîşan, peyva hewkêş û hev serwa û herweha dubarekirin... û hwd (dubarekirin li rexneya nû de, wekî diyardeyê şewazgeriyê lê tê nihêrîn, di vehûnandinê de bi armanca pêdagirtina wate û çirrkirinê tê bikaranîn, lê digel vê jî biyaveke ciwankirinê dide deqê (Usman Deştî, 2012:183).

Helbestvanên Kurd bi helbestvanên kevn û nû ve jî hertim girîngî dane muzîkanavxwe ya helebestên xwe, hêz û şîyana her yek ji wan jî vedigere ser wê girîngîpêdanê, jiber ku helbesta her helbestvanekî raya helbestvan bi xwe ye, bi taybetî bi hûrbûna li muzîka navxwe de ya helbestê, ji me re eyan dibe, ku helbestvan di dema nivîsandinê de, di çî asteke derûnî de bûye, heya çend kariyê xwe nîşan bide,

û hest û soza xwe ya derûna xwe bi çi cure deng û peyv û risteyê di helbesteke muzîkdar de kom bike.

Di vê qadê de Kaniyê helbestvan xwediyê behre û şiyaneke gellek baş bûye, bi sedema şiyânên xwexeynî vê ku helbestên xwe bi kêş û serwa eke ciwan xemilandiye, di nav helbestên xwe de jî teknîka ciwanî û dubarekirin û bikaranîna muzîka navxwe ya wê di asteke baş de ye. Muzîka navxwe ya helbestên wê nîşanderê derûna wî bixwe ye, û bi taybetî ew cih û serdemê ku wî tê de jiyan kiriye, hewl daye ku xweşî û nexweşî û jiyana wê demê ya xwe û derdora xwe, bi helbestên muzîkdarnîşan bide, em jî hewl didin ku herin nava naweroka helbestên wî de, û bi awayekî hûr derheq muzîkanavxwe ya helbestên wî lêkolîn bikin.

### **2. 2. 1. Dubarekirin**

Yekek e ji regezên herî diyar û xûya ku dibe sedemek bona bihêzkirin û avakirina muzîkanavxwe ya helbestê, wekî pêkhatyeke helbestê rola xwe heye di dewlemendkirina rîtma helbestê, jiber ku bi dubarekirina deng û peyv û destewajeyan, rîtma helbestê bihêz dibe, û di encam de muzîkek ciwan ji bo “bêyt”ê tê gorê. (Di hemû dubarekirinê de xeynî bihêzkirina watayê, muzîk jî mil bi milê watayê dilivlive, ewyek jî di encama dubarekirina awaza deng e, û dubarekirin pêwendiya bihêz jî heye bi watayê ve) (Hîwa Nuredîn, 2009:19). Dubarekirin hem di bihêzkirina muzîkanavxwe û hem jî di ciwaniya watayê de roleke girîng dilîze, wate di vir de pêwendiya dubarekirinê pêwendiyêke du alî ye, Ew yek jî nîşana vê ye ku bandora dubarekirinê li ser helbestê di pileyêke reha (mutleq, tewaw) de ye, lewra jî rîtma muzîkaderve û herweh rîtma muzîkanavxwe her du jî piştî xwe bi dubarekirinê ve girê didin. Jiber ku çend zêdetir dubarekirin di helbestê de hebe, ewa rîtma muzîkê ji helbestê bihêz dibe.

Diyardeya dubarekirinê bi awayekî diyar di helbest kilasîk de tê dîtin, Helbestvan hewl dide ku ew diyarde li her yek ji: deng , peyv, riste, “bêyt” û paragirafê de bi kar bihêt, lewra her helbestvanekî karîbe bi awayekî baş diyardeya dubarekirinê di helbestan de peyrew bike, ew helbest dikeve xaneya muzîkeke ciwan, û dema ku em guhdarî helbestê jî dibin, em hest bi hesteke xweş dikin ji guhgirtinê, lê hekî helbestvan nekare dubarekirinê bi awayekî baş peyrew bike, wê demê helbest nivîşkaniyek di muzîkawê de çê dibe, wê demê di guhgirtinê de jî hest bi tişteke

nexweş nakî, di dubarekirinê de (giraniya bikaranînê dikeve ser çawaniya bicihkirina wê di nava deq de, nek çendatiya wê, Di vî warî de jî destrengînê û lêzanîna nivîskar derdikeve, ku heya çend deq xemilandiye, û digel wateya wê de li hev tê, û diyardeya herî pirrbandor ji xwîner re veguhastiye) (Hêmin Umer, 2008: 42). Lewra dibehelbestvan bi girîngî ve li wan cure deng û peyv binêrin ku bo dubarekirinê di helbestê de bi kar tên, ew yek jî vê rastiye eyan dike ku du cure dubarekirin di deqên helbestê de hene, ew jî dubarekirina bimifah û dubarekirina bêmifah in. Dubarekirina bimifah ewe ku watayek hebe, û bêmifah ew e ku tu wtayeke wê tunebe) (Jiwan Gerdî, 2018: 213).

### 2. 2. 1. 1. Dubarekirina Dengê

Dubarekirina deng bi armanca avakirin û girîngîdana zêdetir ya helbestvan e bi muzîka navxwe, û di dubarekirina deng de helbestvan radibe bi çendîn carî dubarekirinaçend tîpên (dengdêr û bêdeng), di nav peyv û “bêyt” û heya ku digihîje helbestê bi giştî, û çend caran dengê dubare dibe, û dibe sedema pêşkêşkirina muzîkeke ciwan bo helbestê, û ragirtina hevsengiyê di “bêyt”ê de. Lewra heya dubarekirina dengan hejmara wan zêdetir be, muzîkahelbestê ciwantir û qahîmtir dibe, ku wisa bû dibe ku helbestvan bi awayekî endazyarane hewl bide, bo parvekirina deng û dubarekirina wan, ew yek jî asta zîrekî û hunerî ya helbestvan nîşan dide, ku çawa bikare parvekirinê weha rêk bixe, ku bibe cihê bala hesta xwîner û aliyê ciwanî û muzîka helbestê.

Dengan bi awayekî giştî cure cudahiyek di navbera wan de heye û her dengê komek taybetmendiyan xwe hene, û taybetmendiya wan jî vedigere ser bigurrbûn, bêdengbûn (kip), nazikî, kurtî, dirêjî û tundî. Hemû ew cudahiyan ku di navbera dengan de hene, hekî helbestvan bikare parvekirin û dubarekirina hunerî darêje, eva dikare muzîkek a baş û balkêş jî jê berhem bîne. Di vê derheqê de helbestvan huneriyane rabûye bi dubarekirina dengan di nava helbestê de, ku ew yek jî bûye sedema vê ku muzîkahelbestê pê ciwantir bike, û bo vê meremê jî di cureya dubarekirina dengan de di helbesta Kanî de em çend mînakên werdigrin, wek ên jêr:

Yekem, dubarekirina dengdêran:

Pêk tê ji dubarekirina çend dengdêran di nava “bêyt”êke helbestekê de, ku bi armanca avakirina muzîkahelbestê ya navxwe dubare dibin, (dubarekirina dengdêrê, îca her dengdêrek be, û li her cihekî “bêyt”êke helbestê hebe, girîng ew e ku dengên dubarebûyî bi hev re bin, yan li nêzî hev bin, bona destberkirina bandora muzîkê) (Jiwan Gerdî, 2018:217). Derheq bi rîtma muzîkê di dubarekirina dengdêrê de cure cudahiyek heye, ew jî vedigere ser dengdêra kurt, û dengdêra dirêj, dengdêra dirêj herçend zêdetir bi kar bihêt, û zêdetir dubare bibe, cur xawbûnek di muzîkaya helbestê de pêk tê, lê dengdêra kurt bi dubarebûnê, gotina helbestê tundtir dikin. Kaniyê helbestvan bi sedema dubarekirina dengdêrê kariye ku muzîkek a ciwan bo “bêyt”ên helbestan ava bike, bo mînak di vir de dibêje:

*rehmit nî ye giwê nadeye xo girye û şînim  
mirwet bike zalim wekû birdit dil û dînim* (Kanî:57)

Di vê “bêyt”ê de (8) çaran tîpa dengdêr a kurt a (e) dubare kiriye, (6) çaran dengdêra dirêj a (î) dubare kiriye. (5) çaran dengdêra (u) a kurt dubare kiriye. Bi vî rengî jî eşkere dibe ku zêdetir dengdêra kurt dubare bûye, û bi vî rengî muzîkahelbestê cureyek tundî pêwe diyar e.

Duyem: Dubarekirina tîpên bêdeng

Ew yek pêk tê ji dubarekirina çend çaran ya tîpên bêdeng di “bêyt”êke helbestê de, ew deng bi hev re dibin sedem bo ciwantirkirina awaza muzîkahelbestê, ew diyardeya serdemekê pêk dihat ji dubarekirina heman dengî di destpêka peyvê de, lewra wekî serwaya destpêkê dihate binavkirin, piştî guhertin di ser de hat, û heman hisaba dubarekirina bêdengên jê re hate kirin, mînakek ji helbesta Kanî em werdigrin, û ji me re eşkere dibe ku çawa jîrane peyrewî ji diyardeya dubarebûna tîpa bêdeng di helbestên xwe de kiriye bo mînak:

*Min ke razî bûm bekem nabim le şahenşahî kem  
Ger nekem şekwayî halim kê dezanê zilletim  
Sîm û zer ger çim nebê emma dilm mustexniye  
şahîde asarekem me'ilûm eka mahîyetim* (kanî: 27)

Kan, di vê kopleya helbestê de (19) tîpên bêdeng ên (m) dubare kirine, (8) çaran tîpa bêdeng a (k) dubare kiriye, (7) çaran dengê (n) dubare kiriye, ew yek jî nîşaneyê

lêhatîbûna helbestvan e ku çawa bi dubarekirina tîpa bêdeng ew muzîkaciwan afirandiye.

Derheq bi dubarekirina dengê xeynî vê, dubarekirina serê çendîn şeweyên din jî hene, ew jî wekî qasa dubarekirina dengan di destpêka peyvê, deng di destpêka hevokê, dubarekirina heman dengî di dawiya “misre`i”ê, dubarekirina heman dengî di destpêka “misre`i”ê, dubarekirina çend dengan di kopleyekê, ew deng yan ew çend deng li çav dengên din bi awayekî gellek zêdetir tê dubarekirin, bi awayekî giştî dubarekirina hemû ew dengên dengdar û bêdeng bi awayên curbicur bona bihêzkirina muzîkanavxwe ya helbestê, kêrî û zorî ya bikaranîna dengan jî ji helbestvanekî ve bo yekî din cudahî heye, Kanî ê helbestvan di vê derheqê de çendîn carî li cihên cuda cuda ên helbestên xwe de dengê dubarekirinê bi kar aniye, ya jêr jî çend mînakek diyar in ji dubarekirina dengan:

*Dil bê sebr û xom bîmarim*  
*Xudaye xot bikey çarim* (kanî: 47)

Nimuneyeke din:

*le e'za dû hirûf kurdî hemane*  
*le turkî sê hirûf me'na bizane* (kanî: 55)

Nimuneyeke din:

*Eybî nî ye şî'irm welê bo ew kese eybe*  
*Nazanê le şî'ir û delê em şî'ire be eybe* (kanî: 60)

Mînakek din derheq lihevketina dengan bi vî awayî ye:

*Bem cilweyî celladî weku hatiye xeraman*  
*Zanîm ke lebo qetlime wextê nezerit kird* (kanî:45)



Mînakek din derheq dubarebûna du tîpên dengdêr û bêdeng digel hev:

*Ebê rostem sîfet lawanî min gurc û be xîret bin*  
*Hetakey çawekem her laye laye û bawêşî daye? (kanî:29)*

### 2. 2. 1. 2. Dubarekirina Peyvê

Pêk tê ji vê ku peyvek çend caran di nav deqeke helbestê de, di nava “bêyt” yan “misre`i”ekê de xwe dubare bike, merema dubarekirinê jî ciwantirkirina helbestê ye, dubarebûn di peyvê de buhayeke zêdetir bo helbestê peyda dike, jiber ku her hindêk caran peyvek ji çend peyvan pêk hatiye, wate digel dubarebûna peyvê de, deng jî di nava peyvê de dubare dibe, bi awayekî giştî dubarebûna peyvê li du astên cuda de xwe nîşan dide, ew jî pêk tî ji dubarekirina peyvê di asta asoyî û dubarekirina peyvê di asta stûnî de. Kanî ê helbestvan di her du astan de mînaka hebestê pêşkêş kiriye, bi vî awayî:

Yekem, Dubarekirina Peyvê Di Asta Asoyî Da

Di vê astê de peyv bi heman wateya xwe dubare dibe, û ji sînore “bêyt”ekê de, dubarekirin li pey hev e, ew yek jî xeynî vê ku muzîkaû ciwanî bo “bêyt”eke helbestê bihêz dike, dîsan wekî dubarekirin be jî, rola xwe pêşkêş dike, eva jêr mînaekeke helbesta helbestvan e ku dibêje:

*Helênî kanî kes bêtu helênî*  
*Le dinya derd û mîhnet qet nebênî(kanî:55)*

Di vê beyta helbestê de bi awayê asoyî du caran peyva (helênî) di pişka yekem de dubare bûye.

*Nabme saîl le alem saîle alem bexwa*  
*Izetî nefsim heye nalême hatem qîbilletim (kanî: 27)*

Di vê (misre`i, xişte) a helbestê de peyva (Saîl) û peyva (alem) her yek ji wan du caran bi awayê asoyî dubare bûne, ew yek jî serbarê mebesta helbestvan, dubarebûnê awazeke xweş bexşiye helbestê.

Duyem: Dubarekirina Peyvê Di Asta Stunî Da

Di vê astê de dubarekirina peyvê di asteke stûnî de ye, wate ji (misre`i, xişte)yekê derbaz dibe, û diçe nava koma helbestê de, merc nine ku bi awayekî wek hevbe, girîng ew e ku evy heman wateya wan hebe, helbestvan azad e ku çi peyvekê yan çend peyvan di cihekî de dubare bike, girîng ewe ku dubarekirin bo ciwankirina helbestê be, Kanî di vî warî de ast û şiyana xwe pêşkêş kiriye, ya jêr mînaka wê ye.

*Temennam dekird le bo axekî*

*Lem fikre dabûm kewtme baxekî*

*Baxekî dilgîr baxî bexda bû*

*Lenaw ew baxe gulek peydabû (Kanî:32)*

Di van du “bêyt”ên helbestê de, helbestvan hunera dubarekirina peyvê bi awayê stûnî bi kar aniyê, peyva (bax) çar caran dubare bûye, sê caran bi awayê stûnî li her sêk (misre`i, xişte)ên duyem, sêyem û çarem dubare bûye, herweha bi awayê asoyî li (misre`i, xişte) a sêyem de du caran dubare bûye.

Sêyem: Dubarekirina girê (firêz)

Girê ji peyvekê zêdetir e, û wekî hevokê ye, lê wekî hevokê hemû taybetmendiyên hevokê tune, ji peyvekê jî zêdetir e, helbestvan di helbestên xwe de gellek caran, girê bi awayê dubarekirin di helbestên xwe de bi kar tînin, Mebest ji dubarekirinê jî bo ciwanî û asta hêza helbestê ye, ku Kanî ê helbestvan di vê qadê de dîsan rola xwe nîşan daye, û di helbestên xwe de çendîn carî destewajeya dubarekirinê aniyê, bo mînak di helbesta (Perîşane henawim) de dibêje:

*Daym be xem û derd û perêşane henawim*

*Şew ta beseher maylî le giriyane henawim*

*Wek bulbulî şeyda le çi efxane henawim*

*Perwanesîfet şewqî le sûtane henawim*

Helbestvan di dawiya vê (misre`i, xişte)ê de peyva (henawim) çar caran dubare kiriye, herweha di hemû helbestê de di dawiya her kopleyêke çarîne de ew destewajeya dubare kiriye.

Mînamek din ji helbesta (kere dêze):

*Heytm kerekî dêze çî `îfrît û behêze*  
*Wek cûtî deka raste xetî rêzî le rêze*  
*Coy nawê berellay ke lenaw pûş û perêze*  
*Qurbanî gunit bê denî meşreb kere dêze...*

(kanî: 34)

### 2. 2. 1. 3. Dubarekirina Hevokê

Pêk tê ji dubarekirina “misre`i”ekê di nava helbestê bixwe de, hindek caran “bêyt”ek wekî xwe dubare dibe, û hindek caran jî bi destkarî ve dubare dibe, bi her du şeweyan di dubarekirinê de rîtma helbestê dubare dibe, bi vî rengî muzîka helbestê dibe cihê girîngîpêdana zêdetir di helbestê de. Helbest dibe cihê girîngîpêdana zêdetir di helbestê de, Kanî ê helbestvan dubarekirina ji nişkêve a “bêyt”eke helbestê di helbestên xwe de bi kar neaniye, lê bi hindek destkarî di çendîn cihan dubarekirina hevokê bi kar aniye, bo mînak:

*Xizmîne wern taku be qurbanî weten bîn*  
*Qurbanî çiyau deşt û biyabanî weten bîn*

(kanî: 28)

Helbestvan di vê beyeta helbestê de risteya (qurban, weten bîn) dubare kiriye, wateya tewaw ya hevokê ew e (Ême qurbanî weten bîn), herweha di dubarekirina pişka duyem de navbend xistiye navbera hevokê de. (qurbanî..weten bîn).

### 2. 2. 2. Muzîka “Bêyt”Ên Helbestê

Pêk tê ji bikaranîna peyvekê li cihê helbestê û anîna heman peyvî ji cihêkî din, merc nine ku peyv bi heman wateya yektir bin, û asayî ye ku hekî heman watayî jî bidin, girîng ew e ku bikaranîna peyvê pêdagirtin e li ser mijarê bixwe, û di nava kopleyê de jî ew peyv yarîkereke bihêz e bo zeliqandina peyvan pêkve, Bi vê sedemê helbest balkêş û hem muzîkawê jî ciwantir dibe. Bo mînak helbestvan dibêje:

*Sed esmerî şîrin suxen û aqil û xoş xû*  
*Sed suhbetî xoş cilwe numa enberî gêsû*  
*Sed açî gul ehli sefa şahîd û meh rû*  
*Her yekê besd lehce bilê (kanî) biferimû...(Kanî:50)*

Di vê kopleyê de peyva (sed) çar caran dubare bûye, hemû pişkên dêrên helbestê pêkve girê dane, û bûye sedema avakirina muzîkek a gellek ciwan bo tewahiya helbestê.

### **2. 2. 3. Mûzîka Regezdozî**

Pêk tê ji vê ku du peyv yan zêdetir ji du peyvyan wek yek bin, yan rengê hev bidin, û di watayê de cuda bin, wate ew peyv her yek ji wan wataya taybet bi xwe hebe, ew yek jî wekî hunereke ciwankariyê ya helbestvanan bi awayekî giştî di nava helbestên xwe de bi kar tînin, jiber ku bikaranîna regezdoziyê çend peyvên hemşêwe ji yektir bi komek deng ve dibin sedema ciwankariyê bo helbestê. Digel vê ciwankariyê de jî, rîtma helbestê bihêz dibe û muzîkekciwan berhem tê, regezdozî du cureyên wê hene, em jî dixwazin ku her du cureyên wê bînin ber bas, û digel de jî qazancê bibînin ji mînaka helbestên Kanî.

#### **2. 2. 3. 1. Regezdoziya Tewaw**

Pêk tê ji anîna du peyvyan yan zêdetir ku bi berçav yek bin, û di watayê de cuda bin, bona vê ku regezdozî a tewaw ava bibe, hewce ye ku peyvên regezdozî di van çar xalên jêr de rêk bikevin:

- 1- Li hejmara pîtan de yeksan bin.
- 2- Cureya pîtan wek yek be.
- 3- Rîzbûna pîtan wek yek be.
- 4- Şêweya pîtan wek yek be) (Seid Şêx Biznî, 2011: 137).

*Namerdim eger mînnetî namerdî bikêşim*

*Pêm xoştire eyî (kanî) bepişt berdî bikêşim* (Kanî:59)

Di vê “bêyt”ê de peyva (Bikêşim) ji her du (misre`i, xişte)an de, di biyavê rengûrû (riwalet) de wekî xwe ye, lê di warê wate de cuda ye, li pişka yekem de (bikêşim) wateya hest û soz û bêminetiyê dide, di pişka duyem de peyva (bikêşim) wek kar hatiye bikaranîn.

### 2. 2. 3. 2 Regezdoziya Netewaw

Nebna yek ji van çar regezên ku ji regezdoziya tewaw de me bas kir dibe sedema avabnûna regezdoziya netewaw, wate yek ji mercan cuda bin yan zêdetir ji mercekê cuda bin, û ewên din wek yek bin, herweha dibe ku peyv di warê watayê de jî cuda bin û helbestvan dibêje:

*Sahêbî sê şit qet nadîm nabê*

*Fikr û emel û qiseşî çabê*

(Kanî:59)

Di vê “bêyt”ê de peyva (Nabê, çabê) di watayê de cuda ne, lê di şêweya parvebûna pîtan de ji pita yekemya peyva (n,ç) cuda ne, bi sedema vê cudahiyê jî regezdoziya netewaw pêk hatiye.

### 2. 2. 4. Dijhevî

Pêk tê ji bikaranîna du peyvên di nava pişkek yan “bêyt”ekê de ku ew du peyv di biyavê watayê de berevajiyê hev in, wata li dijî hev in, bo mînak: Wekî bilind û nizm, sar û germ, reş û spî, baş û xirab û hwd, Ew huner ji aliyê piraniya helbestvana ve hatiye bikaranîn. Kanî ê helbestvan bi sedema şiyânên xwe ên şê`irî di vê derheqê de hewl daye bi bikaranîna vê hunera şê`irî di navxwe a helbestê de rûçik ê helbesta xwe û muzîkaxwe ciwantir bike, bi wayekî giştî dijhevî du cur in:

#### 2. 2. 4. 1. Dijheviya Ferhengî

Pêk tê ji bikaranîna du peyvên ku di bingeh de tewaw li dijî hev in wekî berz û nizm, baş û xirab, sar û germ...hwd. Bo mînak:

*Heyatî çon bû mematîşî wa*

*Le bo nexoşan debexşî dewa*

(Kanî: 33)

Di vê beytê de helbestvan du peyvên dijhev bi kar anîne, ew jî wekî (Heyat, Memat) her du peyv Erebi ne, wate (jiyan û mirdin), helbestvan di cihekî din de dibêje:

*Beharim be xar royî*

*Zû hat wextî xezanim*

(Kanî:51)

Helbestvan di vê beytê de du peyvên tewaw dij bi hev bi kar anîne, ew jî wekî (Royî, Hat), ew yek jî bûye sedema dijheviyeke ferhengî.

#### 2. 2. 4. 2. Dijheviyeke Naferhengî

Pêk tê ji vê ku peyv di bingeha xwe de dijber nînin, belku bi sedema zêdekirina emraza (nerê) dibin dij hev, hat û nehat, saz û nesaz, Bo mînak helbestvan dibêje:

*Hunermendanî zorman mird belam namirê qisew nawyan*

*Qisey (nalî) qisey (salim) heta dinyaye her maye* (Kanî:29)

Helbestvan di vê beytê de (mird, namirê) ku her du jî ji rader (mesder, çawg) a mirdin ve hatine wergirtin, merem di vir de (mird û nemir) e. Ew yek jî li ber vê ku dijberiya peyvan nivîşkanî tê de ye, em dikarin bêjin ku ew yek dijheviyeke naferhengî ye, jiber ku bi sedema emraza (na) a neyînî bûye dij. Helbestvan di mînakek din de dibêje:

*Dexîlek şahim qebûlim bikey*

*Le dergahî xot qet derim nekey*(kanî:33)

Di vê beytê de peyva dijhev ya naferhengî pêk tê ji peyvên (bikey, nekey) ku ketiye dawiya (misre`i, xişte)an.

#### 2. 2. 5. Mûzîka Beramberî

Beramberî ew hunera ciwankariyê ye ku helbestvan bo helbesta xwe bi kar tîne, di beramber de du peyv yan çend peyv bi kar tên, û piştê li beramberî van du peyvan de du peyvên din tên, ew yek jî heya radeyekê wek dijhev e, yan em dikarin bêjin ku cureyek dij hev e, lê bi awayekî taybet.

Bi awayekî giştî hunera beramberî pêk tê ji (hebûna çar peyv yan du peyv di beşa herî pêşê ya axavtinê û duyên din jî di beşa piştê tên, bi vê mercê ku pêwendiya di navbera her peyveke beşa yekem û peyva beramberî wê, di beşa duyem de pêwendiyêke dijber be) (îdrîs ebdulla, 2011, 301). Kanî bi destrengîni a xwe ew hunera gellek ciwan di helbestên xwe de bi kar aniye, eva jêr yek ji mînakên wê ye:

*Nakes û naehl û naqîs hernezanin çatire*

*Kamil û dana û le guftarim dezanin qîmetim* (Kanî:27)

Helbestvan di vê “bêyt”ê de hunera hember (beramber) destpêkê, bi peyvên (naehl û naqis) dest pê kiriye, piştire dij bi kar aniye, ew jî wekî (kamil û dana), bi vî rengî jî muzîkek a ciwan bexşiye helbestê.

### 2. 2. 6. Dupatkirin

Pêk tê ji anîna peyvekê yan destewajeyekê yan risteyekê di “bêyt”ekê de, û piştire dîsan bi heman şêweyî wan dubare bike bi armanca dubarekirinê, bi vê merca ku manaya hemû peyvên wek hev be, wate di vir de mebest tenê dubarekirin e. Ew cureya hunerê nîşana jêhatîbûna helbestvan e, bo mînak helbestvan dibêje:

*Le ahme le ahme*

*Sotinit le ahme!*

*Xalit hecerileswed*

*Biroto qible gahme*

(Kani: 51)

### 2. 2. 7. Tîlnîşan

Ew huner pêk tê ji vê ku helbestvan di nava helbesta xwe de îşareyê bi ayeta quranê yan fermûdeyeye pêxember yan destan û pendên pêşiyên bike, di vê derheqê de Kanî ê helbestvan di çend ciyan de ew huner bi kar aniye bo mînak:

*Ger aşiq û şeydayî heqîqî be sehîhî*

*Wek (kanî) serit danê le bo `îdî zebîhî*

(Kanî:64)

Di vê “bêyt”ê de helbestvan îşareyê dîke bi serbirîna (Eydî Zebîhî) ku mebesta wî cejna qurbanê ye, ew yek jî vedigere ser vê çîroka ku di Qurana pîroz de hatiye baskirin, ku hezretê Îbrahîm dema ku xwest serê kurê xwe Îsmâîl bibire, û bike qurbanî di pêxema xwedayê mezin de..

Mînakek din:

*Msalî mecnûn bê ser û saman*

*Degeram sersam le deşt û kêwan* (Kanî: 32)

Helbestvan xwe wekî Mecnûn dişîbhîne, ku çawa şêr û harê deşt û çiya bûye Serpêhatiya, Mecnûn jî îşare ye bodestana (Leyla û Mecnûn) a Fizulî.

### 2. 2. 8. Parkît (kertkirdin)

Pêk tê ji vê hunera ku helbestvan xeynî serwa ya giştî a “bêyt”ên şê`irî radibe bi danînerwa ya tefîle, û destewajeyên nav (misre`i, xişte)an, û bi vî rengî serwa ya helbestê zêde dibe û muzîka wê jî zêde ji xwe dibe cihê bala xwîner. Ew cureya hunerê di helbestên Kanî de xûya dike, bo mînak dibêje:

*Be turkî/ şarete/ dû herfî/ pêşî/*

*Be kurdî/ mêweke/ dû herfî/ dîşî/ (kanî:55)*

Helbestvan ji bo her yek ji van du pişkan hunera parkîtkirinê (kertkirdin)ê bi kar anîye. Her du pişkên yekem û duyem ên “bêyt”a şê`irê, bi ser çar destewajeyan de hatiye parvekirin, û her yek ji wan jî xwediyê serwaya xwe ye. Herweha helbestvan di mînakeke din de dibêje:

*Ew hemû eşare le dil dêteder*

*Zor bexemu/ pir kederu/ bê xeber*

(Kani: 54)

Serwaya sereke ya “bêyt”ê pêk tê ji (dête der, bê xeber), lê helbestvan bi sedema hunera parkîte (kertkirdin), ji pişka duyem bi dengê (u) serweke din jê re zêde kiriye.



## ENCAM

Kanî Doxremeçî di warê fêrbûn û zimanzanîyê de bixwe ew şiyana xwe ya fêrbûnê vegeşandiye, jiber ku tenê heyameke kêma wê di mizgevtêke Hewlêrê de xwendîye, û xwendîna xwe jî bi dawî neaniye. Herweha di tu medreseyeke mîr de jî ders nexwendîye, lê bi sedema girîngîdana xwe bi xwe, kariye ku xwe pê bigehîne. Kanî her di demên herzekariyê de evîndara helbestê bûye û helbestên piraniya helbestên berî xwe jî xwendîne. Kanî bi sedema hebûna heza helbestê û herweha hebûna vê behreyê ya helbestvanîyê ku di derûna wê de hebû, bû helbestvaneke baş ya serdema xwe.

Kanî hewl daye ku bi riya zimanzanî û zimandostiyê ve xwe fêrî zimanên cuda cuda bike, destpêka hatina malbata kanî ji Kerkûkê ve dest pê dike, ku hatine bo Hewlêrê. Esla vê malbatê Turkemen in, lê bi sedema vê ku bajarê Hewlêrê her ji demên kevn ve cihê jiyana hemû ayîn û ayînzayan û netewe û zimanên cuda bûye, her yek ji Misilman, Mesîhî, Kildan û Aşûr, Kurd, Turkemen û Ereb, her hemû jî li Hewlêrê pêkve dijîn, û her hemû jî bajarê Hewlêrê wekî bajarê xwe dizanin. Her ew yek jî bûye sedem ku Kanî gellek bi hêsanî xeynî zimanê Kurdî, zimanên Turkî, Erebî û Farsî jî fêr bibe.

Derheq bi dîroka muzîkahelbestê em dikarin bêjin ku muzîkû helbest du tişt in ku ji hev nahên veqetandin, her ji demên kevn ve heya îro wekî janreke edebî bûye cihê girîngiya edebdostan, ew du janr di nava netewe û welatên cîhanê de gellek girîngî pê hatiye dayîn, bi dehan tevger û komeleyên edebî bi sedema girîngîdana bi helbest û muzîkê bûne cihê girîngîpêdana civakê, gellek caran ji riya helbestvanan ve civak hatiye paldan bo şoreş û guherînkari li dijî zulm û stema dewletê.

Di dîroka edebiyata Kurdî de jî muzîka helbestê her ji serdemên kevn ve cihê girîngîpêdanê bûye, di nava fulklura Kuredî de dîrokeke gellek kevn heye, û piştê jî hemû ew nivîsên edebî ên kevn ku mane, belgeya vê rastiyê ne, ku Kurd jî her di demên kevn de girîngiyeke zêde dane muzîka helbestê. Di biyavê dîrokî de li ser asta cîhanê kevntirîn vehûnandin ku awazeke muzîkê tê de be, vehûnandîna “Rîk Vêda” ye, ku dîroka wê vedigere bo hezar heya pênc hezar salî berî Zayînê. Piştê jî “Gata”ya Zerdeşt e ku ew jî di biyavê dîrokî de derbazbûyîyeke gellek kevn heye. Di serdema ayînên yek li pey yekê, û mîrnişînan û civakan bi awayekî giştî, muzîka

helbestê cihê baldanê bûye. Lewra em dikarin bêjin ku helbest û muzîktişteke neveqetiyayî a civakê ne, û di hemû guhertinên civakê de jî girîngiya xwe hene. Lewra jî helbest û muzîkher bi awayê zindî dimînin.

Pêwendiya derûnî heye di navbera helbest û helbestvan, helbest hilkeliyê nav derûna helbestvan e, wateya peyvên helbestvan, pêk tên ji wateya alavên teibîrkirî ên derûna helbestvan, helbestvan ji riya bikaranîna peyvên ciwan ve, ya di derûna xwe de bo xwîner zelal û eşkere dike, helbesta helbestvanên xwedîşiyar wekî hêzeke bibandor ya sêhrî ye ku ew jî bi sedema muzîkê ye, ku di şêwe û naweroka helbestê de hebûna wê heye. Ku wisa bû gihîştine wê armancê ku hebûna muzîkek a ciwan di helbestê de sedem e bo vê ku helbest bibuhadartir be, ew yek jî vedigere ser asta şiyar û zîrekiya helbestvan di helbestnivîsînê de.

Muzîka derve beşeke girîng ya pêkhateya helbestê ye, û parve dibe bi ser kêş û serwa de, û Kaniyê helbestvan jî di bikaranîna van du huneran di helbestên xwe de, şiyaneke baş ji xwe nîşan daye. Derheq bi “kêş”ê jî, Kanî her du cureyên kêşa xomalî û kêşa erûz bi kar anîne. Helbestên wî bi kêşa erûz in û di kêşa erûzî de ew kêş bi kar anîne: Hezec, Remel, Serîh. Herweha derheq bi serwa jî yê helbestvan hunereke bihêz di helbestên xwe de bi kar aniye. Ew cure serwa di helbestên helbestvan de têne dîtin ku pêk tên ji: Yekîtiya serwa, Serwaya hemûreng. Di yekîtiya serwa de hunereke ciwan pêşkêş kiriye. Herweha derheq serwaya hemûreng helbestvan şiyarên xwe li şêweya serwaya tak, cotserwa, çar xişteki, pênc xişteki û şeşîne de eşkere û bilêv kirine.

Muzîka navxwe bi hevparî digel muzîka derve sedemên sereke ne ji bo derxistina wê tama ku di helbestê de heye, şiyana zanistiyane ya Kaniyê helbestvan di muzîka navxwe de bûye sedemek bo ciwantirkirina naweroka helbestê. Kanî derûna xwe û civaka xwe di derbirîn û eyankirineke ciwan ya muzîkê di helbestên xwe de pêşkêş kirine. Bi vê sedemê ve, di encam de şêwe muzîkek a ciwan di helbestên xwe de ava kirine. Kanî di muzîka navxwe de ew huner bi kar anîne, hunera dubarekirin di asta (deng, peyv, riste), hunera muzîka kopleyê, hunera regezdozî, dijhevî, beramberî, dupatkirin û kîtekirin (kertkirin).

## ÇAVKANÎ

Azad Ehmed Mehmud (2012) *Bunyatî Zman Le Şî'rî Hawçerxî Kurdîda*, Ç. 2, Hewlêr.

Bakurî (1997), (*G. Raman*), Hewlîr.

Beşîr Husên Se'dî, (1984), *Dîwanî Fanî*, Çapxaney Roşnibîrî, Ç. 1, Hewlêr.

B-Kawe, *Rojnameya El-Te`îxî*, (Rêkevt :12.05.1957), jmara 1907.

Dilşad 'Elî, (1998) *Binyatî Hellbest Le Honrawey Kurdîda*, Ç. 1, Slêmanî.

Dilşad 'Elî, (2007), *Dîlan û Taqîkirdnewey Şî'rî*, Dezgay Serdem, Ç. 1, Slêmanî.

*Dîwanî Burhan Axay Hewlêrî*, (1957), Çapxaney Tereqî, Ç.1, Kerkuk.

'Ebdulrezaq Bîmar (1992), *Kêş û Musîqay Helbestî Kurdî*, Çapxaney Dar Elhuriye, Teb'.1, Bexdad.

Ehmed Reçaî (1999), *Ewzan El Elhan Billuxe El'ruz Wetewam Min Elqirîz*, Neşril Ewel, Dîmeşq.

'Elaedîn Seccadî (1395), *Mêjûy Edebî Kurdî*, Ç. 2. Sne, Îran.

Selah Reuf (1989), *Tyorekanî Mosîqa*, Ç. 1, Çapxaney Somer.

Elxetîb Eltebrêzî (1994), *Ktab Elkaîfî Fî El'uz Welqewafî*, Ç. 3, Qahre,

Enwer Qeredaxî, (1984), *Govarî Karwan*, Kêşî Şî'rî, Hewlîr.

'Ezîz Gerdî, (1999), *Kêşî Şî'rî Klasîkî Kurdî*, Çapxaney Wezaretî Roşnibîrî, Ç.1, Hewlîr.

'Ezîz Gerdî, (1999), *Serwa Lêkolîneweyekî Şîkarî Berawirde Le Şî'rî Kurdîda*, Dezgay Aras, Ç. 1. Hewlêr.

'Ezîz Gerdî, (2014), *Kêşnasî Kurdî*, Ç. 1, Narîn, Hewlêr.

'Ezîz Gerdî, (2011), *Hunerî Şî'rî Eristu*, Çapxaney Genc, Ç. 2, Silîmanî.

- Ferhad Pîrbal, (2010), *Mêjûy Goranî Û Mosîqay Kurdî*, Ç. 1, Hewlêr,
- Ferhad Şakelî, (2011), *Zmanî Gerdelul Xewnî Şneba*, Ç. 2, Çapxaney Aras, Hewlêr.
- (Fuad Zekerya û Heme Kerîm 'Arf), (2006), *Guzarşiti Mosîqa*, Ç.1, Çapxaney Yad, Slêmanî.
- Gîwî Mukiryani (1969), *Pêşekî Dastane Şîryekey (Leyla û Mecnun) Wergêranî: Kanî*, Ç. 3, Hewlêr.
- Goran 'Ebdulla (1384), *Dîwanî Goran*, Ç.1, Tihiran.
- Goran Soran Feyzî (2006), *Barî Edebî Kurdî Le Şarî Hewlêr Le Nêwan Salanî 1935-1958*, Ç. 1, Hewlêr.
- Hejar Mukiryani, (1391), *Henbane Borîne*, Ç. 8, Çapxaney Sruş, Tehran.
- Heval Ebubekir,(2010), *PêgeyRêbaziRomantikî Le Şî'ri Kurdîda*,Ç.1, Slêmanî.
- Hîmdad Husên (2007), *Derwazeyek Bo Rexney Edebî Kurdî*, Ç. 1, Çapxaney Xanî, Dhok.
- Hîmin 'Umer Ehmed (2008), *Çend Layenêkî Şî'rîyet Le Ko Çîrokî (Namekanî Jakon)Î Cebare Cemal Xerîb*, (Namey Master), Kolijî Zman, Zankoy Selahedîn, Hewlêr.
- Hîwa Nuredîn 'Ezîz, (2016), *'Erûznasî Şî'ri Klasikî Kurdî*, Ç. 1, Hewlêr.
- Hîwa Nuredîn 'Ezîz (2009), *Binyatî Rîtim Le Şî're Kurdyekanî 'Ebdulla Beg, Namey Master*, Kolêjî Zman, Zankoy Selahedîn, Hewlêr.
- Hoşeng Şêx Mhemed,(2002), *Şî'r Di Navbera Guman Û Yeqînêde*, Kolîja Şerî'ê, Dhok.
- Îbrahîm Ehmed Şwanî (2001), *Sofîgerî- Şî'ri Aynî Û Sofîgerî Le Şî'rekanî Mehwi De*, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Dezgay Çap Û Bllaw Kirdnewey Mukiryani, Hewlêr.
- Îbrahîm Enîs,(1952), *Musîqa Elş'r Elteb'î Elisanye*, Mektebetil Enclu Lîlteb' Welneşr, Elqahre.

Îdrîs 'Ebdulla Mistefa, (2006), *Qonaxî Pêş Romansîzmî Şî'rî Kurdî (1851-1921)*, Ç. 1, Hewlêr.

Îdrîs 'Ebdulla Mistefa,(2011), *Layene Rewanêjyekan Le Şî'rî Klasîkî Kurdîda Be Nmune: (Hemdî Ê Hacî Qadrî Koyî)*, Çapxaney Hacî Haşm,Ç.1, Hewlêr.

Îsma'îl Îbrahîm Se'îd,(2010), *Rudawekanî Kurdistan Le Awêney Edebda*, Çapxaney Xanî, Ç.1, Dehok.

Jones, Amiy, (2013), *The Translation Of Musicality In The Lyric Poetry Of Helmina Von Chezy And Marceline Desbordes-Valmore*. USA. The Ohio State University.

Jwan 'Ebduliselam Gerdî (20018), *Şêwaz Le Şî'rekanî Kameran Mukrî Lejêr Roşnayî Qutabxaney,(Fîlolocî Lêw Şpîtzer)*, Da, Çapxaney Roşnibirî,Ç. 1, Hewlêr.

Kamran Mukrî (1984), *Edebî Folklorî Kurî*, Beşî Yekem, Çapxaney Zankoy Selahedîn,Ç. 1, Hewlêr.

Kerîm Muhsîn Xeyat (2013),*Musîqa Elsakin*, Mîzubutamyalîl Tîba'e Welneşr,Teb'.1, Bexdad.

Kerîm Şareza, (1980), *Dîwanî Kanî*, Çapxaney Alhewadîs, Ç. 1, Bexda.

Komellê Nuser, 2000, *Zman Ê Edebî Kurdî Bo Polî Pêncemî Amadeyî*, Ç. 8, Hewlêr.

Marf Xeznedar, (1958), *Pîşekî Dîwanî Selam*, Bexda.

Marf Xeznedar, (2001),*Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Yekem, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Ç. 1, Hewlêr.

Me'ruf Xeznedar, (1962), *Kêş Ê Qafye Le Şî'rî Kurdî*, Çapxaney Elwefa, Bexda.

Mexdîd Soran, (2000), *Dîwanî Homa*, Hewlêr.

Mihemed Emîn Doskî, (2007), *Şrovekirna Dîwana Melayê Czîrî*, Bergê Êkê, Hewlêr .

Mihemed Hadî Elterablisî, (1981), *Xesaîs EluShub Fî El Şewqyat*, Menşurat El Cam'e El Tunisîye,Teb'. 1, Eltunis.

Mihemed Heme Baqî, (2002), *Mêjûy Mosîqay Kurdî*, Ç. 2, Hewlêr.

Mihemed Husên Mhemedî, (1394), *Edebyat Xnaîy Îranî*, Asman, Teb' 1, Qum, Îran.

Mihemed Reza Mubarek, (1983), *el Luxe El Ş'riye Fî Xîtab El Neqd El'erebî*, Metbe'e Dar El Şiun ElSeqafe el 'Amme, Teb' 1, Bexdad.

Mihemed Reza Şefî'î Kdkenî, (1392), *Musîqî Şi'r*, Teb'.14, Ktab Dustan, Îran.

Mihemed Xnîmî Hilal, (1973), *El Niqd Eledebil Hedîs*, Teb' 1, Beyrut.

Mistefa Seyd Mîne, (2008), *Payey Wefayî Lenêw Şa'îranî Sedey Nozdehemî Kirmancî Xwarûda*, Ç.1, Hewlêr.

Newzad 'Ebdulla Bamernî (2007), *Îdolojîya Di Hozanên Cegerxwînda*, Çapxana Xanî, Ç.1, Duhok.

Necat 'Ebdulla, (2004), *Pêşekî Mem Ê Zîn Ê Ehmedî Xanî*, ya Cemîl Sayb, Ç. 1, Hewlêr.

Reşad Mhemed Muftî (1998), *Mewludnamey Kurdî*, Ç.1, Hewlêr.

Şaho Se'îd (2000), Rîtim Le Nêwan Şi'ri Ê Muzîkde, *Govarî Ayinde*, J: 51, r: 59.

Samh Elrewaşde (2006), *MexanîElness*, Teb' elewel, 'Uman.

Şe'ban Silah (2005), *Musîqa Elş'rye Beyne el tba'wel Îbtîda'*, Darl Xerîb Lîl'teb', Teb' elewel, Elqahre.

Se'îd Faruq Usif Şêx Bizênî, 2011, *Binyatî Hunerî Le Şi'ri Ehmed Muxtar Begî Caf*, Çapxaney Roşnibîrî, Ç.1, Hewlêr.

ŞewqîZeyf, 1987, *Fî Elturas Wel Ş'ri welluxe*, Dar Elme'arîflîlTîba'e, Qahîre.

Sîros Şmîsa, (1391), *NeqdEdebî*, Ç. 1, Tehran.

Sîrus Şemisya, (2018), (Wer: Hîmdad Husên û Senger Nazm), *Rêbaze Edebyekan*, Ç. 1, Hewlêr.

Şwan Mhemedemîn Teha Xoşnaw, (2016), *Hewlêr Le Nêwan Salanî (1963-1970)*, Çapxaney Zankoy Selahedîn, Ç. 1, Hewlêr.

Twana Heme, (2014), *Çemkî Ewanî Dî Le Muzîkî Kurdîda*, Qan'i, Ç. 1, Silêmanî.

'Usman Deştî (2009), *Şî'ri Nawçey Mukiryay Nîwey Yekemî Sedey Bîstem*, Qan'i, Ç. 1, Slêmanî.

'Usman Deştî (2012), *Lebarey Binyatî Zman Ê Şêwazî Şî'ri*, Çapxaney Hacî Haşim, Ç. 1, Hewlêr.

Umêd Mihyedîn Mhemed (2010), *Çerx Ê Mêjûy Hunerî Mosêka Le Ewropa*, Çapxaney Roşnibîrî, Ç. 1, Hewlêr.

'Usman 'Ebdulla, (2011), *Namey Master, Rehendî Mosîqî Le Şî're Kurdîyekanî (Wefay) Da*, yaÇapnekirî, Kolijî Perwerde Zankoy Selahedîn, Hewlêr.

'Usman Şarbajêrî, (1985), *Gencîney Goranî Kurdî*, Wezaretî Roşnibîrî 'Îraq Dezgay Roşnibîrî Ê Blawkirdnewey Kurdî, Elzeman, Ç. 1, Bexda.

Wirya Mhemed, (2016), *Amêrekanî Muzîkî Kurdî*, Çapxaney Zankoy Selahedîn, Ç. 1, Hewlêr.

Xurxî Luys Burxîs, (2007), *Sin'etil Ş'r*, T: Sal' 'Elmanî, Teb'li Ewel, Elmeda, Ç. 1, Bexdad.

'Zedîn Mistefa Resul, (1987), *Ryalîzmî Soşyalîstî Ê Edebyatî Kurdî*, *Govarî Roşnibîrî Nwê*, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, J: 113.

Zerqani, S. M. (1345), *Musîqay Klasîk*, Antişrat Suxin, Tihran.



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU  
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Yaşayan Diller Enstitüsü



03/09/2019

Tez Başlığı / Konusu

### DI HELBESTÊN KANÎ DE MUZÎK

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 115 sayfalık kısmına ilişkin, 03/09/2019 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından % 2 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezin benzerlik oranı % 2 (Yüzde Yedi) dir.

#### Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

  
03/09/2019

BARZAN TAHER AHMED  
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı : BARZAN TAHER AHMED  
Öğrenci No :17950001004  
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı  
Programı : Örgün Eğitim  
Statüsü : Y. Lisans  Doktora

DANIŞMAN  
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

03/09/2019



ENSTİTÜ ONAYI  
UYGUNDUR

03/09/2019

  
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ  
Anabilim Dalı Başkanı